

K.T.

Zanîngeha Bingölê

Enstîtûya Zimanên Zindî

Şaxa Makezanista Ziman û Wêjeya Kurdî

Teza Lîsansa Bilind



XELÎFE YÛSIF Û TEQRÎZA WÎ

(Metn û Lêkolîn)

Hasan AKBOĞA

121302105

Şêwirmendê Tezê

Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN

Çewlîg 2017

T.C.

Bingöl Üniversitesi

Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi



XELÎFE YÛSIF VE TAKRİZİ

(Metin ve İnceleme)

Hasan AKBOĞA

121302105

Tez Danışmanı

Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN

Bingöl 2017

Ez vê xebatê
diyariyê herdu kalikê xwe
Hecî Evlayê Mihemed (Başimî)
û Hecî Îdrîsê Osê (Şemkî)
dikim ku,
ew du merivên zana û şareza bûn
û em ji wan bêpar neman...


BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Hasan AKBOĞA tarafından hazırlanan “*Xelîfe Yûsif û Teqrîza Wî (Metn û Lêkolîn)*” başlıklı bu çalışma, **23.06.2017** tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda [~~oybirliği/oy~~ ~~çokluğuyla~~] başarılı bulunarak jürimiz tarafından *Kürt Dili ve Edebiyatı* Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans tezi olarak kabul edilmiştir.

TEZ JÜRİSİ ÜYELERİ (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan : Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN

İmza: 

 : Yrd. Doç. Dr. Hemin Omer AHMED

İmza: 

Üye : Yrd. Doç. Dr. Ayhan TEK

İmza: 

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun/...../ 201.. tarih ve sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Unvanı Adı Soyadı

Prof. Dr. Orhan BAŞARAN

Enstitü Müdürü

NAVEROK

	Rûpel
NAVEROK.....	iii
KURTE.....	viii
ÖZET.....	ix
ABSTRACT.....	x
PÊŞGOTIN.....	i
LÎSTEYA WÊNE Û PÊVEKAN.....	xiv
KURTEBÊJE	xvi
DESTPÊK.....	1

BEŞA YEKEM

TEQRÎZ DI WÊJEYA KURMANCÎ DE Û TEQRÎZA XELÎFE YÛSIF

1. PÊNASEYA TEQRÎZÊ.....	8
2. TRADÎSYONA TEQRÎZNIVÎSÎNÊ DI WÊJEYA KURMANCÎ DE.....	9
2.1. Sê Teqrîzên Şêx Eskerî.....	10
2.1.1. Mem û Zîna Ehmedê Xanî.....	10
2.1.2. Leyl û Mecnûn.....	11
2.1.3. Rewd'un-Ne'îm.....	12
2.2. Teqrîza Ebdurehîm Rehmî Hekarî ya Li Ser Melayê Cizîrî.....	13
2.3. Teqrîza Hemzeyê Muksî ya Li Ser Mem û Zînê.....	13
2.4. Teqrîza Seyid Ebdurehman ya Li Ser Dîwana Îrfan.....	14
3. TEQRÎZA XELÎFE YÛSIF.....	14

3.1. Îrşad’ul Îbad a Kurmancî/Kitêba Kurmancî.....	14
3.2. Mecmeû’ul Mesailîş-Şer’îye Bi Lîsanê Kurdiye.....	17
3.3. Kîfayet’ul ‘Ewam.....	17
3.4. Tuhfet’ul Amilîn.....	17
3.5. Feraîz.....	18

BEŞA DUYEM

JIYANA XELÎFE YÛSIF Û BERHEMÊN WÎ

1. REWŞA POLÎTÎK YA SERDEMA XELÎFE YÛSIF.....	19
2. JIYANA XELÎFE YÛSIF.....	24
2.1. Nav û Mexlesa Wî.....	25
2.2. Serdema Bazîdê.....	26
2.2.1. Salbûn û Cihê Jidayîkbûna Wî.....	26
2.2.2. Malbata Wî.....	27
2.2.3. Eşîra Wî.....	27
2.2.4. Perwerdehî û Pişeya Wî.....	27
2.2.5. Îcaze û Destûrnameyên Wî.....	28
2.3. Serdema Sêrtê.....	28
2.4. Serdema Cizîrê.....	28
2.5. Xelîfe û Bedûzeman Sêidê Kurdî.....	29
2.6. Wefata Wî.....	31

3. BERHEMÊN XELÎFE YÛSIF	31
3.1. Teqrîz (Rexne/Pesinname/Medhiye)	32
3.2. Usûla Meratîba Hîsabê/Rîsalet'ul Hîsab/Matematîk	33
3.3. Îrşad'ul Îbad a Kurmancî/Kitêba Kurmancî	33
3.4. Mecmeû'ul Mesailîş-Şer'îye Bi Lîsanê Kurdiye	34
3.5. Tuhfet'us Sibyan	34
3.6. Tuhfet-uz Zakirîn	34
3.7. Feraîz	34
3.8. Tecwîd	35
3.9. Eqîdet'ul Îman	36
3.10. Xutbe	36
3.11. Tuhfet'ul Amilîn	37
3.12. Tuhfet'ul Îxwan	37

BEŞA SÊYEM

ZIMANÊ TEQRÎZÊ Û KESAYETIYA EDEBÎ YA XELÎFE YÛSIF

1. ZIMANÊ TEQRÎZÊ	39
1.1. Hin Peyvên Kurdî yên Resen Di Teqrîzê de	40
1.2. Taybetiyên Devoka Serhedê Di Teqrîzê de	41
1.3. Taybetiyên Devoka Botan û Behdînan Di Teqrîzê de	41
1.4. Biwêjên ku di Teqrîzê de Hatine Bikaranîn	42

1.5. Gotinên Pêşyan ên ku di Teqrîzê de Hatine Bikaranîn.....	43
1.6. Hêmanên Zimanên Din Di Teqrîzê de.....	43
2. DI TEQRÎZÊ DE GIRÎNGIYA ZIMAN Û ILMÊ.....	45
2.1. Girîngiya Zimanê Kurdî/Kurmançî.....	46
2.2. Girîngiya Zimanê Erebî di Xizmeta Dîn de.....	46
2.3. Girîngiya Zanistiyê û Xwendina 'Ilmê.....	47
3. JI ALIYÊ TEŞEYÎ VE TEQRÎZ (SERWA (QAFIYE) Û CÛREYÊN WÊ).	48
4. KESAYETIYA EDEBÎ YA XELÎFE YÛSIF.....	52
5. WÊJENAS Û KLASÎKÊN KU LI SER XELÎFE YÛSIF TESÎR KIRINE..	53
5.1. Ehmedê Xanî.....	54
5.2. Mela Xelîlê Sêrtî.....	55
5.3. Melayê Bateyî.....	55

BEŞA ÇAREM

NIRXANDINEK LI SER NAVEROKA TEQRÎZÊ

1. HÊMANÊN DÎNÎ	57
1.1. Xwedê	57
1.2. Pirtûkên Pîroz (Qur'an û Tewrat).....	57
1.4. Pêxember	58
1.4. Mezheb û Alimên Mezheban.....	60
1.5. Hin Alim û Kesayetên Navdar.....	61

1.6. Iblîs (Şeytan).....	63
2. DUA, ŞÎRET Û DIJÛN.....	64
2.1. Dua.....	64
2.2. Şîret.....	65
2.3. Nifir/Dijûn.....	67
3.2. ŞİBANDIN Û MÎNAKÊN AJALAN DI TEQRÎZÊ DE.....	68

BEŞA PÊNCEM

METNÊ TEQRÎZÊ

METNÊ TÎPVEGUHESTÎ YÊ TEQRÎZÊ.....	75
ENCAM.....	120
ÇAVKANÎ.....	124
PÊVEK.....	130
PÊVEK-I: Metnê Çapkirî yê Teqrîzê.....	130
PÊVEK-II: Wêne.....	147

KURTE

XELÎFE YÛSIF Û TEQRÎZA WÎ

(Metn û Lêkolîn)

Hasan Akboğa

Xelîfe Yûsif, nivîskar û alimê kurd ê berhemdar ku di navbera dawîya sedsala 20an heta nivê sedsala 21an de emir kiriye, bi berhemên xwe yên kurmancî ve mohra xwe li edebiyata kurdî xistiye. Xelîfe Yûsif, li navçeya Bazîdê, li gundê Zengezûrê ji dayîk bûye. Ehmedê Xanî di warê nivîsandina bi kurdî û helwesta ziman de wekî gelek helbestvanên klasîk karîgeriyeke berbiçav li ser Xelîfe jî kiriye. Bi taybetî di berhema Xelîfe ya bi navê Teqrîzê de ev karîgerî bi zelalî tê dîtin.

Xelîfe, di dewrekê de ku qedexa û polîtîkayên zimanî yên dewletê zexteke dijwar li ser nivîskarên kurdî nûs dikir, xwediyê helwesteke nivîsandina bi kurdî bûye û hemû berhemên xwe –danzdeh heb- bi kurdî li ser fiqih, hedîs û zanistên dînî nivîsandiye.

Ev xebat a li ser Xelîfe Yûsif û Teqrîza wî, dixwaze kesayeta edebî ya nivîskar derxe holê û cihê wî di edebiyata kurdî de destnîşan bike. Bi vê mebestê me li ser Teqrîza wî lêkolîn kir û deqa Teqrîzê ji aliyê rûxsar û naverokê ve nirxand. Ev xebat ji destpêkek, pênc beş û ji pêvekan pêk tê.

Peyvên Sereke: Xelîfe Yûsif, Teqrîz, Wêjeya Kurdî ya Klasîk, Kurmancî

ÖZET

XELÎFE YÛSIF VE TAKRİZİ

(İnceleme ve Metin)

Hasan Akboğa

Kürt alim ve yazar Xelife Yûsif yirminci yüzyılın son çeyreği ile yirmibirinci yüzyılın yarısına kadar yaşamış ve yazdığı kürtçe eserleri ile Kürt Edebiyatında önemli bir yer edinmiştir. Xelife Yûsif Doğubeyazıtı bağı Zengezûr köyünde dünyaya gelmiştir. Xelife eserlerini kürtçe yazarken ve anadili konusunda bir tutum geliştirirken birçok klasîk şair gibi, o da Ehmedê Xanî'nin yoğun etkisinde altında kalmıştır. Bu etki Xelife'nin Takrîz adlı eserinde daha açık bir şekilde gözünmektedir.

Kürtçe yazmanın güç olduğu, dil politikalarının ve yasakların en sert olduğu dönemlerde Xelife, bütüb bunlara rağmen eserlerini kürtçe yazma konusunda önemli bir duruş sergilemiş ve fıkıh, hadis ve diğer dini ilimlerle ilgili oniki eserinin tamamını kürtçe kaleme almıştır.

Xelife ve Takrîz adlı eseri üzerine hazırlanan bu çalışma yazarın edebi kişiliğini ve onun kürt edebiyatındaki önemini ortaya çıkarmayı amaçlamaktadır. Bu amaçla Takrîz adlı bu eser üzerine araştırma yapılmış olup, eser birçok yönden irdelenmiştir. Çalışma giriş beş bölüm ve eklerden oluşmaktadır.

Anahtar Sözcükler: Xelife Yûsif, Takriz, Klasik Kürt Edebiyatı, Kurmancî.

ABSTRACT

KHALIFA YUSUF AND HIS TAKRIZ

(Analysis and the Text)

Hasan Akboğa

Kurdish scholar and writer Khalifa Yusuf lived from the last quarter of the nineteenth century to the second half of the twentieth century and with Kurdish works he wrote became one of the important figures of Kurdish literature. Khalifa Yusuf was born in Zengezur, a village of Doğubeyazıt district. By writing Kurdish works and adopting the use of vernacular, like many other classical poets, he was heavily under the influence of Ahmede Khani. This influence can be clearly observed in Khalifa's work Takriz.

In a time when writing in Kurdish was hard and language policies brought about harsh prohibitions Khalifa decidedly preferred writing in Kurdish and published all his twelve books on Islamic law, hadith and other Islamic sciences in Kurdish.

This study focusing on Khalifa and his Takriz aims at demonstrating author's literary personality and his importance in the Kurdish literature. For this purpose, his work Takriz was analyzed and investigated in many aspects. The study consists of an introduction, five chapters and appendix.

Key Words: Khalifa Yusuf, Takriz, The Clasical Kurdish Literature, Kurmanji.

PÊŞGOTIN

Medreseyên Kurdistanê ji destpêka pejirandina Îslamê heta roja îroyîn tesîreke mezin li ser jiyana olî û dîrokî ya gelê kurd hîştîye. Her wiha vê tesîrê xwe di hin deveran de berbiçavtir daye xuya kirin. Li van deveran perwerdehiya şagirt û feqiyên medreseyan bi zimanê serdest ve nedihat meşandin, lewra bi zimanê zikmakî –ango kurdî (û zaravayên wê) û bi zimanên ‘erebî, farisî dersên medreseyan dihatin fêrkirin. Û vê rêgezê jî qedrê zimanê kurdî baştir dida xuya kirin. Bazîd jî yek ji van bajarên medreseyan e ku dewlemendiya xwe ji Ehmedê Xanî û Ekola Xanî digire.

Taybetmendiya herî girîng a Ehmedê Xanî ew e ku sêsed sal ewil di berhemên xwe de cih daye realîteya gelê kurd ku hê îro jî ev realîte didome.¹ Bêdewletî, xizanî, girîngiya ziman, hestên neteweyî, bêtifaqî û gelek têgehên din bi pêşengiya Xanî berbelavbûne. Bi vî awayî Xanî li hemû Kurdistanê û bi taybetî jî li Bazîdê bi ramanên xwe yê girîng ve bûye serkaniya ekolekê û piştî wî kesên wekî Îsmailê Bazîdî (1654-1709), Muradxanê Bazîdî (1737-1784), Mela Mehmûdê Bazîdî (1803-1894), Şêx Mihemed Celalî (1851-1914), Xelîfe Yûsif (1885-1965), Mela Mûsa Celalî (1938-...) û yêd mayîn, heta îro ev ekol hatiye şopandin.

Xelîfe Yûsif hem bi taybetiya xwe ya dînî, hem ya zanistî hem jî ya wêjeyî ve cihekî zêrîn di vê ekolê de girtiye. Xelîfe di serdemeke ku qedexeyên li ser medrese, teke û tîpên ‘erebî hebû, de berhemên xwe bi tîpên ‘erebî û bi zimanê xwe yê zikmakî –kurdi/kurmancî, nivîsiye û perwerdehiya şagirtên xwe jî dîsa bi kurdî/kurmancî û ‘erebî daye. Dema ku mirov qedexeyên hişk yê ji aliyê pergala komara tirkîyê ku li ser kurdî bûn, difikire ev helwesta Xelîfe wêrekiyeke gelek girîng e. Ji ber ku di nav wan salên dijwar de ji sala 1923an heta 1965an tenê du berhemên kurdî bi tîpên ‘erebî hatine çap kirin. Her çiqas navê van her du berheman nehatibe diyarkirin jî, bi ya me îhtîmalek mezin e ku, ev herdu berhem an jî yek ji wan berhemeke Xelîfe be. Ji ber ku piraniya berhemên Xelîfe di navbera van salan de li Enqerê di çapxaneyê Nûrê de hatine çapkirin.

¹ Kadri Yıldırım, *Ehmedê Xanî'nin Fikir Dünyası*, AKYAD, Ağrı 2008, r. 244.

Ev xebata bi navê Xelîfe Yûsif û Teqrîza Wî; Metn û Lêkolîn ji destpêk, pênc beş, encam û pêvekan pêk tê. Di destpêkê de armanc û çarçoveya tezê tê ravekirin; çavkanî tên nirxandin û li ser rêbaza tezê hinek agahî tên dayîn. Di beşa yekem de pênaseya teqrîzê û kevneşopîya teqrîzên kurdî hate dayîn. Dîsa di teqrîza Xelîfe de teqrîzkirina berhemên wî hat şîrovekirin. Beşa duyemîn de em li ser Jiyana Xelîfe û Hemû Berhemên wî sekinîn. Her wiha di derbarê rewşa rojeva siyasî ya serdema Xelîfe jî agahî hate dayîn. Jidayîkbûna wî heta perwerdehiya wî ya medreseyên Bazîdê, koçkirina malbata wî ya Başûr û xwendina wî ya Sêrtê, dîsa em li ser jiyana wî ya li gundê Hedil a Cizîrê jî, rawestiyên. Her wiha di vê beşê de me behsa girtina îcazet û destûrnameyên wî, hînbûna wî ya ‘ilmê tesewûfê, melatiya wî kir. Me dewama beşa duyem de behsa hemû berhemên Xelîfe kir û me li gor mijarên wan ji ew dabeş kir û berhemê wî li gor şêwe û naveroka wan rave kir.

Xelîfe, helbestvanekî klasîk û mutesewif e; di pergala medreseyan re derbas bûye, li wir perwerdehî dîtiye, li cem alimên mezin-yên wekî Şêx Mihemed Celalî û Mela Hemîd- ders wergirtiye û di rêçîka Neqşîbendîtiyê û Qediriyê de çûye. Û vê taybetiyê jî xwe di helbesta wî de aşkere kiriye û karigeriyeke mezin li ser kesayetiya wî ya edebî hiştiye. Me hewl da ku em di beşa sêyem de li ser kesayetiya Xelîfe ya edebî rawestin. Digel vê me di vê beşê de ziman û şêwaza wî bi hûrgilî li ber çavan re derbas kir û kesayetên ku bandor li ser Xelîfe hiştine me bi mînakên nava Teqrîzê nîşan da û şîrove kir. Hin mijarên sereke yên ku di seranserê Teqrîzê de derbas dibin, dîsa di beşa sêyem de hat analîzkirin. Dîsa ji aliyê teşeyî ve serwaya teqrîzê hat derxistin û bi mînakên li gorî cureyên serwayê hat senifandin. Di beşa çarem de jî me naveroka Teqrîzê rave kir. Li gor naveroka helbesta me mijar senifand û ji têgehên dîni heta yên ajalî em bi kûrahî li Teqrîzê hûr bûn.

Di beşa pêncan de me destpêka Teqrîzê li gorî tîpên romayê senifand, ango me hejmar da beşên Teqrîzê. Bi vî awayî 11 beş li gorî elîfbêya erebî hatin rêzkirin. Piştî vê, beşên Teqrîzê bi tîpên transkîrîpsiyonê ve hatin veguhestin û di bin rûpelan de wekî tîbînî ferheng hat danîn. Di ferhengê de peyvên erebî, farisî, tirkî û kurdî, yên ku wateya wan nayên zanîn an jî kêmtê zanîn, hatin ravekirin. Her wiha wateya rêz an jî malikên erebî û farisî jî hatin dayîn.

Mala şewirmendê min, Doç. Dr. M. Zahir Ertekin ava be ku di pêvajoya amadekirinê ya vê xebatê de rê li min vekir û mijarên şêlû zelal kir. Dû re lazim e ku ez spasiya neviyê helbestvanê me –kurê Şêx Mihemed- Birêz Mela Ebdulah bikim. Wî jî bi dilsozî bersiva gelek pirsan da ku bi vî halî kêmasiyên vê xebatê bi me da tamam kirin.

Ez ji kekê xwe yê hêja Mela Beşirê Garisî re jî gelek spas dikim. Wî cara ewil çirûska vê xebatê vexist û ez bi Xelîfe û Teqrîza wî ve dame naskirin. Him di xwendina unsûrên ‘erebî de alîkariya ku li min kir û him jî bo ku bû yek ji endamên juriya min û teza min xwend, ez ji Dr. M. Salih Geçit re jî gelek spas dikim. Li vira lazim e ku ez navê sê hevalên xwe yên hêja Ömer Delikaya, Semih Gezer û Umid Demirhan jî zikir bikim. Ji ber ku wan, bi xwendin, nirxandin û rexneyên xwe ve asta vê xebatê bilindtir kirin, ez spasiya wan jî dikim.

Di dawiyê de ez spasiya dê û bavê xwe, xanima xwe Yelîzê û Seîd Rênasê xwe dikim ku, di pêvajoya vê xebatê de bi dilsozî û sebra xwe ve bûne sitar ji bona min.

Hasan AKBOĞA

Pûşber 2017-Agirî

LÎSTEYA WÊNE Û PÊVEKAN

PÊVEK	RÛPEL
Metn-1: Metnê Çapkirî yê Teqrîzê	r. 130.
Wêne-1: Sûretê Xelîfe Yûsif	r. 147.
Wêne-2: Berga Îcazetê ya ku ji Terîqeta Qadirî Dane X.Y.	r.148.
Wêne-3: Îcazeta Terîqeta Neqşebendî ya ku Şêx Îbrahîm Heqqî Cara Ewil Daye X.Y.	r.149.
Wêne-4: Îcazeta Terîqeta Neqşebendî ya ku Şêx Îbrahîm Heqqî Cara Duduyan Daye X.Y.	r.150.
Wêne-5: Îcazeta Terîqeta Neqşebendî ya ku Şêx Muhemed Nuriyê Dêrşewî Daye X.Y.	r.151.
Wêne-6: Nameya ku Mela Hamid ji Şêx Mehmûd re Nivîsiye da ku X.Y. Bibe Melayê Gundekî	r.152.
Wêne-7: Nameya Şêx Seyda ya ku X.Y. re Şandiye	r.153.
Wêne-8: Nameyek e ku ji X.Y. re Hatiye Şandin	r.154.
Wêne-9: (Ji aliye çepê ve) Şêx Mistefa, Xelîfe Yûsif, Seyîd Mihemed	r.155.
Wêne-10: Tirbeya X. Y. li Gundê Çalxanê Xelîfe (Ji derve ve)	r.155.
Wêne-11: Tirbeya Xelîfe Yûsif û ya bermaliya wî Xanim, li Gundê Çalxanê Xelîfe (Ji hundir ve)	r.156.

- Wêne-12:** Mala X. Y. ya li gundê Çalxanê Xelîfe r.156.
- Wêne-13:** Mizgefta Xelîfe li gundê Çalxanê Xelîfe r.157.
- Wêne-14:** Hin Eşyayên Şexsî yên Xelîfe Yûsif r.157.
- Wêne-15:** Teqrîza Şêx Muhammed Eskerî ya li Ser Rewd'un-Ne'îmê r.158.
- Wêne-16:** Teqrîza Seyid Ebdurehman ya li Ser Dîwana Îrfan r.159.

KURTEBÊJE

amd.	: Amadekar
b.n.	: Berhema navborî
b.n.ç.	: Berhema neçapbûyî
bnr.	: Binêrin
br.	: Berhevkirin
c.	: Cild
ç.	: Çap
‘E.	: ‘Erebî
F.	: Farisî
g.	: Gotar
g.n.	: Gotara navborî
h.a.	: Hasan Akboğa
h.b.	: Heman berhem
h.h.	: Heman heyvepvîn
h.g.	: Heman gotar
h.r.	: Heman rûpel
hej.	: Hejmar
hwd.	: Her wekî din
j.	: Jimare
K.	: Kurmancî
M. E. T.	: Mela Ebdulah Tanrıverdi
r.	: Rûpel
T.	: Tirkî
tîp.	: Tîpguhezî

vgz. : Veguhezêr
wer. : Wergêr
z. : Zayîni
X.Y. : Xelîfe Yûsif

DESTPÊK

Teqrîz cureyeke edebî ye ku ji aliyê nivîskar an jî helbestvan ve di destpêka berhemê de wekî kurteyekî, bi armanca pesnê berhemê tê nivîsandin û di serê berhemê de cih digire. Ango teqrîz pesin û medhiyeya wê berhemê ye.² Teqrîz li gor lêkolînên hatine kirin, li ser van cureyên wêjeyî hatiye nivîsandin; dîwan, mesnewi, rojname, kovar, tezkîre, ferheng, şîretname, sakînâme, sûrnâme, nasihatnâme, menâkibnâme. Her wiha li ser pirtûkên wekî roman, dîrok, belaxat û hwd jî teqrîz hatine nivîsandin.³

Di edebiyata kurdî ya klasîk de her çiqas hin malikan de pesnê helbestvan û berhema wî derbas bibe jî, me heta niha nedîtiye ku berhemek/mesnewiyek bi rek û pek li ser pesnê berhemên nivîskarekî hatibe honandin. Bi her awayî Teqrîza Xelîfe di qada xwe de mustesna ye. Teqrîz hem li gor rêgeza xwe nehatiye saz kirin ku divê wekî kurteyekî bihata nivîsandin û li ser berhemekî tenê bihata amade kirin; hem menzûm e ku ev cure di wêjeya kurdî ya klasîk de tune; hem jî ji aliye nivîskar bi xwe û wekî mesnewiyeke berfireh hatiye nivîsandin.

Selîm Temo di derbarê Teqrîza Xelîfe de/helbestên wî de wiha dibêje: “Teqrîz berhema Xelîfe ya menzûm e ku di wê de pesnê berhemên xwe dide”.⁴ Lê bi ya me di vê pênaseyê de kêmasî heye, ji ber ku her çiqas di seranserê Teqrîzê de danasîna berhemên wî hatibe dayîn jî gelek mijarên din ên girîng jî di nav de hene. Wekî mînak rexne, girîngiya ziman, girîngiya xwendin û ilme, şîret û hwd.

Ev taybetmendî vê xebatê girîngtir dike ku di pêşerojê de rê li ber xebatên wiha veke. Her wiha wê bibe teza yekem ku li Bakûr li ser Teqrîzê û Xelîfe Yûsif hatiye amade kirin.

² Seyit Kemal Karaalioglu, *Edebiyat Terimleri Sözlüğü*, İnkılap ve Aka Basımevi, İstanbul, 1975. r. 359.

³ Nagihan Gür, *Klasik Türk Edebiyatında Takriz*, Yayınlanmamış Doktora Tezi, Balıkesir Üniversitesi, 2014, r. 74.

⁴ Selim Temo, *Kürt Şiir Antolojisi II*, Agora Kitaplığı, İstanbul, 2010. r. 1475-1476.

Girîngî û Armanca Mijarê

Edebiyata Kurdî ya Klasîk li kêleka dîwanan,⁵ ji hêla mesnewiyan⁶ ve jî gelek dewlemend e. Çi ji serdema klasîk çi ji serdema modern bin, dîwan û mesnewiyên kurdî nîşaneyê xurtbûna helbesta klasîk in û temsîla edebiyata kurdî ya klasîk dikin.⁷ Hin ji van mesnewî û dîwanan di serdema klasîk de û beriya modernîzmê hatine nivîsîn, hin jî di serdema modern de lê bi rê û rêgezên klasîk hatine nivîsandin. Taybetmendiyeke edebiyata kurdî ya klasîk jî ew e ku helbestvan bi kêşeya arûzê helbestên xwe binivîse.⁸ Ango divê helbest ji aliye teşe û uslûbê ve jî li gor rêgeza helbesta klasîk be. Lê divê bê diyar kirin ku Teqrîza Xelîfe vê taybetmendiyeke nahundirîne. Lê ji ber ku berhem ji hêla naverokê ve klasîk e, anga mijarên helbestan dişibe helbesta klasîk ev xebat jî wekî mesnewiyeke edebî ya zimanê kurdî hat pejirandin.

Di edebiyata zimanên cînarê kurdî de, anga di 'erebî, farisî û tirkî de teqrîz wek binbeşeke wêjeya klasîk cihê xwe girtiye.⁹ Her wiha teqrîz hem menzûm hem jî nesîr bûye du şaxan. Lê digel ku heta niha gelek mesnewî û dîwanên kurdî (bi diyalektên xwe kurmancî, soranî, zazakî) hatibe nivîsandin jî, di nava van berheman de em rastî cureya teqrîzê/pesinname nehatin. Vê taybetmendiyeke bala me kişand li ser vê berhemê û me xwest bila raya giştî û entelejansiya kurdî jî vê xalê bihise. Her wiha wêjeya kurdî ya

⁵ Ji bona hin dîwanên kurdî bnr: Melayê Cizîrî, *Dîwan*, (Amd. Emin Narozi), Weşanên Avesta, Stenbol 2012; Şêx Şemsettinê Exlatî, *Dîwan*, Amd. Bamed Serdar, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2015; Seyîd Eliyê Findikî, *Dîwan*, Amd. Selman Dilovan&Huseyn Şemrexî, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2011; Şêx Ehmedê Feqîr, *Dîwan*, Amd. Hayrullah Acar, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2017; Seyîd Qedri Haşimî, *Dîwana 'Irfan*, Edîsyon-Krîtîk-Amadekarî: M. Nesim Doru, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2016; Şêx Mihemed Zahirê Bedewî, *Dîwana Dahî*, Amd. Tehsîn Îbrahim Doskî, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2013; Mela Ebdulfettah Hezroyî, *Dîwana Fethî*, Amd. Tehsîn Îbrahim Doskî, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2013; Mela Mihemedê Lîceyî, *Dîwana Hadî*, Amd. Tehsîn Îbrahim Doskî, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2013; Mela Beşîrê Bedewî, *Dîwana Bêxew*, Amd. Tehsîn Îbrahim Doskî, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2013; Şêx Evdirehmanê Axtepe, *Dîwana Rûhî*, Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002; Şêx Hesîp Axtepe, *Dîwana Hesbî*, Amd. Zeynelabidîn Zinar, Weşanên Doz, Stenbol 2009.

⁶ Ji bona hin mesnewiyên kurdî jî bnr. Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, Çeviri ve Kavramsal Tahlil: Kadri Yıldırım, Weşanên Avesta, Stenbol 2013; Selîmê Hîzanî, *Yûsuf û Zuleyxa*, (Edîsyon, Krîtîk Amadekarî Ayhan Geverî), Weşanên Nûbihar, Stenbol 2013; Şêx Mihemed Can, *Leyla û Mecnûn*, Amd. Zeynelabidîn Zinar, Pencînar Weşanxaneyê Çanda Kurdî, Stockholm 1992.

⁷ Yakup Aykaç, *Dîwana Hezîn (Metn, Lêkolîn û Ferheng)*, Teza Lisansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Bîngolê, Çewlîg, 2015, r. 15.

⁸ Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2012.

⁹ Gür, h. b. r. 75.

klasîk jî derfêteke wiha bêpar nemine. Em hêvîdar in ku di pêşerojê de lêkolîner li ser vê mijare bi dûvdirêjî rawestin û ev xebat ji bo wan bibe çirûskekî.

Naverok û Rêbaza Tezê

Di amadekirina metnê de ev rêbaz hat şopandin.

1. Teqrîza Xelîfe Yûsif, bi tîpên erebî hatiye nivîsandin. Ji tîpên Teqrîzê hin jê weke P (پ), Ç (چ), J (ج) di alfabeya erebî de nînin û ji berê de di alfabeya kurdî de hene. Me, di wergerandina tîpên ji erebî bal bi tîpên latinî ve, ji xeynî tîpên “q” û “x” yê alfabeya transkripsiyonê bi kar anî. Me pêşî alfabeya transkripsiyonê derxist û paşê jî dest bi kar kir:

Elîfbêya Transkrîpsiyonê

ث	s	S
ح	h	H
ذ	z	Z
ص	ş	Ş
ض	d, z	Ž
ط	t	T
ظ	z	Z
ع	è	‘
غ	g	G
ء	é	’
Apastrops	`	

2. Di pêvajoya amadekirina vê xebatê de me tenê xwe sparte nusxeyeke çapkirî ya Teqrîzê ku ji aliye Xelîfe ve- ku navê wî wekî Yusuf Topçuoğlu hatiye nivîsîn, sala 1961an de li Enqerê hatiye çapkirin. Mixabin desxetêke Teqrîzê nekete deste me. Me di tipveguhastina Teqrîzê de nusxeya çapkirî ya Teqrîzê esas girt û alfabeya transkrîpsiyonê ya ku li jor jî hatiye dayîn, hilbijart.

Her çiqas di pêvajoya lêkolînê ya vê xebatê de me hewl da ku bila nusxeyeke destxeta Teqrîzê bi dest bikeve, mixabin ev kar neçû serî û destxetêke Teqrîzê nehate dîtin. Ji ber vê yekê xebat li ser nusxeya çapkirî hatiye amadekirin.

3. Divê bê gotin ku Teqrîz ji yazdeh beşan pêk hatiye û wisa xuya dike ku ev dabeşkirin ne li gorî naveroka beşa ye. Bi ya me ji bona têgihiştineke baştir rêgezeke wiha hatiye tercîhkirin. Lewre dema ku Teqrîz tê xwendin navbera beşan de cudatiya mijaran bi awayekî berbiçav naxuyê. Ji ber vê yeke me rûpela yekem ya teqrîzê bi hejmarên romayê senifand. Ango me hejmar da beşên Teqrîzê, da ku hem dîtina malikan hêsan bibe hem jî xebateke akademîk derkeve holê. Bi vî awayî 11 beş li gorî elîfbêya erebî hatin rêzkirin. Piştî vê, beşên Teqrîzê bi tîpên transkîrîpsiyonê ve hatin veguhestin û di bin rûpelan de wekî tîbînî ferhengok hat danîn. Di ferhengokê de peyvên erebî, farisî, tirkî û kurdî hatin ravekirin. Herwiha wateya rêz an jî malikên erebî û farisî jî hatin dayîn.

4. Di analîza teqrîzê de me li ser mînakên di nav kevanekê de jimareya nimûneyên xwe dane ku ya yekem ku ji jimareyên romayê pêk tê, jimareya helbestê, ya duyem jî jimareya malikê nîşan dide. Bo nimûne, jimareya li ber vê malikê tê wê wateyê ku ev malik di beşa 9'an de malika 12an e.

Şifa nabin ji mereza qelbê evan le'îma

Eger şed derman bixwin ji deste van hekîma

(IX/12)

5. Di binê her rûpelê de ferheng hat danîn. Di amadekirina rêbazê de rêya ku me şopand ev bû: Peyvên erebî, farisî, tirkî hatin ravekirin. Ji bilî van, peyvên kurdî yê herêmî, yê ku di ferhengên kurdî de nayên dîtin an jî kêmtên bi kar anîn (wekî guhdîrêj, kûtxwer, kêmbiha, navmela, serece û hwd.)¹⁰ hatin ravekirin. Pirsgirêka herî mezin ev bû ku peyvên ferhengê gelek caran xwe di heman helbestê û helbestên din de jî nîşan didan. Ji ber vê yekê, peyveke biyanî di helbestên kurt de carek tenê; yan jî, di helbestên dirêj de du yan jî sê rûpel şûn de cardin derketibe hat ravekirin.

¹⁰ Ji bona hin ji van ferhangan bnr. Zana Farqînî, *Ferheng*, Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2005; D. Îzolî, *Ferheng*, Weşanên Deng, Amed 2013; Torî, *Ferheng*, Weşanên Doz, Stenbol 2006; Mîrkan Baran, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Ozan Yayıncılık, İstanbul 2016.

6. Di teqrîzê de hin risteyan de peyvên hemwate hatibûn bi kar anîn, lê gihaneka ‘û’ gelek caran hatibe nivîsandin jî di hinek risteyan de tunebû. Ji ber ku teqrîz li gor weznê erûzê û weznê kîteyê nehatiye nivîsandin û di zêdekirina gihaneka ‘û’yê qafiyeyê xirab nake, me di nav koşekevanekê de -‘[û]’- lê zêdekir. Ji ber ku Xelîfe jî di seranserê teqrîzê de gelek caran gihaneka ‘û’yê di navbera peyvên hemwate de bi kar aniye me ev rêgez tercih kir.

Materyal û Çavkaniyên Tezê

Xebatên sereke ku heta niha li ser Xelîfe, Teqrîzê û berhemên wî yên din hatine kirin, ev in:

1. Zeynelabidîn Zinar di pirtûka xwe ya bi navê *Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî* de li ser Xelîfe çend rûpel (heşt rûpel) agahî daye. Her çiqas Xelîfe helbestên xwe bi sernavan nenivîsibe jî Zinar li gor naveroka hin helbestan sernav daye. Ev pirtûka Zinar ji nav Weşanên Roja Nû derçûye û di 1991an de li Stockholmê (Swêd) çap bûye.¹¹

2. Mehmet Çağlayan jî di pirtûka xwe ya bi navê *Şark Uleması* (‘Alimên Rohhilatê’) de cih daye Xelîfe, lê navê Xelîfe wek ‘*Yusuf Doğubeyazidi(Şeyh)*’ nivîsiye. Di pirtûkê de qasî sê rûpelan jiyana Xelîfe, çend helbestên wî bi wergera wan a tirkî û çend taybetiyên Xelîfe hatiye rave kirin.¹²

3. Weşanên Hîra wek du çerman bi navê *Büyük Şafii Fıkhi - ‘İrşad’ul ‘İbad Tercümesi&Şafii Fıkhi-* di sala 1998an de berhema Xelîfe ‘İrşad’ul ‘İbad çap kiriye. Ev xebat hem bi tîpên erebî hatiye amade kirin hem jî wergera wê ya tirkî hatiye kirin. Teqrîz jî di serê berhemê de hatiye tîpguhestin. Navê Xelîfe di berhemê de wek ‘*Doğubeyazıtlı Halife Yusuf*’ derbas dibe. Cara ewil em dibinin kudi vê berhemê de latîniya Teqrîzê weşiyaye. Lê di destpêkê bigirin heta dawiyê tijî xeletiyên berbiçav e. Xuya ye ku kesê veguhezêr xwedî kurdiyeke baş nîne an jî tîpên latînî nizane baş bi kar

¹¹ Zeynelabidin Zinar, *Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî*, Weşanên Roja Nû, Stockholm (Swêd) 1991, r. 200-207.

¹² Mehmet Çağlayan, *Şark Uleması*, Çağlayan Yayınları, İstanbul 1992, r. 294-297.

bîne.¹³ Her wiha tiştêkî balkêş jî ew e ku, dadmendekî¹⁴ pêşgotina vê berhemê nivîsiye û gelek pesnê Xelîfe daye.¹⁵

4. Dosyeya Xelîfe Yûsif, ya ku di sala 2003an û hejmara 89an a Kovara Nûbiharê de derketiye. Ev dosye nêzî 30 rûpelan û 5 nivîsan/gotaran pêk tê.

Ali Karadeniz wekî pêşgotinekî di nivîsa xwe ya bi navê “Çend Gotin li Ser Perwerdeyê û Xelîfe Yûsif” de qala girîngiya perwerdehiyê dike û di darbarê Xelîfe de hin agahiyên dide, cih dide taybetiyên wî.¹⁶ Piştî vê nivîsê kovarê bi rûpelekî li ser kurtejiyana Xelîfe agahî daye. Birêz Süleyman Çevik hevpeyvînek bi kurê wî, Şêx Mistefa¹⁷ re kiriye û vê hevpeyvînê bi navê “Bi Kurê Xelîfe Yûsif Şêx Mistefa re Hevpeyvîn” di dosyeyê de cih girtiye. Şêx Mistefa gelek agahiyên girîng dide ku em niha gelek cihan de xwe dispêrên van agahiyên.¹⁸ Dîsa di dosyeyê de em dibînîn ku Mele Seîd Girdarî bi nivîsa xwe, “Xelîfe Yûsif û ‘Irşad’ul ‘Ibada Kurmancî” , ve li ser fiqha şafî û Xelîfe radiweste û ji aliye ruxsarî û naverokê ve berhemê vediçirîne.¹⁹ Girdarî her wiha behsa Eqîde û Tecwîdê jî dike ku em dizanin ev herdu berhem jî yên Xelîfe ne, lê di hin çapên Irşad’ul ‘Ibadê de nava wê de hatine çap kirin. Dr. Nacî Kutlay jî bi gotara xwe ya bi navê, “Xelîfe Yûsif di Rêya Ehmedê Xanî de” ve perspektîfeke cuda dide pêşiya me. Di nav rêzikê helbestên Xelîfe de û ji helwesta Xelîfe ya zimên, karigerî û şopa Ehmedê

¹³ Mînak:

Wergera malika IIIyem ya Hira Yayınları:
“*Kelbi kut Xur bikêri şifani nai şivaniyê nayê
Cahilek nezani hûde nedayi*”

Wergera malika IIIyem ya ku aliye me ve hatiye kirin:
“*Kelbê kûtxwer bi kêr şivani na’ê
Cahilekî nezani Xwedê neda’ê*”

¹⁴ Navê wî dadmendî Ali Haydar Semercioglu ye. Li Agiriyê dadmendî kiriye. Di pêşgotinê de gelek pesnê Xelîfe û keda wî ya derbarê dîn de daye. Lê bi çavekî fermiyane Xelîfe nirxandiye û qet behsa kurdînûsiya Xelîfe û nasnameya wî nekiriye. Semercioglu di salên 1960î de kovara Hilalê de 11 gotarên dînî nivîsiye her wiha li Sakaryayê jî dadmendî kiriye. Mixabin me di derbarê wî de agahiyên dîtir bi dest nexist. ([http://idp.org.tr/yazarlar/ali-haydar-semercioglu-](http://idp.org.tr/yazarlar/ali-haydar-semercioglu) Mêjûya Ragihandinê 18.09.2016)

¹⁵ Doğubeyazıtlı Halife Yusuf, *Büyük Şafii Fıkhı -‘Irşad’ul ‘Ibad Tercümesi&Şafii Fıkhı-*, Hira Yayınları, İstanbul, 1998.

¹⁶ Alî Karadeniz, “Çend Gotin li Ser Perwerdeyê û Xelîfe Yûsif”, Nûbihar, c. 8, j. 89, 2003, r. 5-7.

¹⁷ Ji şeş zarên Xelîfê yê herî mezin e ku, li Bazîdê 20.04.2004an de çû ber rehma Xwedê. (1923-2004).

¹⁸ Süleyman Çevik, “Bi Kurê Xelîfe Yûsif Şêx Mistefa re Hevpeyvîn”, Nûbihar, c. 8, j. 89, 2003, r. 9-18.

¹⁹ Mele Seîd Girdarî, “Xelîfe Yûsif û ‘Irşad’ul ‘Ibada Kurmancî”, Nûbihar, c. 8, j. 89, 2003, r. 19-21.

Xanî vedikole.²⁰ Çawa ku Kutlay jî di gotara xwe de dinirxîne, em jî dibînîn ku kurdînûsiya Ehmedê Xanî û perspektîfa wî, di Xelîfe de jî berbiçav xuya dike. Em ê di çend beşên din yên vê xebatê de dîsa li ser vê babetê rawestin. Di nivîsa dawiyê ya dosyeyê de Abdusselam Bêcirmanî pirtûka Xelîfe ya bi navê *Usûla Meratîbê Hîsab*, ji tîpên ‘erebî derbazî tîpên latînî kiriye.²¹

5. Teza Metin Yüksel a doktorayê ya bi navê *‘Dengbêj, Mullah, Intelligentia: The Survival And Revival Of The Kurdish-Kurmanji Language In The Middle East, 1925-1960’* jî dîsa xebateke xurt e ku beşek li ser Xelîfe Yûsif e. Ev tez di sala 2011an de li Dewletên Yekîtiya Emerîkayê (ABD), di Zanîngeha Chicagoyê, Beşa Ziman û Şaristaniyên Rojhilata Nêzîk de wekî teza doktorayê hatiye pejirandin.²² Yüksel di vê xebatê de 30 rûpelan zêdetir li ser jiyana Xelîfe, kurdînûsiya wî û berhemên wî, her wiha li ser Teqrîza wî agahiyan dide û girîngiya wê bi hûrgulî vediçirîne. Di pêvekê de jî teksta Teqrîza wî ya çapkirî dide ku me jî di vê xebatê de xwe spartibûyê.

6. Nivîsara Omidê Mistefayê Celalî (Umîd Demîrhan) ya ku bi navê “Hin Peyv ji Pirtûkên Xelîfe Êsiv” jî xebateke balkêş e ku, di Kurmancîyê de -rojnameya taybet ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê- hatiye weşandin. Amadekar di nivîsa xwe de bîst û yek peyv ji çar berhemên Xelîfe –Xutbe, Eqîdeya Îmanê, Teqrîz û Feraîzê- jibartiye.²³

²⁰ Naci Kutlay, “Xelîfe Yûsif di Rêya Ehmedê Xanî de”, *Nûbihar*, c. 8, j. 89, 2003, r. 23-25.

²¹ Xelîfe Yûsif, *Usûla Meratîbê Hîsab*, Tîpg. Abdusselam Bêcirmanî, *Nûbihar*, c. 8, j. 89, 2003, r. 26-35.

²² Metin Yüksel, *Dengbêj, Mullah, Intelligentia: The Survival And Revival Of The Kurdish-Kurmanji Language In The Middle East, 1925-1960*, The University Of Chicago Department Of Near Eastern Languages And Civilizations Chicago, 2011, Teza Doktorayê ya Çapnekirî, r. 179-208.

²³ Omidê Mistefayê Celalî, “Hin Peyv ji Pirtûkên Xelîfe Êsiv”, *Kurmancî*, Hejmar 58, Bihar-2016, r.6.

BEŞA YEKEM

TEQRÎZ DI WÊJEYA KURMANCÎ DE Û TEQRÎZA XELÎFE YÛSIF

Wekî cureyekî edebî hebûna teqrîzê û mînakên wê yên balkêş di edebiyata kurmancî de, asta xurtbûna edebiyata kurmancî diyar dikin. Ji ber ku di teqrîzan de wêjenas û helbestvanên kurd berhemên hevdu pesinandine û qîmeta wan bi hunerî nirxandine. Li gor serdema xwe ev danasîn û vexwendinek e û xwîner jî bi vî awayî bi çavê hin nivîskaran berhemên hin kesan nas kirine.

Di wêjeya erebî, farisî û tirkî de heta niha gelek teqrîz hatine nivîsîn û li ser van teqrîzan lêkolîn jî hatine kirin û heta ketine nava lîteratura akademiyê jî.²⁴ Lê li ser teqrîzên kurdî li gor agahiyên li ber destên me, xebateke wiha xuya nake. Lewma em ê di vê beşê de ewil li ser pênase û cureyên teqrîzê û piştî wê jî li ser teqrîzên kurmancî yên ku bi dest ketine rawestin.

Teqrîza Xelîfe Yûsif jî yek ji van mînakan e ku li gor teqrîzên din hin ciyawaziyên wê hene. Di teqrîzên kurmancî yên din de nivîskar an jî helbestvanan li ser berhema wêjenasekî din teqrîz nivîsandiye, lê Xelîfe xwe bi xwe li ser berhemên xwe teqrîz nivîsiye. Her wiha teqrîzên din li gor teqrîza Xelîfe kurttir in.

Ferqeke din jî ew e ku di teqrîzên din de nivîskar tenê pesnê berhemekî didin lê teqrîza Xelîfe de pesnê gelek berhemên tê dayîn. Teqrîza Xelîfe jî wek teqrîzên sereke di destpêka berhema wî ya bi navê Îrşad'ul Îbadê de hatiye çapkirin. Ev rêgeza çapkirinê di çapên din de jî bi vî awayî hatiye şopandin.

1. PÊNASEYA TEQRÎZÊ

Di ferhenga Saziya Zimanê Tirkî de, nivîsara ku ji bona berhemekî ji hêla kesekî zane ve hatiye nivîsandin û di destpêka berhemê de cih digire re teqrîz tê

²⁴ Ji bona gelek nimûneyên teqrîzên 'erebî, farisî û tirkî bnr. Nagihan Gür, *Klasik Türk Edebiyatında Takriz*, Yayınlanmamış Doktora Tezi, Balıkesir Üniversitesi, 2014, r. 41-65. Her wiha ji bona hin teqrîzên Recaizade Mahmut Ekrem bnr. Hanife Güvenlioğlu, *Recâizade Mahmud Ekrem'den İki Uygulamalı Tenkit Örneği: Takdir-i Elhan ve Takrizat (Metin – İnceleme)*, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Marmara Üniversitesi, 2008, r. 45-59.

gotin.²⁵ Teqrîz peyveke ‘erebî ye û tê wateya pesindayînê û çawa ku piranî tê sere berheman carna jî di dawiya berheman de cih digire. Her wiha carinan kêr be jî di nava berheman de jî cih girtiye.

Wêjeya erebî jî ji hêla teqrîzan ve gelek dewlemend e û teqrîzê wekî cureyekê edebî bingeheke xurt girtiye. Her wiha pênaseya teqrîzê jî digel wateya pesindayînê, wateyeke rexneyî jî hildaye. Ji ber ku nivîskarên ereb ji xeynî pesindayînê teqrîz wekî amûrekê nirxandin û rexneyê jî bi kar anîne. Bi vî awayî wateya peyva teqrîzê jî dîsa berfirehtir bûye.

Di wateya ferhengî de çarçoveyeke zanistî ji pênaseya teqrîzê re hatiye avakirin û bivê nevē ey yek sînorekî datîne ji bona teqrîzê, ango ev wateya wê ya teng e. Di wateya fireh de dibe ku pêşkeşiyên di sere gelek berhemên edebî de wekî teqrîz bîn hesabandin. Li gor hin wêjenasan dibace jî wekî teqrîz tîn qebûlkirin û kevneşopiya wê jî di edebiyata farisî de zêdetir tê dîtin. Di edebiyata farisî de wateya peyva teqrîzê gelekî berfireh e. Ji ber ku hemû nîşeyên nirxandin û danasînê ku ji berhemê tîn zêdekirin wekî teqrîzan tê dîtin. Bi vî awayî nîqaşeke girîng dixê nava edebiyata zimanên rojhilata navîn.²⁶

Teqrîz li gor lêkolînên hatine kirin, li ser van cureyên wêjeyî hatiye nivîsandin; dîwan, mesnewî, rojname, kovar, tezkîre, ferheng, şîretname, sakînâme, sûrnâme, nasihatnâme, menâkibnâme. Her wiha li ser pirtûkên wekî roman, dîrok, belaxat û hwd jî teqrîz hatine nivîsandin.²⁷

2. TRADÎSYONA TEQRÎZNIVÎSÎNÊ DI WÊJEYA KURMANCÎ DE

Di edebiyata kurmancî de paşxaneya teqrîznûsiyê heta dawiya sedsala XIXan diçe û di sedsala XXan de tê dîtin ku gelek teqrîz ji aliye nivîskarên kurd ve hatine nivîsîn. Di bin vê sernavê de em ê hem cih bidin van teqrîzan hem jî hin agahiyan di derbarê wan de bidin. Lê dibe ku ji xeynî van a hin teqrîzên din jî hebin ku me ew bi dest nexistibe.

²⁵ www.tdk.gov.tr, Mêjûya Ragihandinê, 10ê Gulanê 2017.

²⁶ Rudolf Vesely, “Das Takriz in der Arabischen Literatur”, *Die Memlûken – Studien zu ihrer Geschichte und Kultur. Zum Gedenken an Ulrich Haarmann (1942-1999)*, Stephan Conermann-Anja Pistor-Hatam (Hg.), 2003: 379-385.

²⁷ Gür, h.b., *Yayımlanmamış Doktora Tezi*, Balıkesir Üniversitesi, 2014, r. 42.

Şêx Mihemed Eskerî (Axtepî) sê teqrîz li ser berhemên kurdî nivîsiye; teqrîza yekem li ser Mem û Zîn a Ehmedê Xanî ye ku ji 38 malikan pêk tê, ya duyem li ser Leyl û Mecnûn a Şêx Mihemed Kerbelayî (Can) ye ku ev jî ji 36 malikan pêk tê û teqrîza sêyem jî li ser Rewd'un-Ne'îm a bavê xwe Şêx Evdîrehmanê Axtepî nivîsiye û ew jî ji 36 malikan pêk hatiye.

Seyyîd Ebdurrehmanê kurê Seyyîd Eliyê Findikî, di dawîya Dîwana Îrfan a Seyyîd Muhammed Qedrî (bi navê Seyyîd Qadrî Haşimî jî tê naskirin)²⁸ de teqrîzeke 'erebî li ser vê dîwanê nivîsiye. Tarîxa nivîsandina vê teqrîzê 1969ê mîladî ye.²⁹ Her çiqas Seyyîd Ebdurrehman teqrîz bi zimanê 'erebî nivîsibe jî, ji ber ku ev teqrîz di dawîya dîwaneke kurdî de hatiye nivîsandin, hewce hat dîtin ku ew jî bikeve nava tradîsyona teqrîzên wêjeya kurdî.³⁰

2.1. Sê Teqrîzên Şêx Eskerî

2.1.1. Mem û Zîna Ehmedê Xanî

Şêx Eskerî teqrîzeke dirêz û menzûm ji bona Mem û Zîna Ehmedê Xanî nivîsiye ku 38 malik e. Eskerî ev teqrîz di pirtûka xwe ya bi navê Keşkolê de bi cih kiriye. Di vê teqrîzê de pesnê Ehmedê Xanî û Mem û Zîna wî dide. Teqrîz bi kêşeya erûzê ve hatiye nivîsandin.³¹ Çend malik ji teqrîza navborî ev in:

Mef'ûlu/ mefa'îlun/ fe'ûlun

1. Her gah /hezar rehîmê/ bê'eded
Ya Rebb tu bike li rûhê Eşmed
2. Şeyx Eşmedê Xanî rûh şa ke
Wî bexşê hebîbê Muştefa ke
3. Kurmancî kitabeke buha pir
Xweş nezm kirî di 'işqê pur sir

²⁸ Seyyîd Qedrî Haşimî (1898-1961), Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Seyyîd Qedrî Haşimî, *Dîwana 'Irfan*, Edîsyon-Krîtîk-Amadekarî: M. Nesim Doru, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2016.

²⁹ Abdullah Ekici, *Zeynelabidînê Amidî: Jiyan, Berhem û Xebatên Wî yê Destnivîsî*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn 2014, r. 133-134.

³⁰ Nusxeyeke heman dîwanê di sala 2016an de ji aliyê M. Nesim Doru ve hat amadekirin û çapkirin. Lê dawîya wê de amadekarê wê hewce nedîtiye ku cih bide teqrîza navborî. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Seyyîd Qedrî Haşimî, *Dîwana 'Irfan*, Edîsyon-Krîtîk-Amadekarî: M. Nesim Doru, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2016.

³¹ Şêx Eskerî, *Keşkol*, Amd. Zeynelabidîn Zinar, Weşanên Doz, Stenbol 2009, r. 148-161.

4. Meqşed ji xwe ra Memê û Zînê
Kir meţle‘ê vê giran evînê
5. Abê heyewan ji xameya wî
Zînê û Memê di nameya wî
- .
- .
- .
36. Ev nusxeê Zîn û Mem tamamî
Teşhîh me kir heçî me zanî
37. Lilleh şukir ku bûme raĥet
Ev zehmet û zorê dê nihayet
38. Da luţfê ku ‘*Eskerî*’ tamam kir
Bo Xaliqê ĥemd û hem şena kir³²

2.1.2. Leyl û Mecnûn

Şêx eskerî ev teqrîz ji bo Leyl û Mecnûna³³ Şêx Muhemmed Can (Kerbelayî)³⁴ nivîsiye ku ji 36 malikan pêk tê. Teqrîz menzûm e û bi zimanekê hunerî hatiye nivîsandin.³⁵ Li vir tenê me cih da çend malikan:

Mef‘ûlu/ mefa‘îlun/ fe‘ûlun

1. Ew pîrê terîqê Şeyx Muĥemmed
Can e Xudê lê ke reĥmê bêĥed
2. Mecnûn ĥebîb û Leylil-lah
Xewwasê biharê lê me‘el-lah
3. Perwaneyê şem‘ê la-mekan î
Ew rehberî rahê cawidan î

³² Kitêba Zeyne‘l-‘Abidîn El-Amedî ĥefere‘l-lahu we‘l-nazime we‘l- walîdeyne we‘l-mu‘minîn ecme‘în 7 Rebi‘u‘l-axir 1413 h. el-miwafiq 1992 Mîladî (Tipg. Semîh GEZER, ber çapê).

³³ Leyl û Mecnûn, mesnewiya ku ji hêla Şêx Mihemed Can ve hatiye nivîsandin. Çend nivîskarên kurd ên din jî dîsa hin varyantê vê mesnewiyê nivîsandine. Şêx Mihemed Can bi kurdiya kurmancî di sala 1884an de ev mesnewî nivîsiye. Ji bona agahiyên zêdetir bnr. Abdurrahman Adak, “Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de Mesnewiyên Leyla û Mecnûnê”, Wêje û Rexne, hj. 3 Sal: 2014, r. 107; Şêx Mihemed Can, Leyla û Mecnûn, Amd. Zeynelabidîn Zinar, Pencînar Weşanxaneya Çanda Kurdî, Stockholm 1992.

³⁴ Şêx Mihemed Can, kurê Şêx Hesênê Nûranî û birayê Şêx Ebdurreĥmanê Axtepi ye. Di 29ê adara 1858an de li gundê Axtepe kul i ser navçeya Çinara Diyarbekirê ye hatiye dinyayê û di 9ê adara 1909an de wefat kiriye. Ji bona agahiyên zêdetir bnr. Abdurrahman Adak, h.g. r. 107.

³⁵ Kitêba Zeyne‘l-‘Abidîn El-Amedî ĥefere‘l-lahu we‘l-nazime we‘l- walîdeyne we‘l-mu‘minîn ecme‘în 7 Rebi‘u‘l-axir 1413 h. el-miwafiq 1992 Mîladî (Tipg. Semîh GEZER, ber çapê).

4. Ev nusxe kitabî Ley û Mecnûn
Ev 'îşqê xeşê bi nûrê mewzûn

•
•
•

36. Hêvî heye '*Eskerî* ji Barî
Mehrûm nebit ji weşlê yarî³⁶

2.1.3. Rewd'un-Ne'îm

Eskerî digel herdu teqrîzên xwe yên din teqrîzek jî li ser Rewd'un-Neîma apê xwe Şêx Abdurrehmanê Axtepi nivsiye. Teqrîz wekî herdu teqrîzên wî yên din bi weznê erûzê hatiye nivîsandin. Teqrîz jî 36 malikan pêk tê û li jêrê hatiye pêşkeşkirin.

Teqrîzun 'ela Rewdu'n-ne'îm li 'ş- Şêyx Muhammed 'Eskerî Rehîme'l-lahu Te'ala

Bismillahi'r-Rehmani'r-Rehîm

Fe'ûlun/ fe'ûlun/ fe'ûlun/ fe'ûlun

1. Gelek hemd û şukr û sênaê mezin
Xudaê ezel da'imê jê re bin

2. Hezaran şelat û selamê leîf
Li ser Ehmed û al û şehbê şerîf

3. Kitaba ku lê ism e Rewdu'n-ne'îm
Wekî xizneyek nûrê Rebbê 'ezîm

•
•
•

36. Efû ke ilahî tu vê kelbê wan
Meke '*Eskerî* rûreş û eman³⁷

³⁶ Kitêba Zeyne'l-'Abidîn El-Amedî xefere'l-lahu we'l-nazime we'l- walîdeyne we'l-mu'minîn ecme'în 7 Rebi'u'l-axir 1413 h. el-miwafiq 1992 Mîladî (Tîpg. Semîh GEZER, ber çapê).

³⁷ Kitêba Zeyne'l-'Abidîn El-Amedî xefere'l-lahu we'l-nazime we'l- walîdeyne we'l-mu'minîn ecme'în 7 Rebi'u'l-axir 1413 h. el-miwafiq 1992 Mîladî (Tîpg. Semîh GEZER, ber çapê)

2.2. Teqrîza Ebdurehîm Rehmî Hekarî/Zapsû ya Li Ser Melayê Cizîrî

Sala 1922an de Mehmed Şefîq Arwasî Dîwana Mela çap dîke û jê re pêşgotinek dinivîse. Di dawiya vê çapê de jî (r. 96) teqrîza menzûm a Ebdurehîm Rehmî he ye. Di kitêba Mesûd Serfiraz a bi navê *Kurd, Kitêb, Çapxaneyê* de behsa vê çapê tê kirin.³⁸ Teqrîz ji pênc malikan pêk tê û wiha ye:

1. Şîrazî li nav fursan kêşa elema 'îşqê
Mela te bire ewcan Hafîz bike pê meşqê
2. Lakin bi kirasek dî nûr û şefekek tê da
Dîbayekî kurmancî raçand di Cizîrê da
3. Mela te wekî Hafîz Firdewsî te kir ustad
Hem îşq ji nû hilkir kurmancî te kir îcad
4. Polê di zexel kurdî te bi yek nezerê zer kir
Mala ku feqîr mayî tijî durr û gewher kir
5. Kurmanc divê her dem fexrê bi te kin el-Heq
Lakin tu ku Mansûrî rutba te bû Ene'l-Heq

2.3. Teqrîza Hemzeyê Muksî ya Li Ser Mem û Zînê

Hemzeyê Muksî di destpêka çapa ewil ya Mem û Zînê ku di sala 1919an de hatibû çapkirin, de dîbaceyek li ser Mem û Zîn a Ehmedê Xanî nivîsiye. Muksî berawirdkirinekê li hemberî ziman û neteweyê din dîke û hebûna berhemekê fena Mem û Zînê û nivîskarekê wekî Ehmedê Xanî wekî gencine û serbilindiyekê dibîne.

³⁸ Mesûd Serfiraz, *Kurd, Kitêb, Çapxane*, Weşanên Peywend, Stenbol, 2015, r. 167-170.

Ev teqrîz pexşan e û qasî du rûpelan e ku destpêka çapa ewil a Mem û Zînê de cih girtiye.³⁹

2.4. Teqrîza Seyid Ebdurrehman ya Li Ser Dîwana Îrfan

Ewil jî hatibû diyarkirin ku di edebiyatê de teqrîz ji aliye teşeyî ve du cure ne; menzûm û nesir. Teqrîza Seyîd Ebdurrehman a ku li ser Dîwana Îrfan a Seyîd Qedrî Haşimî nivîsiye, pexşan e. Her çiqas nivîskar ev teqrîz ne bi kurmancî, bi ‘erebî nivîsibe jî mirov dikarê wê wekî teqrîzeke wêjeya kurdî bihesibîne. Ji ber ku hem nivîskarê wê kurd e, hem li ser dîwaneke kurdî hatiye nivîsîn û hem jî di dawiya nusxeke destxetî ya vê dîwanê de berbelavbûye. Sala nivîsandina vê teqrîzê jî balkêş e ku çar sal piştî mirina Xelîfe Yûsif e.

Seyid Ebdurrehman (Erzen) ê kurê Seyid Elî (yê Findikî) di sala 1969an de miftiyê navçeya Cizîrê bûyê û wê serdemê pêrgî nusxeke Dîwana Îrfan tê ku nivîskarê wê Seyid Qedrî Haşimî heşt sal ewil 1961an de wefat kiriye, dixwîne û berhemê gelekî dicibîne. Her wiha ev nusxe ji hêla Seyid Ebdurrehman ve tê îstinsaxkirin û wekî pesinnameyekî teqrîza navborî jî dinivîse û dixwe dawiya dîwanê.⁴⁰ Li gor wî xwediyê dîwanê ehle keşf û keramete ye û qalîteya dîwana wî îsbata cenabê wî ye. Li gor teqrîzê dîwan ji bona aşiqên îlahî hatiye honandin, mijarên wê jî nefsa mirovên xwedêhezkerî ast bi ast disenifîne. Dîsa hêjakirina Hz. Pêxember (s.x.l.), tesewuf û evîna mecazî-evîna îlahî jî xalên girîng in ku bi tesira Melayê Cizîrî, Seyîd Qedrî jî helbesta xwe de cih daye van mijaran.⁴¹

3. TEQRÎZA XELÎFE YÛSIF -Li Ser Berhemên Xwe-

3.1. Îrşad’ul Îbad a Kurmancî/Kitêba Kurmancî

Îrşadûl Ibad pirtûka herî navdar a Xelîfe ye ku teşeya wê pexşan e û 320 rûpelan pêk tê. Meriv dikare bêje ev tekst wekî Fiqha Zagona Olî ya Îslamê(Şafiî) ye.

³⁹ Ji bona nivîsarê bnr. Hemzeyê Muksî, “Edebiyat û Asarê Edebî”, Wêje û Rexne, Hejmar: 8, Sal:2016, Tîrmeh-Tebax-Îlon-Cotmeh-Mijdar-Kanûn, r.7-10; Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, Şîrove û Kurdiya Îro: Jan Dost, Weşanên Avesta, Stenbol 2010, r. 59-62.

⁴⁰ Nusxeke heman dîwanê di sala 2016an de ji aliye M. Nesim Doru ve hat amadekirin û çapkirin. Lê dawiya wê de amadekarê wê hewce nedîtiye ku cih bide teqrîza navborî. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Seyîd Qedrî Haşimî, *Dîwana ‘Irfan*, Edîsyon-Krîtîk-Amadekarî: M. Nesim Doru, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2016.

⁴¹ Haşimî, h.b. r. 13-24; Ekici, h.b. r. 134.

Tê de devî devî 2000 hezar mijarên olî hene. Ev berhem di sala 1960an de li Enqerê çap bûye.⁴² Li gor agahiyên ku Mele Ebdulahê neviyê Xelîfe daye, ev pirtûk ji aliye Taha Huseyn ve li bajarê Urmiyê bi zimanê Farisî jî hatiye weşandin. Navê pirtûkê jî daniye Mecmeul Mesail.

Xelîfe Yûsif pênaseya teqrîzê dixwe qadeke nû û li ser berhemên xwe teqrîzê dinivîse. Herî zêde jî behsa berhema xwe ya bi navê ‘Irşad’ul Îbadê dike. Di teqrîzê de 11 caran rasterast navê vê berhemê dibore, lê di seranserê teqrîzê de îşaretê berhema xwe dike û carna jî hin beş û babetên teqrîzê mînak dide. Di malika jêr de bi şîretî dibêje hewceye ku herdu berhemên wî wekî nivîstekî hergav bi misilmanan ve be û ji xwe veneqetînin:

Bi destê xwe bîne tu **‘Irşad’ul Îbadê** [û] Mecme’ul Mesail
Şev û roj ji xwe ra bike baz û bend [û] hemaîl

(I/2)

Navê ‘Irşad’ul Îbadê di vir de kurt hatiye nivîsandin û Xelîfe duayekê dike da ku xwedê xwendin û zanîna van berheman bike nesîbê herkesi;

Çi xweş kitab in **Îrşad** [û] Mecme’il Mesa’îl
Bi zanîna wan Xwedê bike we na’îl

(I/29)

Serdema ku Xelîfe ev berhem bi kurdî nivîsîbû ya rastî jî nimûneyên ji van berheman an tunebûn an jî kêmbûn. Ji ber ku hem kurmançî hatibûn nivîsandin hem jî bi zimanekî hêsa hatibûn amadekirin;

Tuħfet û Fera’îz û **Irşad`ul ‘Ibad** xweş kîtab in
Mişlê wan îro qeş li tu cihî peyda nabin

(III/8)

Wê serdemê nezaniyeke zêde hebûye di nava gel de, heta kesên ku xwedî’ilmî jî di nav nexweşiyê de cehaletê de bûn. Xelîfe di malikên jêrîn de navê sê berhemên xwe dide û wana ji bona elema qelban wekî derman û dewa dibine;

Tuħfet û Feraîz û **Irşad`ul ‘Ibad** xweş dewa ne
Ji bo elema qelbê cahila ‘eceb şîfa ne

(IV/1)

⁴² Xelîfe Yûsif, *Îrşad’ul Îbad* (Tîpên Erebi), Nur Matbaası, Ankara 1961; *Weşanên Nûbihar*, Stenbol 2015.

Ne **Irşad`ul`Ibad** e, ew belkî dewa ye

Ji bo meraza cehlê `eceb şîfa ye

(IV/62-63)

Xelîfe dîsa jî beriya her tiştî xwendin û zanina Qur`anê şîret dike piştî wê ji bona femkirin û zelalkirinê xwendina `Irşad`ul`Îbadê şîret dike;

Ewel bixwîne Qur`ana `ezîm ji ezber

Paşê li pey wî **Irşad`ul`Ibad** çend per

(IV/55)

Di van herdu malikên jêr de li gor Xelîfe heûn û bidestketina `Irşad`ul`Îbadê wekî îhsanekê dibîne. Dîsa ji bona kesên ta`etkar wekî ronahiyeke li pêşiya wan ji ber ku berhema fiqhê û ya şerî`etê ye.;

Digel wî kesê Xwedê kiriye îhsan e

Ku **Irşad`ul`Ibadê** bixwîne, qenc bizane

Irşad`ul`Ibad şer`a terîqa Miştefa ye

Ji bo ehlê ta`etê, her wek fener û çira ye

(VIII/1 û 6)

Piştî nivîsandin û belavbûna **Irşad`ul`Ibadê** kesên xêrnexwaz jî peyda dibin û Xelîfe îddia dike ku ji ber ku çerxa wan kesan a hîle û dalalet dixitime lewma ji vê berhemê de neyartiyê dikin:

Lew, ji bo **Irşad`ul`Ibadê** bûne neyar, dikin `edawet

Girtî ye li wan rêya hîle û dalalet

(VIII/1 û 6)

Gerçi piçûk in nav **Irşad** û Kifayet`ul`Ewam e

Ji teref Xwedê îhsan û in`amek tamam e

(IX/1)

Li gorî Xelîfe berhema wî ji bona hemû kesan e ku yên xwendî jî çavkaniyek e. Eger ew kes bixwazin melatî, serwerî û îmametiyeke meqbûl bikin, hewce ye **Irşad`ul`Ibadê** bixwînin û baş bizanibin:

Irşad`ul`Ibadê bixwînin hûn emanet

Belkî ji we ra ca`îz dibe, serwer û îmamet

(IX/1)

3.2. Mecmeû'ul Mesailîş-Şer'îye Bi Lîsanê Kurdiye

Wekî çend pirtûkên Xelîfe yê din, ev pexşan jî li ser Fiqha Îslamê ye. Bi piranî li ser perestiniyê hatiye nivîsîn û 750 rûpel e. Ji 46 babetên olî pêk tê. Di sala 2010an de ji aliye Weşanên Nûbiharê ve li Stenbolê hate çapkirin.

Bi destê xwe bîne tu 'Irşad'ul Îbadê [û] **Mecme'ûl Mesail**

Şev û roj ji xwe ra bike baz û bend [û] hemaîl

(I/2)

Çi xweş kitab in Îrşad [û] **Mecme'il Mesa'il**

Bi zanîna wan Xwedê bike we na'il

(I/29)

3.3. Kîfayet'ul 'Ewam

Ev berhem her çiqas me di nav berhemên Xelîfe de cih nedabê jî xebata destpêkî ya Irşad'ul Ibadê ye, ango beriya wê wekî rîsaleyekê hatiye amadekirin. Biçûkbûna ku Xelîfe di malika jêrîn de behs dike ji vê yekê ye:

Gerçi piçûk in nav Irşad û **Kîfayet'ul 'Ewam** e

Ji teref Xwedê îhsan û in'amek temam e

(IX/1)

3.4. Tuhfet'ul Amilîn

Ev berhema Xelîfe di derbarê Fiqha Îslamê de, sala 1913-1914an (1326 Koç) de li Şamê li Çapxaneyê Teraqiyê hatiye çapkirin. Nivîskar dema ku ev pirtûk nivîsiye temenê wî 29 bûye. Berhem ji 363 rûpelan pêk hatiye. Li gor agahiyên ku Şêx Mistefayê kurê Xelîfe dide, Remezhan el-Botî teshîha Tuhfet'ul Amilîn kiriye. Ev berhem di sala 1963an de dîsa li Enqereyê di Çapxaneyê Nûrê de hatiye çap kirin.

Tuhfet û Fera'îz û Irşad'ul 'Ibad xweş kîtab in

Mişlê wan îro qet li tu cihî peyda nabin

(III/8)

Tuhfet û Feraîz û Irşad'ul 'Ibad xweş dewa ne

Ji bo elema qelbê cahila 'eceb şîfa ne

(IV/1)

3.5. Feraîz

Feraîz bi pexşanî û zimanê kurdî/kurmancî hatiye nivîsandin. Xelîfe di vê berhemê de li ser dabeşkirina mîratê rawestiya ye û xuya ye vê xebatê tîrên mîratxuran kişandiye ser Xelîfe. Lewre bi vê pirtûkê Xelîfe şaşitiyên di der barê parvekirina mîratê de li gor ruknê Îslamê rave kiriye û bi tespîtên xwe ve kevirên bingehîn ku li ser hîmekî berjewendiyane hatine rast kirin, leqandiye û rê û rêbazên nû ava kiriye.

Ev pirtûk ji 56 rûpelan pêk tê û Xelîfe di sala 1961an de li Enqerê daye çap kirin. Lê çawa ku me li jor jî diyar kiribû, navê wî bi çar tîpên ‘erebî (y , w, s ,f) û bi hejmarî 156 li ser pirtûkê hatiye nivîsandin. 156 li gor hesabê ebcêde dibe Yûsif. Her wiha navekî din jî wek nivîskar li ser berhemê dixuyê û ev jî Ebdullah Ibnu Mewhmûd Neqşebendî ye. Lê em dizanin ku Xelîfe bi xwe ye.

Di herdu malikên li jêr de jî Xelîfe dîsa wekî berhemên wî yê din nîşanê Feraîza xwe dike, Feraîz ku berhema li ser mîrat û hiqûqa Îslamê ye û li gor serdema xwe xebateke awarte ye;

Tuĥfet û **Fera’îz** û Irşad`ul ‘Ibad xweş kîtab in
Mişlê wan îro qeţ li tu cihî peyda nabin

(III/8)

Tuĥfet û **Feraîz** û Irşad`ul ‘Ibad xweş dewa ne
Ji bo elema qelbê cahila ‘eceb şîfa ne

(IV/1)

BEŞA DUYEM

JİYANA XELÎFE YÛSIF Û BERHEMÊN WÎ

1. REWŞA POLÎTÎK A SERDEMA XELÎFE YÛSIF (1885-1965)

Xelîfe Yûsif di dawiya sedsala 19an de, di sala 1885an de ji dayîk bûye û di 9ê Sibata 1965an de çûye ber rehma xwedê. Ev 80 sal du serdeman di nav xwe de duhundirîne; ji vê 80 salî 38 sal dawiya împaratoriya Osmaniyan e ku di nav wê de êdî mîrnîşiyên kurdan nemabûn û 1865an de hatibûn xirabkirin, her wiha êdî dewleta Osmaniyan jî temenê xwe bi dawî anîbû û 42 salên din jî destpêka avakirina Komara Tirkiyeyê di hundirand û di van salan de ji bona kurdan gelek bûyerên dîrokî qewimîbûn: Wek Serhildana Şêx Seîd, Serhildana Agiriyê, Komkujiya Geliyê Zilanê, Serhildana Seyîr Riza û Komkujiya Dersimê û gelek qewimandinên din.⁴³

Ji ber ku mirov nikare nivîskar, helbestvan û hunermendekî bêyî ji serdema ku tê de jiyana xwe derbas kiriye, binirxîne divê em serdema helbestvanê me jî kêr zêde bizanibin. Çawa ku li jor jî me diyar kir, serdema ku temenê Xelîfe tê de derbas bûye ji komkujiyê bigirin heta surgûn, ji serhildanê bigirin heta şerên dijwar gelek bobelat hatine serê gelê kurd ku Peymana Lozanê (24ê Tîrmehê 1923) ev rewş diwartir û xirabtir kiriye.⁴⁴

Xaleke girîng jî ew e ku di serdema Xelîfe de rewşa perwerdehiyê ya gelê kurd gelek xirab e. Bi taybetî jî dema ku Xelîfe ji Cizîrê vedigere Bazîdê vê kêmasiyê baştir dibine.⁴⁵ Çawa ku tê zanîn Şoreşa Tîpan (1928)an de dest pê dike û wek gelek neteweyan gelê kurd jî ji vê yekê para xwe hildide.⁴⁶ Ji xwe kêmasiya gelê kurd di warê perwerdehiyê de gelek bû, piştî vê şoreşê û qedexekirina medreseyan kurd yekcar bê derfêr man. Xelîfe di serdemeke wiha de piraniya berhemên xwe û teqrîza xwe bi kurdî/kurmancî nivîsî û xwest gel bi zimanê xwe yê zikmakî ola xwe binase.

⁴³ Büşra Ersanlı& Günay Göksu Özgoğan& Nesrin Uçarlar, *Türkiye Siyasetinde Kürtler*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2012, r. 21-22.

⁴⁴ Mehmed Uzun, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, İthaki Yayınları, İstanbul, 2007, r. 72.

⁴⁵ *Hevdîtin Bi Neviyê Xelîfe Yûsif – Mela Ebdullah Tanrıverdi- re*, Bazîd, 3ê Îlonê 2016.

⁴⁶ Di derbarê Şoreşa Tîpan de ji bona agahiyên zêdetir bnr.: <http://www.dildernegi.org.tr/TR,609/harf-devrimi---1-kasim-1928.html>, Mêjûya Ragihandinê: 3ê Cotmeh 2016.

Ji ber van sedeman me hewce dît ku di rewşa sîyasî ya serdema Xelîfe bi kurtasî û di bin çend sernavan de li vir rave bikin. Bi vî awayî di vê beşê de me li gor kronolojiya bûyeran hin mijar vebijart û nirxand.

Rewşa Siyasî Di Şerê Cihanê yê Yekemîn de

Xaka Kurdistanê beriya Peymana Qesr-i Şîrîn heya piştî vê peymanê bi salan bibû meydana şer di navbera artêşên Osmanî û Safewîyan de.⁴⁷ Her tim dijmintiya navbera van her du dewletan kîna xwe û xwîna hev du li ser welatê kurdan û bi xwîna kurdan ve diherikandin. Her şerî de Kurdistan derbeke giran dixwar. Şerê Cihanê yê Yekemîn de jî dîsa ev rewş dubare kir. Vê carê jî Kurdistan di bin piyên leşkerên osmanî, rûs û îngilîz de pêpes dibe. Kurd hem wek leşker di nav refên leşkera osmanî de dimirin, hem jî kurdên sîvîl pêner dibûn, dihatin kuştin an jî dihatin surgûn kirin.⁴⁸

Ev şer bi taybetî li herêma Serhedê tesîreke mezin li ser gelê kurd hîşt. Li vir şer di navbera, bi piştgiriya milîsên ermenî dewleta rûs û bi piştgiriya milîsên kurd dewleta osmanî pêk dihat. Leşkerên rûs dewleta osmanî têk birin û di encama vî şerî de bajarên wek Erzirom, Wan, Agirî (wê serdemê Bazîd), Bedlîs û Mûş dikevîne bin destê Sovyetê û bi tevî malbata Xelîfe bi hezaran kurd mihacir dibin û ber bi başûr ve diçin.⁴⁹

Mihemed Emin Zekî Beg, rewşa piştî Şerê Cihanê yê Yekem ji bona kurdan wiha rawe dike: *Rewşenbîr û lawên kurd piştî Şerê Cihanê yê Yekem faalîyetên xwe zêdetir kirin*. Berî her tiştî piştî şer komeleyên kurdan ji nû ve hatin avakirin û bi vî rengî tevgera kurdî ji nû ve dest pê kir. Lê taybetmendiyêke komeleyên vê dewrê heye ku ew êdî bi siyasete re jî eleqedar in. Ji xwe ferqa herî mezin a vê dewrê ji ya beriya şerê cihanê ev e.⁵⁰

Ji ber ku Şerê Cihanê yê Yekem di jiyana Xelîfe de xwedî cihekî taybet e û Xelîfe di vî şerî de ber Sêrtê koç dike û ev koça ber bi başûrê di jiyana Xelîfe de qonaxêke nû

⁴⁷ Mesûd Serfiraz, *Kurd, Kitêb, Çapxane, Weşanên Peywend*, Stenbol, 2015, r. 56.

⁴⁸ Serfiraz, h. b. r. 56.

⁴⁹ Naci Kutlay, *21. Yüzyıla Giderken Kürtler*, Pêri Yayınları, İstanbul 2011.r.196.

⁵⁰ Mihemed Emin Zekî Beg, *Kürdistan Tarihi*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2011. r. 257.

ava dike, me di bin sernavekê taybet de mijar rave kir. Em ê niha li jêr li gor du serdeman rewşa siyasî ya wê heyamê bidin.

Rewşa Kurdan Di Salên Dawî yên Dewleta Osmanî de (1885-1923)

Salên dawî yên Împaratoriya Osmanî gelek bûyerên dîrokî di hundirê; bi fermana Abdulhemîdê Iiyem îlankirina Makezagona Bingehin û Meşrûtiyeta Yekem (1876-1878) şerê di navbera Dewleta Osmanî û Rûsan (1877-1878/Herba 93yan), Serhildana Şêx Ubeydullah Nehrî (Şemzînan-1880), Şoreşa 1908an (Meşrûtiyeta Iiyem), Şerê Cîhanê yê Yekemîn (1914-1918), Şerê Rizgariyê yê Tirkan (1919-1923) û hwd.⁵¹

Piştî Şoreşa Frasnayê ya 1789an bîrdozî û ramanekî nû di nav dewletên pirnetew de dest pê kir: Netewperwerî. Û di nav çend salan de karîgeriya wê gihaşte gelek deverên cîhanê. Bi rastî ramanê netewperweriyê ya gelê kurd sed sal zêdetir beriya şoreşa 1789an, di dawiya salên 1600î de bi Mem û Zin a Ehmedê Xanî dest pê kiribû.⁵² Lewma hewceye em bibêjin tesîrgirtina kurdan a ramanê netewperweriyê di serdema modern de ji salên 1800î de bi taybetî jî çaryeka sedsala 19an de dest pê kiriye. Ewil em di serhildana Mirê Botan ya Bedixan Beg de vê bandorê dibinin. Piştî têkçûna wê serhildanê êdi zîldana fikra netewî di nav kurdan de berdewam dike. Ji ber ku qada jiyana helbestvanê me bakûrê kurdistanê ye, em dê demajoya perçeyên mayîn li vir nenirxînin.⁵³

Di sala 1881an de Siltan Abdulhemîdê Iiyem bi navê *Alayên Hemîdiyan* yekîneyên sîwarî dide ava kirine ku em dizanan armanca van yekîneyan kontrolkirina kurdan û kêmkirina tehdîda ermenîyan e. Xuya ye ku bi vê tivdîrê ramanên netewî ne ku demeke di nav kurdan de belav dibû. Her wiha Abdulhemîdê Iiyem ku 33 salan(31 Tebax 1876-27 Avrêl 1909) li Dewleta Osmanî desthilatdarî kiribû, li Stenbolê di sala 1892yan de dibistanên eşîran jî hatibûn ava kirin.⁵⁴ Di avakirina van dibistanan de jî dîsa armanca dewletê ew bû ku tebaaya xwe ya pirnetew –bi taybetî jî Kurd- di bin banê împaratoriye de kontrol bike. Di van dibistanan de zarokên arîstokrat ên 12-16 salî ku ji herêmên wek

⁵¹ Dawîd McDowal, *Modern Kürt Tarihi*, Doruk Yayıncılık, Ankara, 2004. r. 83.

⁵² Kadri Yıldırım, *Êhmedê Xanî'nin Fikir Dünyası*, AKYAD, Ağrı, 2008, r.49.

⁵³ Naci Kutlay, 21. Yüzyıla Girerken Kürtler, Pêri Yayınları, İstanbul 2011.r.205.

⁵⁴ Kemal Süphandağ, *Hamidiye Alayları Ağrı Kürt Direnişi ve Zilan Katliamı*, Perî Yayınları, İstanbul 2012, r. 122.

Amed, Bexda, Misûl, Şam, Basra, Trablûsgarp û gelek deverên din hatibûn, tê de perwerdehî didîtin. Ji malbatên navdar ên wek Cemîlpaşazade û Bedirxanî jî gelek zarok di vir de dixwendin. Heman salan de di nav tirkên de jî fikra netewperiyê belav dibû û her ku diçû ‘xurtir’ dibû ku di nav wan de nifşek bi navê *Jön Türk* derket û ew kesên tirk bi xortên kurd ve di heman dibistanan de perwerdehî didîtin. Çawa ku tê zanîn navbera her du aliyan xweş nebû û vê dijberiyê *Jön Kürt* jî derxistin holê. Dibistanên eşîran 14 salan perwerdehiya xwe domandin û piştî serhildanekê di 1906an de hatin girtin.

Bi destê komek rewşenbîrên kurd ku di van dibistanan de xwendibûn heta şerê cîhanê yê yekem komeleyên cur bi cur hatin ava kirin, hin berhemên kurdî hatin çap kirin, di nav wan komeleyan de çalakiyên siyasî hatin li darxistin û hwd gelek xebatên çandî, siyasî û wêjeyî hatin pêk anîn. Ango heta avakirina komara tirkîyeyê tevgera kurdî gihîşte astekî.⁵⁵

Rewşa Siyasî Ji Avakirina Komara Tirkîyeyê Heta Mirina Xelîfe Yûsif (1923-1965)

Piştî peymanê Lozanê rewş ji bona kurdan diwartir bû ku êdî destebirakê wan ên tirk gihîştibûn meqsed û mirazê xwe û komara xwe ava kiribûn. Di demajoya avakirina komarê û şerê ‘rizgariyê’ de her çiqas şer li ser xala hevpar ya her du netewan (ango ol/ola Îslamê) hatibe kirin jî hem di destnîşankirina Peymana Lozanê de hem jî piştî ava kirina komarê de ev xal ji rojevê hat rakirin. Di demeke kurt de diyar bû ku mebesta rejîma nû ew e ku bingeha komarê li ser neteweya homojen ya tirk ku sunnî û heta heneffî ye, hatiye dîzayn kirin. Û di vê pernameyê de cihê kurdan tune ye.⁵⁶

Ku hat dîtin ku nîyeta rêvebirîya komara tirkîyeyê tune ye ku soz û sonda xwe bi cih bîne û mafê kurdan bide û ji bo kurdistanê rêvebirîyeke serbixwe ava bike, gelê kurd nerazîbûna xwe nîşan kirin. Beriya komarê li Stenbolê gelek sazî û komele hatibûn ava kirin. Hîzbê Azadiya Kurdistanê (Azadî) jî yek ji wan rêxistinên bû. Kesên wek, Xalit Begê Cibîrî, Yûsif Ziya Beg, Qasim Ataç, Kor Huseyn Paşa, Hecî Mûsayê Modanî, Fewzî Beg, wek rêberên nehênî Şêx Seîd û Seyîd Ebdulqadir jî wek rêvebir û pêşeng di nav

⁵⁵ Büşra Ersanlı & Günay Göksu Özgoğan & Nesrin Uçarlar, *Türkiye Siyasetinde Kürtler*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2012, r. 45.

⁵⁶ Mehmed Uzun, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, İthaki Yayınları, İstanbul, 2007, r. 54.

rêvebirên Azadiyê de cih girtine. Mebesta Azadiyê ji aliye Xalit Beg ve wiha hatiye diyar kirin: “Damezirandina Kurdistanê Azad”.⁵⁷

Azadiyê dixwest serhildanê di meha gulanê ya sala 1925an de bide dest pê kirine. Lê di tebaxa 1924an de li Hekariyê Nastûriyan serî hildane û hinek rêvebirên Azadiyê bi şaşitî beşdarî vê serhildanê bûne û hêzên tirk ev serhildan şikestandine û kesên wek Xalit Beg, Yûsif Ziya Beg û Hecî Mûsayê Modanî hatine girtin, di sala 1925an de jî Xalit Beg û Yûsif Ziya Beg hatine îdam kirin.⁵⁸

Şêx Seîd dema ku êdî dibine ku rewş xirab e û êdî dora wî ye, dest bi xebata xwe dike ku di bihara 1925an de serî hilde. Lê rewşa ewil dubare dike û di sibatê de bi bûyereke din mecbur dimîne ku banga serhildanê bike. Ji ber ku her du serhildanan de jî bernameya serhildanan xirab bibû, wek ya ewil ev jî têk çû û Şêx Seîd û 47 hevalên wî li Amedê 29ê pûşbera sala 1925an de hatin dar ve kirin.⁵⁹

Piştî Serhildana Şêx Seîd êdî ji bona kurdan rewş her ku çû diwartir dibû. Vê yekê jî di nav kurdan de çirûskên nû yên serhildana didan dest pê kirin. Bi rêvebiriya Rêxistina Xoybûnê ku li libnanê bi beşdariya kesên wek Memdûh Selîm Beg, Şukru Sekban, Ihsan Nûrî, Haco Axa, Şerif Paşa, Şêx Elî Rizayê kurê Şêx Seîd û Celadet û Kamiran Bedirxan di encama kongreyekî de bi armanca ‘rizgariya kurdistanê’ hatibû ava kirin, hîmê serhildaneke nû hatibû avêtin.⁶⁰ Serhildan di 1926an de dest pê kir û di 1930an de digel komkujiyeke mezin/komkujiya zîlanê vemirî. Di vî şerî de li gor hin çavkaniyan di navbera 1926 û 1930î de, 15 hezarî heta 50 hezarî kes hatin kuştin.⁶¹

Rejîma kemalîzmê di Serhildana Dersimê de jî rêgeza xwe ya bişaftin û komkujiyê neterikand. Serhildana ku bi pêşengiya Seyîd Riza di sala 1937an de dest pê

⁵⁷ McDowal, h. b. r. 167.

⁵⁸ McDowal, h. b. r. 194.

⁵⁹ McDowal, h. b. r. 267.

⁶⁰ Kemal Süphandağ, Hamidiye Alayları Ağrı Kürt Direnişi ve Zilan Katliamı, Perî Yayınları, İstanbul 2012, r. 297.

⁶¹ Necip Fazıl Kısakürek, *Son Devrin Din Mazlumları*, Büyük Doğu Yayınları, 30. Baskı, İstanbul 2012. r. 167.

kiribû heta 1938an kişand. Di pêvajoja vî şerî de 13 hezara zêdetir kes hate kuştin, dîsa 13 hezara zêdetir kes jî hatin sirgûn kirin.⁶²

Xelîfe Yûsif di nava şert û mercên ku me li jor dîmenek jê daye de jiyana xwe derbas kiriye. Xelîfe wek berhemên xwe yê din Teqrîza xwe jî digel van rewşên awarte û qedexeyên giran de, nivîsiye û li serbajarê komara tirkîyeyê daye çapkirin.

2. JIYANA XELÎFE YÛSIF

Xelîfe di navbera salên 1885an û 1965n de jiyaye.⁶³ Ev serdem dawîya dewleta osmanî û çil sal zêdetir jî destpêka komara tirkîyê ye. Xuya ye ku Xelîfe ‘alim û helbestvanekî serdema modern e, lê wekî gelek helbestvanên hevçaxa xwe, bi helwesta klasîkekî berhemên xwe afirandiye û xwedî hunereke berbiçave jî. Di van salên dawiyê de hin gengeşiyên de derbas dibe ku, divê wêjeya kurdî ya klasîk wekî du serdeman bê pejîrandîn; di serdema klasîk de wêjeya kurdî ya klasîk, di serdema modern de wêjeya kurdî ya klasîk.⁶⁴ Ku wiha dabeş bibe helbestvanên wekî Heyderî, Xelîfe, Hezîn û yêd mayîn dikevin beşa dudan.

Digel van taybetiyên Xelîfe ku me li jor behsê kir, ew zêde nehatiye naskirin, an jî tenê di nav çanda medreseyan de hatiye bihîstin. Lê ev bihîstin jî ji kesayetiya wî ya edebî wêdetir, bi berhema wî ya bi navê *‘Irşad’ul İbadê* ve ye ku, ev pirtûk di warê fiqha şafîî de wekî otorite tê pejîrandin. Ango helbestvanê me bi helbestên xwe hê jî baş nehatiye naskirin. Di van salên dawiyê de ‘ilm û hunera wî bala raya giştî kişandiye ser xwe. Di kêmnaskirina Xelîfe de xala here girîng jî ew e ku wî tu car jiyana xwe li ser berhemên xwe ava nekiriye. Ango derde wî populîzm nebûye tu car, her tim li ser rîya heq meşiyaye û xwestiye ku gel jî meseleyên olî têbigihêje.⁶⁵

⁶² Süphandağ, h.b. 2012, r. 358.

⁶³ Naci Kutlay, h. g. r. 24.

⁶⁴ Önder Beyter, *Dîwana Mela Ehmedê Heyderî (Metn û Lêkolîn)*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn, 2013. r. 11.

⁶⁵ *Hevdîtin Bi Nevîyê Xelîfe Yûsif – Mela Ebdullah Tanrıverdi- re*, Bazîd, 3ê Îlonê 2016.

Divê em li vir mijareke din jî zelal bikin ku, Xelîfe hê jî li kurdistanê neketiye nava lîteratûra kurdî ya akademîk. Lê derveyî akademiye gelek xebat hene ku derbarê helbestvanê me de agahiyên girîng didin.

2.1. Nav û Mexlesa wî

Helbestvanê me bi çend nav û mexlesan tê naskirin û mirov li ser berhemên wî pêrgî çend navên wî yên cuda tê; Xelîfe Yûsif, Yusuf Topçî, Yusuf Topçuoğlu, Yusuf Tanrıverdi, Şêx Yusuf, Ebdullah Ibnu Mehmûd Neqşebendî, Ebdullah Bîn Mahmûd Bayezîdî en-Neqşebendî.

Di Teqrîzê de jî tene di cihekî de navê wî derbas dibe;

Nebêje **Yûsûf** xwedan ‘eyb [û] natemîz e

Qewlê wî ne meqbûl û ‘ezîz e

(I/5)

Navê wî yê fermî Yusuf Tanrıverdi ye.⁶⁶ Lê di nava gel de zêdetir wekî Xelîfe Yûsif tê naskirin. Pêşnava ‘Xelîfe’ jî, ji ber ku hem ji terîqeta Qadiriye⁶⁷ îcazet wergirtiye, hem jî ji aliye terîqeta Neqşîbendiyan sê caran îcazet gencamirtiye⁶⁸, jê re tê gotin û bi nasnavê Xelîfe Yûsif di raya giştî de bi nav û deng bûye. Lê ji ber sedemên pergali yên komara tirkîye, wextê berhemên xwe çap kiriye navê xwe kamûfle kiriye û bi navê Ebdullah Ibnu Mehmûd Neqşebendî⁶⁹ an jî Ebdullah Bîn Mahmûd Bayezîdî en-Neqşebendî, pirtûkên xwe daye weşandin.⁷⁰

⁶⁶ Piştî zagona paşnavan ya ku di sala 1934an de derdikeve Xelîfe dixwaze paşnava xwe bike Allahverdi (Ango Xwedêda). Lê ji ber ku wê serdemê bi kutekî dewsa têgeha “Allah” “Tanrı” dihat bi kar anîn, Xelîfe mecbûr maye ku “Tanrıverdi” bi kar bîne. *Hevdîtin Bi Neviyê Xelîfe Yûsif –Mela Ebdullah Tanrıverdi- re*, Bazîd, 3ê Îlonê 2016.

⁶⁷ Cara ewil Seyda Şêx Ahmed Şerefeddîn el-Qadîrî îcazeta terîqeta Qadîrî daye Xelîfe Yûsif.

⁶⁸ a- Cara duyem Şêx Mihemed Nuri Derşewî îcazeta terîqeta Neqşîbendî daye Xelîfe Yûsif.

b- Cara sêyem Şêx Îbrahîm Heqî îcazeta terîqeta Neqşîbendî daye Xelîfe Yûsif.

c- Cara çaran Şêx Mihemed Seîd El-Cizîrî îcazeta terîqeta Neqşîbendî cara duduyan daye Xelîfe Yûsif.

⁶⁹ X.Y. ev nav tenê di pirtûka xwe a bi navê *Tuhfet’ul Amilîn* ku, li Şamê di Çapxaneyê Dimeşqê de daye çapkirin de, bi kar aniye.

⁷⁰ ‘Ebdullah navê kalikê Xelîfe Yûsif e. *Hevdîtin Bi Neviyê Xelîfe Yûsif –Mela Ebdullah Tanrıverdi- re*, Bazîd, 3ê Îlonê 2016.

Yusuf Topçuoğlu, bergê pêşîn ê Teqrîza wî de hatiye nivîsandin. Lê divê bê diyarkirin ku carna di hin belgeyan de ev paşnav wekî Topçu yan jî Topçuzade jî hatiye nivîsandin. Paşnava Topçuoğlu, Topçu, Topçuzade xuya ye ku ji peywira bavê Xelîfe, Şerîf Paşa darijiye. Lewra Şerîf Paşa di Qesra Îshaq Paşa de serleşkerê topê bûye.⁷¹

Ebdullah Ibnu Mehmûd Neqşebendî û Ebdullah Bîn Mahmûd Bayezîdî en-Neqşebendî jî dîsa em dizanin navê helbestvanê me ne.⁷² Lê divê em vê mijarê nevêjin baş guhên xwe. Lewre ew serdema ku Xelîfe tê de dijiya xebardan, nivîsîn, xwendin, çap kirin û hemû çalakiyên kurdî qedexa bûn. Heta ew kesên ku berhemeke kurdî an teksteke kurdî li ser bê girtin, herî kêma gef dixwar, dihat ceza kirin û derbarê wî de lêpîrsîn vedibû. De îcar bila halê nivîskarên kurd hûn binirxînin. Ev sedemên neyînî riya navên mustear dida pêşiya kurdînan. Xelîfe jî yek ji wan kesan bû. Me ewil jî diyar kiribû, ji destpêka avakirina komara tirkîyê heta 1965an tenê du berhemên kurdî hatibûn çap kirin, ew jî bi tîpên ‘erebî’.⁷³ Ew 42 sal ji bona zimanekî gelek dirêj e û mirov dikare vê serdemê li bakûrê kurdîstanê wekî serdema fetretê’ bi nav bike.⁷⁴

Yûsif (156) di gelek berhemên Xelîfe de hatiye bi kar anîn. Lê wekî şifreyekî hatiye nivîsin. Bi hesabê ebcêde hejmara 156an, navê Yûsif di hundirîne.⁷⁵ Ev şifre jî dîsa ji ber pîrsgirekên fermî hatiye nivîsandin.

2.2. Serdema Bazîdê

2.2.1. Salbûn û Cihê Jidayîkbûna wî

Xelîfe Yûsif, di sala 1885an de li gundê Zengezûrê ji dayîk bûye. Zengezûr di wê serdemê de gundekî girêdayî Bazîdê bûye. Piştî avakirina komara tirkîyeyê, dema

⁷¹ Zeynelabîdîn Zinar, “Piştî Ehmedê Xanî Xelîfe Êsiv”, *Salnama Ehmedê Xanî ya 2012an*, Amd. Mehmet & Nihat & Bahar Gültekîn, Belge Yayınları, İstanbul, 2013, r. 107-108.

⁷² Zinar, g. n. r. 110.

⁷³ M. Malmisanij, *Türkiye ve Suriye’de Kürtçe Kitap Yayıncılığının Dünü Bugünü*, Weşanên Vate, Stenbol, 2010, r. 167.

⁷⁴ M. Malmisanij di xebata xwe de navê van her du berhemên nenivîsiye. Bi ya me îhtîmaleke mezin e ku herdu jî yên X.Y. bin. Lê di navbera van salan de (1923-1965) çar berhemên X.Y. li Enqerê di çapxaneyê Nûrê de tên çap kirin. Ji van çar berhemên Îrşad’ul Îbad, Feraîz û Teqrîz bi zimanê Kurdî, Xutbe jî bi zimanê ‘erebî’ hatiye çap kirin. Ango di navbera salên 1923-1965 an de sê berhemên kurdî hatine çap kirin û xuya ye ku hersê jî yên X.Y’ in.

⁷⁵ Bi hesabandina hesabê ebcêde navê Xelîfe angê ‘Yûsif’ derdikeve. (h.a.).

guhertina navên cihan de Zengezûrê jî para xwe girt û wek *Sarıdana* hate binavkirin. Di van salên dawiyê de bûye wek taxeke Bazîdê û wekî taxa *Sarıgül* tê bi nav kirin. Ev gund li ser pêşa Qesra Îshak Paşa ye û her wiha gelek nêzîkî gorna Ehmedê Xanî ye.

2.2.2. Malbata wî

Agahiyên di derbarê malaba Xelîfe de kêma in û di çavkaniyên ku me jê sût wergirtiye de tîn dubarekirin. Lê me xwe sparte gotinên neviyên wî, Mela Ebdullah û Sebîh Tanriverdî. Li gor van zanîna navê bavê Xelîfe, Şerîf Axa ye ku di Qesra Îshak Paşa de wek topkar dixebitî. Ji ber vê yekê malbata Xelîfe wek Topçûzade tîn naskirin. Ango ew ji malbateke arîstokrat tê. Ev taybetmendî hê jî li Bazîdê û herêmê berbiçav e û malbat di nava gel de xwedî hurmeteke mezin e.

2.2.3. Eşîra Wî

Xelîfe ji eşîra Pinaşî/Pinhaşî ye.⁷⁶ Ev eşîr di bin banê konfederasyona Heyderî de cih digire ku sînoren vê konfederasyonê wiha hatiye diyar kirin: Ji bakûrê Behra Wanê hetta Rêze Çiyayên Eledaxê û li dora Çiyayê Tendûrekê Heyderî rûdinin.⁷⁷

2.2.4. Perwerde û Pişeya wî

Xelîfe Yûsif jî wekî hemdemên xwe û wek pêşiyên xwe perwerdehiya xwe ya ewil li ber destê melayê gund, Mela Ehmed dîtiye. Lê divê bê gotin beriya vê xwendinê Xelîfe Qur'an di temenê biçûk de xwendibû.⁷⁸ Piştî wê li cem Şêx Mihemed Celalî, di medreseya wî de perwerdehiya zanistên wek serf, nehîv dît û gelek zanistên medreseyê yên din li wir xwend.⁷⁹ Dema ku xwendinên xwe qedand ji Şêx Mihemed Celalî destûr stand.⁸⁰ Çawa ku tê zanîn Bedîuzeman Seîdê Kurdî jî li cem Şêx Mihemed Celalî perwerdehî dîtibû.⁸¹ Şêx Mihemed Celalî di medreseya xwe de ekola Xanî dişopand û em

⁷⁶ *Hevdîtin Bi Neviyê Xelîfe Yûsif –Hecî Sebîh Tanriverdi-* re, Bazîd, 20ê Gulanê 2017.

⁷⁷ Beyter, h. b. r. 20.

⁷⁸ Feqî Huseyn Sağniç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002, r. 485.

⁷⁹ Naci Kutlay, *21. Yüzyıla Giderken Kürtler*, Pêri Yayınları, İstanbul 2011, r. 448.

⁸⁰ Sağniç, h. b. r. 486.

⁸¹ Şêx Mihemed Celalî, ‘alim û seydayê gewre ku di navbera salên 1851-1914 de jiyaye. Seydatiya kesên wek Bediuzaman Seîdê Kurdî, Xelîfe Yûsif û hwd kiriye. Bediuzeman qasa sê mehan li cem wî perwerdehî dîtiye. Rojekî Bediuzeman ji seydayê xwe Celalî re wiha dibêje ...”*Xezîneyên di bin destê*

dibînîn ku karigeriya Xanî li ser Xelîfe jî gelek zêde ye. kurdî/kurmancînûsiya Xelîfe û helwesta wî ya kurdewarî bingeh û hîmê xwe ji Ehmedê Xanî girtiye.

2.2.5. Îcaze û Destûrnameyên Wî

Xelîfe Yûsif carekê ji terîqeta Qedîrî û çar caran jî ji terîqeta Neşîbendî îcazet girtiye. Seyda Şêx Ahmed Şerefeddîn el-Qadîrî îcazeta terîqeta Qadîrî, cara duyem Şêx Mihemed Nurî Derşewî îcazeta terîqeta Neqşîbendî, cara sêyem Şêx Îbrahîm Heqî îcazeta terîqeta Neqşîbendî, cara çaran Şêx Mihemed Seîd El-Cizîrî îcazeta terîqeta Neqşîbendî cara duduyan daye Xelîfe Yûsif.

2.3. Serdema Sêrtê

Çawa ku di jiyana Xelîfe ya rojane de serdema Sêrtê cihekî zêrîn girtiye, her wiha di jiyana wî ya perwerdehiyê de jî Sêrt xwedî nirxekî mezin e. Pîştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn, wekî gelek serhediyên malbata Xelîfe jî koçî başûrê kurdistana bakûr kiriye. Xelîfe li Sêrtê di medreseya Mela Xelîlê Sêrtî de li cem kurê wî Mele Hamîd xwendina xwe didomîne. Mele Hamîd jî wek bavê xwe ‘alim û seydakî şareza bû û ev jî ji bo Xelîfe sûdeke mezin bû. Lewra Mele Hamîd bi xwe dersen wî dida. Di vê serdemê de hinek berhemên ku ewil jî xwendibû dubare dike. Gelek dem neborîn Xelîfe xwendin û dersen xwe qedand û bi mîhrîcaneke mezin xwendina xwe qedand.⁸²

2.4. Serdema Cizîrê

Di medreseyan de wek rîtulekê bû, kesên ku xwendina xwe diqedandin û dibûn seyda, dest bi melatîyê dikirin. Xelîfe li gundê Hedilê dest bi melatîyê dike. Ev gund girêdayî navçeya Cizîrê ye. Xelîfe li Hedilê qasî deh salan melatîyê dike û peywira xwe baş bi cih tîne. Ango gundî gelek pê xweş in. Di vê serdemê de pêşiyê Şêx Mihemed Nurî

we de her wekî di sindoqekî de dadayîne. Mifteya sindoqê jî di destê we de ye. Ez ji we hin nîşaneyên di derbarê wan xezîneyan de dixwazim. Lewra ji wan kîjan kêrî min bê, ez dê ew ê bijêrim.” Ji bo agahiyên berfireh bnr. Şerif Mardin, *Bediüzaman Said Nursi Olayı*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2008, r. 115.

⁸² Sağniç, h. b. r. 486.

Ed-Derşewî,⁸³ paşê jî Şêx Mihemed Seîd Seydayê Cizîrî dinase û li cem wan emel dike. Gelekî di bin bandora Şêx Mihemed Nurî Ed-Derşewî de dimîne. Heta li ser wî helbestekî jî dinivîse.⁸⁴

Xelîfe ji xwe ew ne dûrê ‘ilmê bû. Lê di medreseyan de ‘ilmê tesewûfê nedihate xwendin. Ger kesekî ku bixwesta bi xîreta xwe li ser raweste, ew di vê ‘ilmî de kûr diçû. Xelîfe jî yek ji wan kesan bû û Seydayê Cizîrî jî ‘ilmê tesewûfê fêrî Xelîfe kir. Xelîfe jî di demek kurt de xwendina xwe qedand û 1923an de, di 36 saliya xwe de, destûr girt.⁸⁵ Bi vî awayî bû Xelîfeyê Şêx Mihemed Seîd Seydayê Cizîrî.

2.5. Xelîfe û Bedûzeman Seîdê Kurdî

Her çiqas em di Teqrîzê û berhemên Xelîfe yên din de rastî navê Bedûzeman Seîdê Kurdî û berhemên wî Rîsale-î Nûr nehatibin jî bi gotinên kurê Xelîfe, Şêx Mistefa em dibinin ku karigeriya Bedûzeman li ser Xelîfe çê bûye û haya wî ji Bedûzeman, Rîsaleyan û tevgera Nûrê heye. Lewma wextekî ji kurê xwe re behsa xewneke xwe dike û wiha jî kurê xwe re şîret dike:

...Şêx behsa hezretî Bedûzeman jî dikir. Digot, carekî min di xewê de devê xwe xistiye kêleka qelbê Bedûzeman taleba ‘ilmê jê kiriye, Xwedê teala bereketa ‘ilmê daye wî. Wexta Bedûzeman dihate bîra min girî dihate min.

Rojekê Şêx ji min re got, kurê min ku vê carê tu çûyî here ba Bedûzeman ziyaret bike. Ez hatim Enqerê, li wir cihê Nurciyan hebû. Ji wê dere ewana mektûbek didu dane min, em çûne Eskîşehîrê, ji wê dere em çûne Emîrdağê, li dikanekê sekinin. Devê rê de li hemberê derî Bedûzeman reqlama şepqeyê danîbûn. Paşê Mustefa Sûngûr hat got, hezretî Bedûzeman hatiye, ez çûm cem. Şêx ji min re gotibû, wexta tu çûyî cem xebernde, lê guhê xwe bidiyê ka çi dibêje. Min ziyaret kir. Bedûzeman ji min pirsî, got: ‘Kesekî Şêx Muhamedê Celalî heye yan na?’

⁸³ Şêx Mihemed Nuryê Derşewî tenê îcazet daye du kesan yek Şêx Mihemed Nurî el-Cizîrî yê din jî Xelîfe Yûsif e. *Hevdîtî Bi Neviyê Xelîfe Yûsif –Mela Ebdullah Tanrıverdi- re*, Bazîd, 3ê Îlonê 2016.

⁸⁴ Ji bona vê helbestê bnr. *Çend Qesîdeyên Şêx Ahmedê Xanî û Şêx Xelîfe Yusif Beyazidî*, Amd. M. Sabih Tanrıverdi, Artus Basım, İstanbul 2011. r.

⁸⁵ Sağniç, h. b. r. 486.

*Min got, du kurên wî hebûn yekî wefat kiriye, yek heye. Got: 'Mebûsê Partiya Xelqê Ahmed Alpaslan heye, yan na?' Min got heye. Min hêviya dua jê kir. Got: 'Ez ji we tevan re dua dikim. Hemêza xwe vekir, min ziyaret kir û ez derketim.'*⁸⁶

Xelîfe û Bedûzeman hevdu rû bi rû jî dîtine û Xelîfe gelekî ji Bedûzeman hez dike û rêz û hurmeteke mezin nîşanê Bedûzeman dide. Di der barê mucedîdbûna Bedûzeman de gelek çavkanî hene, Xelîfe jî wek wan çavkaniyan difikire:

*...Şêx Seyda rehîmullah ji Şêx re: Talibê niha dibêjin, Bedûzeman mehdî ye. Şêx keniya got, wellehî ez nabêjim mehdî ye. Feqet ez dikarim bibêjim mucedîd e.*⁸⁷

Wextê ku Bedûzeman li Bazîdê qasî çend mehan ber destê Şêx Mihemed Celalî dixwîne, rojekî dibe mêvanê Şerîf Axayê (Feqî Şerîf) bavê Xelîfe. Bedûzeman dixwaze biçe Wanê. Şerîf Axa hespê xwe dide Bedûzeman da ku heta Gîhadînê pê here. Bedûzeman dixwaze wek berdêla hespê mecîdiyekî dide Xelîfe lê ew qebûl nake. Bi vî awayî em dibinin ku têkilî di navbera wan de çêbûye.

Xelîfe jî wek Bedûzeman di medreseyan kurdistanê de perwerdehî dîtîye û zimanê 'erebî baş dizane. Lewma di malikên jêr de Xelîfe îşaretê biwêjeke 'erebî dike û ev biwêj ji aliyê Bedûzeman ve jî gelek caran hatiye bi kar anîn:

Ji bo mu'anîda fa'îde ew e, negotin

Li sûka mirîşka deve na'ê firotin

(II/22)

Bedûzeman jî gelek caran ji bo kesên bêfem/femkor biwêja "Cewab 'ul ahmak essukut" bi kar tîne.⁸⁸

⁸⁶ Süleyman Çevik, "Bi Kurê Xelîfe Yûsif Şêx Mistefa re Hevpeyvîn", Nûbihar, c. 8, j. 89, 2003, r. 14.

⁸⁷ Çevik, g. n. r. 15.

⁸⁸ Bedûzeman Said Nursî, *Şualar*, Zehra Yayıncılık, İstanbul, 2011, r. 553; *Mektubat*, r. 502 û 620.

2.6. Wefata wî

Xelîfe Yûsif, di 9ê Sibata sala 1965an roja sêşemê demjimêra 2yê şeve de, di 80 saliya xwe de, li gundê Çalîxanê Tacdo (niha *Seslitaş*)⁸⁹ ku girêdayiyê Bazîdê ye, çûye ber dilovaniya Xwedê. Niha tirba wî û mizgefteke bi navê wî li wir hatiye çêkirin.⁹⁰

3. BERHEMÊN XELÎFE YÛSIF

Bi tevahî dozdeh berhemên Xelîfe hene û ev berhem piranî li ser zanistên dînî hatine amadekirin. Berhemên wî ev in; Teqrîz, Usûla Meratîba Hîsabê, Îrşad'ul Îbad a Kurmancî, Mecme'ul Mesaîl, Tuhfet'us Sibyan, Tuhfet-uz Zakirîn, Feraîz, Tecwîd, Eqîdet'ul Îman, Xutbe, Tuhfet'ul Amilîn û Tuhfet'ul Îxwan.

Lê hewce ye li vir mijarek bê nîqaş kirin ku cara ewil Abdurrahman Durre di xebata xwe ya bi navê 'Şerha Dîwana Ehmedê Xanî' de wexta ku navê berhemên Ehmedê Xanî dide nasîn dibêje ku berhemeke Ehmedê Xanî bi navê 'Tuhfet'ul Ewam' heye û Xelîfe Yûsif ev berhem li ser navê xwe û bi navê 'Tuhfet'ul Amilîn' daye çapkirin.⁹¹ Lê Durre di vê îddîaya xwe de tenê xwe dispêre '*bihîstinekî*' û çavkaniyekî diyar nake.

Prof. Dr. Kadrî Yıldırım jî di amadekariya du berhemên Ehmedê Xanî de-*Eqîdeya Îmanê û Nûbihara Biçûkan*- vê agahiyê di binbeşa 'Xanî'ye Ait Oldukları Tartışmalı Olan Eserler (Berhemên Xanî yên Neteqez/Bişik)' de vê îddîaya Abdurrahman Durre neqil dike û mijarê bêşîrove dihêle.⁹²

Her wiha Süleyman Çevik di hevpeyvîna digel Şêx Mistefa de îddîaya Abdurrahman Durre ji Şêx Mistefa dipirse û ew jî wiha bersivê dide:

⁸⁹ Ev gund ewil wek Çalîxanê Tacdo hatiye binavkirin, lê piştî hatina X. Y. êdî heta roja îroyîn wekî Çalîxanê Xelîfe tê binavkirin û zanîn.

⁹⁰ Nacî Kutlay, *21. Yüzyıla Girerken Kürtler*, Peri Yayınları, İstanbul, 2011, r. 247.

⁹¹ Di têbiniya vê îddîayê de jî heman mijar li Şêx Mihemedê kurê Xelîfe tê pirsirin û ew jî vê yekê napejirîne û dibêje ku ew berhem a Xelîfe Yûsif e. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Abdurrahman Durre, *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî-Felsefe û Jiyana Wî*-, Weşanên Avesta, Stenbol, 2002, r. 15-16.

⁹² Ehmedê Xanî Külliyyatı, *Eqîdeya Îmanê*, Analîz ve Şerh: Kadrî Yıldırım, Weşanên Avesta, Stenbol, 2008, r. 55; Ehmedê Xanî Külliyyatı, *Nûbihara Biçûkan*, Analîz ve Şerh: Kadrî Yıldırım, Weşanên Avesta, Stenbol, 2008, r. 55.

S. Çevîk: *Mele Abdurrahman Durre di kitêba xwe ya bi navê Şerha Dîwana Ehmedê Xanî de îddîa dike ku Tuhfet'ul Amilîn ne ya Xelîfe Yûsif e, ya Ehmedê Xanî ye. Navê wê yê eslî jî Tuhfetûl Ewam bûye. Hûn di vê mijarê de çi dibêjin?*

Ş.Mistefa: *Şêx (Xelîfe Yûsif) ew kitêba(Tuhfetûl Amilîn) li Şamê çap kiriye. Mele Remezane Botî li wê derê musehîhê kitêbê bûye. Piştî wêqasê li Enqerê di sala 1963an de, wexta înkilaba Cemal Gürsel de tab bûye. Bi texmîna min, wexta me li wir kitêb li matbeayê dixist Mele Abdurrahman hate matbeayê. Piştî vê qasê ka ev a çawa tê zanîne da ku em bibêjin. Ev gotina Hezretî Xanî nebe, çawa meriv dikare îftîra li merivan bike. Tiştê negotina merivan be, ji vê tekzîba mezin mestir çi heye ku meriv bibêje. Meriv çawa îftîrayê li nefsa xwe dike, tiştê negotî...⁹³*

Ji ber ku di hemû berhemên wî de zimanê erebî û kurdî bi hev re hatine bikaranîn mirov nikare ku teqez bibêje kîjan xwerû bi kurdî û kîjan jî xwerû bi erebî hatiye nivîsandin. Dîsa jî li gor lêkolinên hatine kirin û agahiyên ku ji neviyê Xelîfe, Mela Ebdullah Tanrıverdi hatine girtin û bi xwendina berhemên wî tê dîtîn ku ev dozdeh berhemên Xelîfe hemû bi kurdî/kurmancî hatine nivîsandin.⁹⁴ Li gor cureya van berheman, Teqrîza wî nezm e û ya yê din jî pexşan e. Di vê binbeşê de bi kurtasî di derbarê berhemên Xelîfe de agahî hatin dayîn.

3.1. Teqrîz (Rexne/ Pesinname/ Medhiye)

Ji ber ku ev xebat bi tevahî li ser Teqrîzê ye û Teqrîz di gelek waran de hatiye zelal kirin em ê bi kurtasî hin agahiyan bidin. Teqrîz berhema Xelîfe Yûsif a nezmê ye. Ji 15 rûpelan û 11 beşan pêk tê û di tê de mijarên cihêreng hatine bikaranîn; pesin, rexne, dua, mijarên dînî, girîngiya zimanê kurdî, hewcedariya xwendin û ilmê, girîngiya zimanê erebî di xizmeta dîn de, danasîna berhemên Xelîfe û hwd.

Wekî berhem di sala 1961an de li Enqereyê di çapxaneyê Nûrê de bi navê 'Manzum Takrîz' hatiye çap kirin. Navê Xelîfe, ji ber şert û mercên qedexeyî⁹⁵ yê wê

⁹³ Çevik, g. n. r. 16.

⁹⁴ *Hevdîtîna Bi Neviyê Xelîfe Yûsif – Mela Ebdullah Tanrıverdi- re*, Bazîd, 3ê îlonê 2016.

⁹⁵ Ji hêla herdu neviyên Xelîfe, Mela Ebdullah û Hecî Sebîh ve serpêhatiyeke Xelîfe ya derbarê vê mijarê de tê neqilkirin. Di salên 1960î de dema ku Xelîfe ji bona

serdemê wekî ‘Yusuf Topçuoğlu’ li ser berhemê hatiye nivîsandin. Di bergê dawî de tê dîtîn ku xeynî Teqrîzê çar berhemên Xelîfe yê din jî çapbûne û bihayê wan jî li hemberê wan hatiye nivîsîn: *Îrşad’ul Îbad*, *Feraîz*, *Xutbe û Tuhfet’ul Amilîn*.⁹⁶

3.2. *Usûla Meratîba Hisabê (Rîsalet’ul Hisab-Matematîk)*

Ev pirtûk wekî risale, ango pirtûkeke biçûk ji aliye nivîskar ve hatiye nivîsandin. Taybetiya vê xebatê ew e ku di qada xwe de xwedî cihekî girîng e. Ango bi zimanê kurdî –çawa ku tê zanîn- heta vê pirtûkê li ser matematîkê pirtûk nehatine nivîsîn. Matematîk cureyeke zanistê ye ku xebata wê diwartir e. Û amadekirina xebateke wiha jî hem hişmendiyekê dihundirîne hem jî agahiyên zanista matematîkê. Lê divê bê gotin ku ev xebat ne wek matematîkeke giran hatiye amadekirin, tenê ji bo danûstandinên rojane û hesabên hêsa û wekî agahiyên bingehîn ên matematîkê hatiye amadekirin.⁹⁷

3.3. *Îrşad’ul Îbad a Kurmancî (Kitêba Kurmancî)*

Teşeya vê pirtûkê pexşan e û 320 rûpelan pêk tê. Meriv dikare bêje ev tekst wekî *Fiqha Zagona Olî ya Îslamê(Şafîî)* ye. Tê de devî devî 2000 hezar mijarên olî hene. Ev berhem di sala 1960an de li Enqerê çap bûye.⁹⁸ Li gor agahiyên ku Mele Ebdulahê neviyê Xelîfe daye, ev pirtûk ji aliye Taha Huseyn ve li bajarê Urmîyê bi zimanê Farisî jî hatiye weşandin. Navê pirtûkê jî daniye *Mecmeul Mesail*.⁹⁹

çapkirina berhemên xwe diçe Enqereyê li Çapxaneya Nûrê çend mirov dikevîne hundirê çapxaneyê û pirsyariya berhemên ku hatine çapkirin, li xwediyê çapxaneyê dikin. Wê çaxê xwediyê çapxaneyê bi çavan ji Xelîfe re îşaret dike ku ew ji wir dûrkeve. Piştî vê bûyerê Xelîfe dîsa diçe çapxaneyê û xwediyê çapxaneyê jê re dibêje ku ew kes polês bûn û li pirtûkên çapbûyî mêze dikirin. Xwediyê çapxaneyê ji wan re gotiye ku ev pirtûkên dînî ne. Ji ber ku wan polêsan ji berhemana tiştêk fêhm nekirine pirsgirek derneketiye. Lê xwediyê çapxaneyê ji Xelîfe re gotiğe, dema ku mirovên xerîb bêne hundir tu li wir nesekine û bi lez ji wir dûrkeve. *Hevdîtîna Bi Neviyê Xelîfe Yûsif –Mela Ebdullah Tanrıverdi- re*, Bazîd, 3ê Îlonê 2016; *Hevdîtîna Bi Neviyê Xelîfe Yûsif –Hecî Sebîh Tanrıverdi- re*, Bazîd, 20ê Gulanê 2017.

⁹⁶ Xelîfe Yûsif, *Manzûm Takrîz*, Nur Matbaası, Ankara 1961.

⁹⁷ Xelîfe Yûsif, *Usûla Meratîbê Hisab*, Tîpg. Abdusselam Bêcirmanî, Nûbihar, c. 8, j. 89, 2003, r. 26-35.

⁹⁸ Xelîfe Yûsif, *Îrşad’ul Îbad(2 Cild)*, Hira Yayınları, İstanbul 2004; *Îrşad’ul Îbad (Tîpên Erebi)*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2015.

⁹⁹ *Hevdîtîna Bi Neviyê Xelîfe Yûsif –Mela Ebdullah Tanrıverdi- re*, Bazîd, 3ê Îlonê 2016.

3.4. Mecmeû'ul Mesailîş-Şer'îye Bi Lîsanê Kurdiye

Wekî çend pirtûkên Xelîfe yên din, ev pexşan jî li ser Fiqha Îslamê ye. Bi piranî li ser perestiniyê hatiye nivîsîn û 750 rûpel e. Ji 46 babetên olî pêk tê. Di sala 2010an de ji aliye Weşanên Nûbiharê ve li Stenbolê hate çapkirin.¹⁰⁰

3.5. Tuhfet'us Sibyan

Ev pexşana bi kurdî ji bo zarokan wek diyarî hatiye amade kirin. Di amadekirina vê berhemê de ramanên Ehmedê Xanî berbiçav xuya dikin û Nûbihara Biçûkan tîne bîra meriva. Di tê de 44 babet hene û sala 2008an de jî ji aliye Weşanên Nûbiharê ve li Stenbolê hate çapkirin.¹⁰¹

Xelîfe Yûsif di dawiya pirtûkê de bi helbestkî çarîneke wiha nivîsiye:

Ey xwendiya! Li min nekin lewm û îtab
Ger çi pir sehwa û eyb e, ev kitab
Hûn dirist û teshîh bidêrin xweşcewab
Ji lutf û kerema xwe wellahu e'lemu bissewab¹⁰²

3.6. Tuhfet-uz Zakirîn

Tuhfet-uz Zakirîn bi kurdî-erebî û wek pexşan hatiye amade kirin. 44 babet tê de hene û di 1963an de li Enqerê bi tîpên erebî çap bûye. Cara pêşî li Enqerê li ser navê “*Ebdullah Ibnu Mewhmûd Neqşebendî*” hatiye çap kirin.¹⁰³

3.7. Feraîz

Feraîz bi pexşanî û zimanê kurdî/kurmancî hatiye nivîsandin. Xelîfe di vê berhemê de li ser dabeşkirina mîratê rawestiya ye û xuya ye vê xebatê tîrên mîratxuran kişandiye ser Xelîfe. Lewre bi vê pirtûkê Xelîfe şaşitiyên di der barê parvekirina mîratê

¹⁰⁰ Xelîfe Yûsif, *Mecmeu'ul Mesail* (Tîpên Erebi), Weşanên Nûbihar, Stenbol 2010.

¹⁰¹ Xelîfe Yûsif, *Tuhfet'us Sibyan*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2008.

¹⁰² Xelîfe Yûsif, *Tuhfet'uz Zakirîn*, Nur Matbaası, Ankara 1960.

¹⁰³ Zinar, h. b. r. 113.

de li gor ruknê Îslamê rave kiriye û bi tespîtên xwe ve kevirên bingehîn ku li ser hîmekî berjewendiyane hatine rast kirin, leqandiye û rê û rêbazên nû ava kiriye.¹⁰⁴

Ev pirtûk ji 56 rûpelan pêk tê û Xelîfe di sala 1961an de li Enqerê daye çap kirin. Lê çawa ku me li jor jî diyar kiribû, navê wî bi çar tîpên ‘erebî (y , w , s ,f) û bi hejmarî 156 li ser pîrtûkê hatiye nivîsandin. 156 li gor hesabê ebcêde dibe Yûsif.¹⁰⁵ Her wiha navekî din jî wek nivîskar li ser berhemê dixuyê û ev jî Ebdullah Ibnu Mewhmûd Neqşebendî ye. Lê em dizanin ku Xelîfe bi xwe ye.¹⁰⁶

Li ser bergê Feraîzê çend malik helbest jî hene û ew jî ev in:

Ey ummiyê ku hûn ‘erebî nizanin
Ji we ra mizgînî ye ger hûn bizanin

Kesê wê bixwîne ji pîr û cana
Wê bibe feqîhekî xebîr û zana

Bi tewfîqa Xelaqê erd û asîmana
Bi cahê şefîe cumle ins û cana

Sed hezar selat û selam her zemana
Li ser wî û al û eshaba her wext û hîn û ana¹⁰⁷

3.8. Tecwîd

Tecwîda Xelîfe jî bi pexşanî hatiye nivîsandin. Di vê berhemê de 38 mijar hene û ji 44 rûpelan pêk tê. Tecwîd tevî pirtûka Xelîfe ya bi navê Eqîdeya Îmanê, di sala 2008an

¹⁰⁴ Xelîfe Yûsif, *Feraîz*, Nur Matbaası, Ankara 1960.

¹⁰⁵ Li gor hesabê Ebcêde tîpa y yê 10, tîpa w ê 6, tîpa s yê 60, tîpa f yê 80 dike, bi tevahî dikin 156 û ev jî navê Xelîfe derdixe holê, ango Yûsif.

¹⁰⁶ Zinar, h. b. r. 115.

¹⁰⁷ Xelîfe Yûsif, *Feraîz*, Nur Matbaası, Ankara 1960.

de bi tîpên erebî lê bi zimanê kurdî/kurmancî li Stenbolê di nava Weşanên Nûbiharê de derçûye.¹⁰⁸

Li ser bergê yekem yê Tecwîdê Xelîfe çend riste helbest nivîsiye:

Wacib e li ser xas û amê
Zanîna erkanê îman û Îslamê

Paşê wacib e li ser da û baba
Te'lîma ewlada ruhniya herdu çava

Kurmancî ye şêrîntir e ji şekir
Xwezîya bi wî kesî zanî hem jiber kir¹⁰⁹

3.9. Eqîdet'ul Îman

Eqîde jî fenanî Tecwîdê bi tîpên erebî û bi kurdî/kurmancî hatiye nivîsandin. Herwekî hemû seyda û alimên medreseyan Kurdistanê, Xelîfe jî bi navê *Eqîdet'ul Îman*, lê bi şêweya pexşanî, ku di derbareyê şertên Îslamê û rûknên îmanê de ye, berhema xwe nivîsiye. Û çawa me li jor jî diyar kir, tevî pirtûka Xelîfe ya bi navê Tecwîdê, di sala 2008an de ji aliye weşanxaneya Nûbiharê ve hatiye çap kirin.¹¹⁰

3.10. Xutbe

Armanca amadekirina vê berhemê xuya ye ku wekî gelek berhemên Xelîfe, femkirina ola Îslamê bi zimanê kurdî/kurmancî ye. Xwendina xutbeyê di roja îne û du eydên pîroz, remezan û qurbanê de, şert û rîtueleke bingehîn ya ola Îslamê ye. Xelîfe jî bi nivîsandina vê pirtûkê xwestiye ku gelê kurd, ku piraniya wan 'erebî nizanin, bi zimanê xwe Xutbeyê guhdar bikin û jê fem bikin. Ev berhem di sala 1963an de hatiye çap kirin,

¹⁰⁸ Xelîfe Yûsif, *Tecwîd*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2012.

¹⁰⁹ Xelîfe Yûsif, *h.b.*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2012.

¹¹⁰ Xelîfe Yûsif, *Eqîdet'ul Îman*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2012.

lê mixabin cihê çapkirinê ne diyar e. Û navê Xelîfe jî dîsa bi hesabê ebcede 156 hatiye nivîsandin.¹¹¹

Xutbe ji pênc beşan/ruknan pêk hatiye:

1-Hemdê Xweda

2-Selewat

3-Wesyeta bi teqwayê

4-Ayet

5-Dua

3.11. Tuhfet'ul Amilîn

Ev berhema Xelîfe di derbarê Fiqha Îslamê de, sala 1913-1914an (1326 Koç) de li Şamê li Çapxaneya Teraqiyê hatiye çapkirin. Nivîskar dema ku ev pirtûk nivîsiye temenê wî 29 bûye. Berhem ji 363 rûpelan pêk hatiye. Li gor agahiyên ku Şêx Mistefayê kurê Xelîfe dide, Remezan el-Botî teshîha Tuhfet'ul Amilîn kiriye.¹¹² Ev berhem di sala 1963an de dîsa li Enqereyê di Çapxaneya Nûrê de hatiye çap kirin.¹¹³

3.12. Tuhfet'ul Îxwan

Ev pirtûka jî ji Fiqha Îslamê pêk tê. Bi zimanê erebî hatiye nivîsîn û piştî mirina Xelîfe di sala 1996an de li Stenbolê bi zimanê tirkî-erebî, ji aliye Weşanên Şûra ve hatiye weşandin. Pirtûk 140 rûpel e. Di beşên pirtûkê de hin sernav bi kurdî, hin bi tirkî ne, lê piraniya naverokê bi zimanê erebî hatiye nivîsandin.¹¹⁴

Di vê berhema Xelîfe de çend riste helbest jî xuya dikin. Em ê niha li jêr van malikan binivîsin:

Efû ke gunahê min rûsiyah

Bi lutf û bi rehma xwe ey Padîşah

¹¹¹ Xelîfe Yûsif, *Xutbe*, Nur Matbaası, Ankara 1961.

¹¹² Süleyman Çevik, "Bi Kurê Xelîfe Yûsif Şêx Mistefa re Hevpeyvîn", Nûbihar, c. 8, j. 89, 2003, r. 16.

¹¹³ Xelîfe Yûsif, *Tuhfet'ul Amilîn*, Nur Matbaası, Ankara 1961.

¹¹⁴ Xelîfe Yûsif, *Tuhfet'ul Îxwan*, Nur Matbaası, Ankara 1961.

Şefaetçî ke ji bo min ê bênewa
Hebîbê te kir xatemê enbiya

Ji bo cumle mexlûq her ew şefaetçî ye
Te ew rehmet ji bo alem şandiye

Ew hebîbê te eflaki ji bo çêkirî
Bi cahê wî azad ke me ji agirî

Bê hed û hesab her selat û selam
Li ser wî û al û eshaba tamam.¹¹⁵

¹¹⁵ Xelîfe Yûsif, h.b., Nur Matbaası, Ankara 1961.

BEŞA SÊYEM

ZIMANÊ TEQRÎZÊ Û KESAYETIYA EDEBÎ YA XELÎFE YÛSIF

1. ZIMANÊ TEQRÎZÊ

Zimanê ku di berhemên edebî de hatiye bikaranîn re zimanê edebî tê gotin. Hin taybetmendiyên zimanê edebî ev in; bikaranîna telmih û şibandinan, hebûna konteksta di nav peyvên de, vegotîneke herikbar û resen û hwd. Her çiqas zimanê edebî di wateya zimaê nivîsarê ve bê bikaranîn jî, her du term ji hev cuda ne. Her wiha di zimanê edebî de derfêtên zimanê axaftinê jî bi hemû teşeyî ve tê dîtin.¹¹⁶ Lê piştî hildana amûrên zimanê axaftinê, bi huner, wateyên mecazî û taybetiyên edebî ve ew ziman dewlemendtir dibe û ziman û têgehekê nû derdikeve holê.

Hewce ye bê gotin ku Xelîfe di teqrîzê de zimanekî xayet zelal û hêsan ê edebî bi kar aniyê. Ev yek di xwendin û têgihîştina berhemê de xwe nîşan dide. Di jiyana helbestvan de jî hatibû diyarkirin ku Xelîfe di medreseyan cur bi cur ên bazîd û sêrtê de perwerdehiyeke xurt a zimên dîtibû û fêrî zimanê erebî û farisî bibû. Her wiha zimanê tirkî û zimanê xwe yê zikmakî –kurdî- jî baş dizanibû. Vê pirzimanîyê hem di jiyana wî de hem jî teqrîzê de xwe eyan kiriye.

Lazim e bê diyar kirin ku teqrîz wekî berhemên ku edebiyata kurdî de wekî otorîte tîr qebûl kirin, bi zimanekî giran û dijwar nehatiye nivîsandin. Heta ku ji helbestvan hatiye li gor asta zimanê gel helbesta xwe nivîsiye. Ji bona wî ya girîng wate ye ne ku zimanê ku pê hatiye nivîsîn:

Lazim e tu dîne xwe qenc bizanî

Gerçi bi **kurmancî** we ya bi **‘îbranî**

(II/8)

Lewma jî di teqrîzê de em pêrgî ravekên şêlû, gotinên girift û bêjeyên giran ên zimanê din nayên. Helbesta Xelîfe bi vî awayî nehatiye fetisandin û tê dîtin ku helbestvan

¹¹⁶ Mehmet, Öner, “Edebi Dil ve Üslup”, *Atatürk Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi* Sayı 36 Erzurum 2008, r.25.

dixwaze zimanê xwe bide hezkirin, hêz û xweşikbûna zimanê kurdî li xwîneran peyda bike:

Kurmancî ye şirîntir e ji şekir

Xweziya bi wî kesî ku zanî, hem jiber kir

(IV/65)

Kurmanciya ku Xelîfe bi kar aniye ji devokên kurmanciya jor, ên mîna serhed û botî pêk tê û gelek taybetiyên van devokan di teqrîza wî de hatine bi kar anîn. Lê di malikan de hebûna taybetmendiyên van devokan helbest nefetisandiyê û femkirina helbestê di talde de nehiştiye. Di xwendina teqrîzê de hebûna hêmanên van devokan aheng û herikbariya helbestê zêde kiriye û xuya ye ku Xelîfe xwestiye ku rengê warên ku jiyana wî lê derbas bûye, bide helbesta xwe jî.

Teqrîz ji hêla zimên ve gelek dewlemendiyan dihundirîne; peyvên resen ên kurdî, biwêj, gotinên pêşyan, ravek, hêmanên zimanê din û hwd. Me di bin vê sernavê de ev mijar bi mînakên ve zelal kir.

1.1. Hin Peyvên Kurdî yên Resen di Teqrîzê de

Di nivîsandina berhemekî de tercihkirina peyvên resen, hêz û quwetê dide vegotinê û him jî rê li pêşya têkilheviya wateyan digre. Herwiha, di berhemekî de bikaranîna peyvên resen, nîşaneyê girîng e ku helbestvan an jî nivîskar waqîfê wî zimanî ye. Di vê çarçoweyê de dema ku em bala xwe didin Teqrîza Xelîfe, em dibînin ku Xelîfe di teqrîza xwe de hin peyvên resen ên kurdî bi kar aniye.

Her wiha hewce ye ku em diyarbikin ku Teqrîza Xelîfe ji hêla peyvên kurmancî ve gelek dewlemend e. Heta niha li ser peyvsaziya berhemên Xelîfe wekî nivîsar tenê Umîd Demîrhan di Kurmancîyê -rojnameya taybet ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê- de

nivîsek amade kiriye ku ji bîst û yek peyvên ji çar berhemên Xelîfe hatiye jibartin.¹¹⁷ Em ê jî niha li jêr digel van peyvên hin peyvên dîtir ji teqrîzê nimûneyan jî nîşan bidin;

Guhdirêj (I/18), kêmbiha (I/12), wareng (wiha)(I/28), neşê (I/39), jar (II/12), agah (II/13-XI/1), werne (ku wiha nebe)(II/21), hêvî (III/3), gemkirin (III/12), rûreş (III/16), Xwedêtirs (III/20), şermesar (IV/4), nêçîr (IV/25), malikwêran (IV/22), heban/hevan (IV/27), hingivnûş (IV/31), mûrîfiroş (IV/31), ciwan (IV/47), hêstir (IV/52), qirêc (IV/53), betal (IV/57), bawer kirin (VI/12), civat (V/10), mabeyn (XI/8), seraser (IV/58), pale (IV/57), qelb/riziyayî (VIII/4).

1.2. Taybetiyên Devoka Serhedê di Teqrîzê de

Ji ber ku Xelîfe Yûsif ji devera serhedê ye di seranserê Teqrîza wî de serhedîbûna wî û taybetiyên vê devokê tê dîtîn. Wekî mînak daçekên ‘da/va/ra’.

Tu bixwîne, rêya dînê xwe qenc bizane

Te‘lîma dîn ta‘etekî mezin ji xwe ra bizane

(IV/48)

Çawa ku tê zanîn ev daçek di kurdiya hevpar/ kurdiya ber bi standartbûnê de ev daçek di forma ‘de/ve/re’ de tîr bikaranîn û ev forma dawî êdî ji aliye gelek kurdînan ve hatiye pejirandin û piraniya nivîskaran bi vê formê berhemên xwe dinivîsin. Lê Xelîfe -ewil jî hatibû gotin- ev daçek li gor devoka serhedê bi kar aniye û me jî ji bona parastina reseniyê ya vê berhemê, dest nedayê. Her wiha dîsa gelek peyv û komepeyv hene û tê zanîn ku ew jî serhedî ne. Dîsa qertafa pîrjîmarîyê ‘-êd’ jî çend caran hatiye bi kar anîn ku em piranî di berhemên kurdên Sovyeta Kevin û Kafkasan de rastî vê qertafê tîr. Ango ev jî taybetmendiyeke devoka serhedê ye.

Taybetiyeke sereke ya devoka Serhedê jî ew e ku di gelek peyvên de dengê “w”yê nayê gotin an jî tê avêtin.¹¹⁸ Di teqrîza Xelîfe de jî mînakên vê taybetiya devoka Serhedê

¹¹⁷ Omidê Mistefayê Celalî, “Hin Peyv ji Pirtûkên Xelîfe Êsiv”, Kurmancî, Hejmar 58, Bihar-2016,r.6.

¹¹⁸ Önder Beyter, *Dîwana Mela Ehmedê Heyderî (Metn û Lêkolîn)*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn, 2013. r. 34-35.

peyda dibin. Wekî mînak, di malikên jêr de dengê “w”yê ya peyva ‘xwarin’ê hatiye avêtin an jî nehatiye bikaranîn.

Xarina wê lezîz e gelek şîrîn e

Nebêje wê, bi kevçik dar e we ya zêrîn e

(I/7)

1.3. Taybetiyên Devoka Botan û Behdînan di Teqrîzê de

Jiyana Xelîfe piştî şerê cîhanê ya yekem nêzî bist salan li Sêrtê û Cizîrê derbas bû. Bivê nevē vê herêmê tesîreke mezin li ser Xelîfe kiriye, vê tesîrê di xebirdan û nivîsandinê de jî xwe nîşan kiriye. Di Teqrîzê de bi dehan zêdetir peyva ‘nik’ hatiye bi kar anîn ku ev peyveke Botî ye. Dîsa wekî gelek berhemên klasîk di teqrîzê de peyvên wek, ‘neşê’, ‘wareng’ û hwd. hatine bikaranîn.

1.4. Biwêjên ku di Teqrîzê de Hatine Bikaranîn

Teqrîz ji hela biwêjan de jî dewlemend e. Xuyaye ku Xelîfe ji bona huner û herikbariya helbestên xwe biwêjên balkêş bi kar aniye. Her wiha taybetiyên devokî xwe di van biwêjan de dide nîşan. Me jî ji Teqrîzê ev biwêj bijart û li gor rêza helbestan li jêr di nav tabloyê de hate nîşankirin:

Agah ji halê xwe nebûn (XI/1)	Ji hev du ferq kirin (IV/66)
Bi hêviya pişik û sa mayîn (VIII/10)	Ji xwe ra zanîn (IV/48)
Bi mêvanî hebandin (IV/30)	Kelbê kûtxwer (III)
Bi qirêca dunyayê firotin (IV/53)	Ketim kirin (III/10)
Bi serê pîrê xwe sond xwerin (XI/20)	Li ser mayîn (IV/28)
Cehd kirin (III/6)	Li wî/wê eser kirin (IV/67)
Destê xwe dirêj kirin (XI/25)	Mehrûm bûn (II/16)
Di çavan de kelem û strî bûn (IX/3)	Navê şêra li sa danîn (VII/13)
Dînê xwe firotin (IV/41)	Qewlek heq gotin (IV/21)
Dîza te nakele (VI/9)	Rûyê xwe jê zivirandin (IX/7)
Ecel lê xuya bûn (IV/42)	Sûret kelb xuyan (VII/16)
Emel kirin (IV/60)	Şermesar bûn (IV/26)

Fexir kirin (II/13)	Tekrar û ezber kirin (III/18)
Gem kirin (III/12)	Tele/defik danîn (XI/4)
Heba çûyîn (V/4)	Terk kirin (III/7)
Heban tijî ba û hewa bûn (IV/27)	Ummî mayîn (II/11)
Hêsirê xûnê ji çeşm/çav barîn (IV/52)	Xilas kirin (II/6)
Hişyar kirin (II/6)	Xwedê dayîn (V/7)
Jê exiz kirin (XI/23)	Xwelî li ser wer kirin (VI/8)
Jiber kirin (IV/65)	Wacib kirin (IV/38)
Ji ezber xwendin (IV/55)	Zen kirin (IV/31)

1.5. Gotinên Pêşyan ên ku di Teqrîzê de Hatine Bikaranîn

Qasî biwêjan zêde nebin jî çend gotinên pêşyan di Teqrîzê de hatine bi kar anîn. Ev jî Teqrîzê ji hêla folklorê ve dewlemendtir dike û nîşaneyê serkeftinê ya zimanê nivîskar e.

Bi hingiv gotin tu dev şîrîn nabe (VII/9)

Dengê daholê gerçi xweş û şîrîn e (III/11)

Li sûka mirîşka deve na'ê firotin (II/22)

1.6. Hêmanên Zimanên Din di Teqrîzê de

Edebiyata klasîk a rojhilata navîn ji zimanên cur bi cur pêk tê. Zimanekî mîna erebî dewlemend, gelek bêje ji zimanê farisî sitandine. Zimanê farisî jî, bandorek mezin ji zimanê erebî wergirtiye. Dikare bê gotin ku zimanên rojhilata navîn tevan ji hev bandor girtine. Bi taybetî zimanên ku ji malbatekê ne, ev bandor zêde li hev kirine. Ji ber ku kurdî û farisî ji yek malbatê ne û ji hêla fonetîka ziman ve nêzî hev in, helbestvanên kurdî û farisî zimanên kurdî û farisî pir bi kar anîne. Jixwe farisî li medreseyan Kurdistanê dihate xwendin. Heta dema îro jî li Serhedê di medreseyan mîna Oxîn (Bilîs) û Sêrtê de, farisî weke dersekê tê xwendinê. Xelîfe jî teqez di medreseyan Kurdistanê de hînê zimanê farisî bûye. Her wiha zimanê tirkî jî, ji ber ku zimanê fermî û serdest yê komara tirkîyê

ye, kême be jî bandor li ser helbestvanê me û klasîkên kurd kiriye. Li jêrê em ê cîh bidin van hêmanên zimanên ku di teqrîzê de hatine bi kar anîn.

Hêmanên Erebî

Xelîfe Yûsif di teqrîza xwe de zimanê erebî li gorî dema xwe baş bi kar aniye. Di teqrîza xwe de ji îşaret ji hedîs û ayetan daye û biwêjên erebî bi kar aniye. Em ê li jêrê çend mînakên bidin. Her wiha wekî gelek klasîkên kurd û rojhilatanavînî tesîre ‘erebî ji zimanên din zêdetir li ser Xelîfe çêbûye. Di teqrîzê de rêjeya peyvên ‘erebî zedeye.

xatemê enbiyan (IV/18)

ma ‘aleyke (II/8)

fe ma ‘aleyke (II/8)

terîqa musteqîm (IV/64)

Hêmanên Farisî

Di pêvajoya vê xebatê de, çî ji agahiyên ku malbata wî bi me re par ve kirin çî jî ji berhemên Xelîfe me dît ku helbestvanê me zimanê farisî baş dizane. Her wiha ev tesîr xwe di Teqrîzê de jî nîşan dide. Carinan bi term û têgehên carinan jî di hin risteyan de wek bandoreke wêjeyî, farisî kirasê xwe li Xelîfe kiriye. Lê hewce ye ku em vir diyar bikin di teqrîzê de ne ewqas zêde ye. Em ê niha li jêr tiştên ku me tesbît kirine mînak bidin.

behane (II/10)

beyhûde (III/23)

çeşm (IV/13)

namîdar (IV-13)

newadir (X-7)

palan (I/14)

pend (III/24)

payende (IV/45)

rewa (III/4)

rûsiyah (IV/4-X/13)

xarî (VIII/8)

Tesîra farisî xwe di hin malikan de jî nîşan daye. Di mînaka jêrîn de Xelîfe li şuna pêşdaçeka kurdî 'di'yê, pêşdaçeka farisî ya 'der'ê bi kar aniyê:

Nas mane, **der** zulmet û cehalet

Ekserê wan girtine rêya çalalet

(I/33)

Hêmanên Tirkî

Ji ber ku tirkî zimanê serdest ê dewleta osmanî û piştî wê jî yê komara tirkîyê bû Xelîfe jî hem tirkî dizanibû hem jî di berhemên xwe de kêr be jî tirkî

bi kar aniyê. Di teqrîzê de jî çend cihan de mirov pêrgî hêmanên tirkî tê.

gözbağlayıcı (XI/4)

ocağ (XI/5-6)

2. DI TEQRÎZÊ DE GIRÎNGIYA ZIMAN Ê ILMÊ

Teqrîz gelek mijarên cihêreng di hundirîne. Li jorê jî me diyar kiribû ku Xelîfe seranserê teqrîzê de her tim cihekî taybet dide zimanê xwe yê zikmakî. Her çiqas têgeha 'kurmançî' bi kar bîne jî xuya ye mebest jê zarava nîne, bes kurdî ye. Her wiha dîsa rola zimanê 'erebî jî înkâr nake û hewcedariya zimanê 'erebî di hînbûn û xwendina 'ilmê de wek xaleke zêrîn nîşan dide. Di ramanên Xelîfe de xwendina 'ilmê ciheki berfireh digire û ew jî di giyanê helbesta xwe de her tim ber bi 'ilmê dimeşe. Ji ber ku armanca wî ev e, êdî ew qîmetê nade çendiniyê, ji bona wî ya girîng qalîte û çawaniya 'ilmê ye.

Em ê niha li jêr di bin çend sernavan de vê mijarê zelal bikin.

2.1. Girîngiya Zimanê Kurdî/ Kurmancî

Xelîfe rexneyeke giran li kesên ku kurdî biçûk û bêqîmet dihesibînin, dike. Carna rexneya wî diçe digihîje asta dijûnan. Wekî mînak di malika jêrîn de paşxaneya zimanê kurdî li gor nîşan kategorize dike û kûrbûn û diywariya fêrbûnê ya zimanê kurdî wiha bilêv dike:

Lîsanê **kurmancî** çil bav [û] kala

Hê`j nizanî bi xwendina meh [û]sala

(II)

Li gor Xelîfe ya muhîm ew e ku dîn baş bê zanîn, ne ku bi çî zimanî hatiye hînbûyîn. Heta bi zimanê cihûyan jî dibe ku dîn bê fêr kirin û zanîn. Xelîfe bi mînakeke wiha awarte ve prensîbeke bingehîn jî datîne.

Lazim e tu dîne xwe qenc bizanî

Gerçî bi **kurmancî** we ya bi `îbranî

(II/8)

Kurmancî ji aliyê hin aliman ve di serdema Xelîfe de hêjayê nivîsar û xwendinê nedihat dîtin. `Her çiqas li gor we kurmancî xweş xuya neke jî di binî de xwedî qîmeteke bêhempa ye, gelek xweş e`. Ji bona ku ev pêşbiryara wan bê pûç kirin wiha li wan şîret kiriye:

Lîsanê **kurmancî** eger çî naşirîn e

Lakîn di bin da, me`nayê da şekirîn e

(II/11)

2.2. Girîngiya Zimanê Erebî di Xizmeta Dîn de

Erebî wekî zimanekî serdest di hemû medresyên kurdistanê de dihat fêrkirin û xwendina gelek ilmên medreseyê bi erebî dihat meşandin. Digel erebî zimanên wekî farisî û kurdî jî bi sed salan di medreseyan de tê xwendin û fêrkirinê. Xelîfe jî wekî selef û xelefên xwe di medreseyan de hînî erebî û farisî bibû. Ji xwe zimanê xwe yê zikmakî dizanibû û ewil ji hatibû gotin ku li gor Xelîfe kurdî nûsîn û xwendin gelek girîng bû. Digel vê dema ku Xelîfe berhemên xwe dinivîse hem karigeriya zimanê erebî di

berhemên wî de zêde ye hem jî ji dozdeh berhemên xwe du hebê wan Tuhfet'ul Amilîn û Tuhfet'ul Îxwan bi erebî nivîsiye. Ango qîmetdayîna zimanê kurdî, hewcedarî û rola erebî ji holê ranake. Xelîfe van her du mijaran serbixwe dinirxîne û hurmeteke mezin dide zimanê erebî û hin caran wekî durr û lûlû binav dike. Di malik û mînakên jêrîn de jî ev yek baştir diyar dibe:

'Ilmê 'erebî nûrek gayet munewer
Ji bo kêma kesa Xwedê dike muyeser

B'ilmê 'erebî navê xwe dikî tu ma'lûm
Bê zanîn, li dunya û axreta xwe dikî rezîl û mehrûm

(VI û VII)

Gerçi **'erebî** durr e xwedan biha ye
Îro wê muşterî qeş kes nemaye

(I/9)

'Ilmê 'erebî qîmetgiran e
Qenctir e, ji xatema Suleyman e

(I/36)

'Ilmê 'erebî cewherek gayet biha ye
Wekî 'enqaê çû ye 'adem, îsmê wî maye

Ew 'alimê ku **'ilmê 'erebî** qenc dizanin
Ehl [û] ewladê wan galîben 'ummî û nezan in

(II/4 û 14)

2.3. Girîngiya Zanistiyê û Xwendina 'Ilmê

Serdema ku Xelîfe di tê de jiyana xwe derbas kiriye bi her awayî şert û mercên dijwar di hundirîne. Bi taybetî jî derfêtên xwendin û nivîsandinê gelek kêma bûn û gelek kes ji xwendinê bêpar diman. Di wextekî wiha de Xelîfe li gelek deverên bakûrê kurdistanê perwerdehî dîtibû. Piştî vegerandina ji mihacirîya şerê cihanê yê yekemin rewşa nezanî û cehaletê baştir li wî xuya bû. Ev sal salên destpêkê yê komara tirkîyeyê bûn û piştî pasîfîzekirina medreseyan û qedexekirina tîpên erebî ev rewş xetertir bibû.

Xelîfe digel zanîna vî halî û dîtina cehaletiya gel berhemên xwe bi kurdî dinivîsî da ku gel dînê xwe qenc fêr bibe.¹¹⁹ Di teqrîzê de jî gelek caran girîngiya ku dide xwendin û ilmê nîşan dide. Eger mirov xwedî aqil be divê her dem bixwîne da ku nexweşiya cehaletê jê dûr bisekine. Lê tişta ji vê girîngtir jî ew e ku xwendina bê'emel ji nexweşiya cehalete xirabtir e, hewce ye ku ew 'ilma ku hatiye xwendin û fêr kirin, xwe di tevgera wî kesî de jî bide nîşan kirin.

Ger te hebûya 'aql û kiyaset

Te yê wê **bixwenda** her wext [û] se'et

(I/40)

Xwendina 'ilmê ji bo 'emelê rewa ye

Wer ne, bê 'emel merežek bê dewa ye

Xwendina bê 'emel mensûr [û] heba ye

Ji bo tu mereža ew nabe derman û dewa ye

(VII/5-6)

3. JI ALIYÊ TEŞEYÎ VE TEQRÎZ (SERWA (QAFIYE) Û CÛREYÊN WÊ)

Di bin vê sernavê de em ê teqrîza Xelîfe ji hêla teşeyî ve binirxînin. Xelîfe di helbesta xwe de kêşeya arûzê bi kar neaniye û bi kêşeya serbest teqrîza xwe nivîsiye. Teqrîzê de qafîye li gor cureyan hatine tesbîtîkirin û bi mînakên ve jî hatine nîşankirin.

Serwa ji du peyvên ku divê herî kêr di dawiya du risteyan de ji aliyê deng ve wek hev ji aliyê wateyê ve cuda bin re tê gotin. Ji bo ku wekhevîya dengên nav du peyvên serwa were hesabandin divê van peyvên ji hêla deng û wateyê ve yek nebin¹²⁰. Xelîfe Yusif di helbestên xwe de piranî serwa bi karaniye, di hinek helbestan de paşserwa heye.

Ewan dê bidiya j imin 'eceb icabet

Heta qiyamet bibûna şermî û xecalet

¹¹⁹ *Hevdîtîna Bi Nevîyê Xelîfe Yûsif – Mela Ebdullah Tanrıverdi - re*, Bazîd, 3ê Îlonê 2016.

¹²⁰ Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, TDK Yayınları, Ankara 2013, r. 59.

(I/20)

Hata tu ku nekî ewan tekrar û ezber

Ne la'iq e tu bibî imam û serwer

(III/13)

3.1. Li gorî cihê wê yê di risteyê de

Li gorî cihê serwayê di risteyê de sê cûr serwa hene: Sewaya kutayî, serwaya navekî û serwaya sereta¹²¹.

3.1.1. Paşserwa

Paşserwa ji serwaya di dawiya risteyan de cih dige re tê gotin. Mînakên vê serwayê li ser malikên Xelîfe Yusif ên li jêrê ne hatine nîşandan.

Lewra şêrê 'alî xwedan şeca'et

Navê wî ji kelba ra nîne liyaqet

(VII/15)

Lewra ferman kiriye Hezretî Pêxember

Şefî'ê asiya roja qiyam û mehşer

(IV/11)

3.1.2. Navserwa

Serwaya di nav risteyan de cih digre ye. Di vê xebata me de ev cureya serwayê nehatiye peydakirin.

3.1.3. Pêşserwa

Her çiqas di edebiyatê de serwaya di dawiya risteyan de hatibe pejirandin jî li gor hin wêjenasan ve dubareyên di serê risteyan de jî hewce ye wekî serwayê bê

¹²¹ Serdar Yılmaz, *Dîwana Şêx Şemsedîne Exlatî (Metn û Lêkolîn)*, Teza Lîsansa Bilind a Çapbûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn 2013. r. 83

qebûlkin. ¹²² Ji ber vê yekê cûreya serwayê ya ku di serê risteyan de cih digire re pêşserwa tê gotin û di Teqrîza Xelîfe Yûsif de kême be jî em pêrgî mînakên wê hatin.

Ya xayet ‘alim î muhtaç nînî

Ya xayet ehmeq û mecnûn û dînî

(IV/10)

Tê bigirî di gel hezar ah û derda

Tê bêjî vê dunyayê axiret li min bi der da

(IV/44)

Ger tu şehîr î meydana herba şehîra veke

Ger tu rovî yî de’wa meydana şehîrtiyê meke

(IV/19)

3.2. Li gorî Dengan

3.2.1. Serwaya Lawaz

Serwaya lawaz di risteyan de wekhevîya dengê bi tenê ye. Di edebiyata klasîk de zêde ev serwa natiye tercîhkirin ¹²³ û di Teqrîza Xelîfe Yusifî de hatiye bikaranîn.

Ew jî ‘alim e di heyata dunya [ê]

Hem di gel wan e di axiret û ‘uqba [ê]

(IV/12)

Ew ê di gel ‘ilê xwe bimirin herin fena [ê]

Ehl û etbaê wan ummî dimînin li dunya [ê]

(II/11)

3.2.2. Serwaya Asayî

¹²² Aydemir, Yaşar & Çeltik, Halil, “Redife Farklı Bir Bakış: Divan Şiirinde Ön Kafiye ve Ön Redif”, *Bilgi-Türk Dünyası Sosyal Bilimler Dergisi*, Yaz 2008, hej 46, r.193-214.

¹²³ Yılmaz, h.b., r. 85.

Di serwayê de ji wekheviya du dangan re tê gotin. Di Teqrîza Xelîfe Yusif de hatiye bikaranîn.

Gerçi Kurmanciya me ne fesîh e
Fehma me ‘nayê ji wî xayet melîh e
(I/27)

Ger bêjin kurmanci ye ne fesîh û letîf e
Haşa xalis me’naê şer ‘a şerîf e
(II/19)

3.2.3. Serwaya Zêdebar

Di serwayê de ji wekheviya du dangan zêdetir re tê gotin. Çend mînak ji Teqrîza Xelîfe Yusif;

Xwedê bide wî tewfîq û hidayet
Refîqê wî bike Nusret û ‘inayet
(I/46)

Nas mane der zulmet û cehalet
Eksere wan girtine rêya delalet
(I/33)

Ey çavkorê qelbreş û tarî
Inkara şer ‘ê neke bi kizb û bi hilekarî
(IV/8)

Hem ew ê erkân û sunetê nimêja mubarek
Bizane ezan û îqamet û tesbiha bi carek
(IV/68)

3.2.4. Serwaya Regezdozî (Cînas)

Serwaya regezdozî peyv û dengên ku bilêvkirina wan wekî hev in, lê belê wateya wan ji hev cuda ye. Regezdozî di wateya cînasê de ye. Ev wek hunerek edebî jî tê bikaranîn. Di Teqrîza Xelîfe Yusifî de ev cure nehatiye peydakirin

3.2.5. Paşserwa (Redîf)

Deng û peyvên ku di dawiya risteyan de hem ji hêla şikil ve hem ji hêla wate ve yek bin re paşserwa tê gotin. Xelîfe Yusifî vê cûreya serwayê bi kar anîye.

‘Alim ew e ‘ilmê dîn **mezin bizane**

Te‘lîma dîn ta‘etekî **mezin bizane**

(II/15)

Ey kesê Xwedê bizanîna wamn te şa **kir**

Te bi lutf û ihsan ji xefletê hişyar **kir**

(III/9)

Nêçîr û xwarina şêhra gaye kovî **ye**

Mirîşk û mişk seyd û nêçîra rovî **ye**

(IV/25)

4. KESAYETIYA EDEBÎ YA XELÎFE YÛSIF

Di pêkhatin û werara kesayetiya edebî ya Xelîfe Yusif de, bi taybetî paşxaneyê ku gihandina kesên kurdîzan û hemîyetperwer li serhedê pêkan kiriye, dikare bi çend hokerên sereke ve bête dîyar kirin. Berî her tiştî, herçiqas di dewra Xelîfe de Bazîd ne xwediyê şan û giringiya xwe ya berê be jî, binemala bajêr û kurdnîşîn û tradîsyona perwerdehiya medreseyê ku zimanê kurdî jî tê de dihate fêrkirin, tesîra xwe li ser dehsalên piştî xwe jî hiştiye. Bîra xurt a bajêr a di derbarê alim û nivîskarên kurd de û kelepûra ji mîrekiyê mabû li Bazîdê her tim zindî ma û vê jî rê li ber pêkhatina berdewamiya kurdînişîyê li dorhêla medreseyê vekir.

Bi vî rengî ji Ehmedê Xanî heta Îsmailê Bazîdî, ji wir heta Miradxanê Bazîdî û Mela Mehmûdê Bazîdî, Şêx Muhemmed Celalî û Xelîfe Yusif bigre heta Mela Musa Celalî bi sedsalan berdewamiyeke kurdînişîyê di nav alim û nivîskarên kurdan de hebûye. Eger dewreke wiha bitalûke û zehmet de Xelîfe bi kurdînişîyê de israr kiribe, mirov nikare motîvasyon û îlhama wî ya ku ji faktorên navborî tê, piştguh bike. Ji xwe di helbestên wî de jî mirov pêngî van rastiyan tê.

Xelîfe, li ber destên alimên cuda cuda, perwerdehiya xwe ya medreseyê kuta dike û ilm û zimanên ku di medreseyê de tê fêrkirin, bi dest dixê. Di medreseyan de kitabên wekî Mem û Zîn, Nûbihara Biçûkan û Nehcul Enam, Mewlûda Bateyî dixwîne û hînî nivîsandina kurmancî dibe. Di teqrîza xwe de jî van çavkaniyên sereke yê medreseya kurdî referans digire û wekî nîşaneyê hêjabûnê ya zimanê kurdî mînak dide.

Mirov di helbesta Xelîfe de rastî zimanekî hêsa tê ku mebest jê ji hunerên edebî wêdetir, têgihîştina xwîneran e. Ango zimanê wî hêsa ye û li gor asta zimanê gel e. Lê hewce ye ku li vir bê diyarkirin ku uslûba wî tund û tûj e, gelek caran ber bi dijûn û heqaretê ve diçe, pênuşa wî. Tundbûna zimanê helbestvan ji helwesta wî ya kurdînûs/kurdîheziyê tê. Mijarên cihêreng di berhemên xwe de bi kar tîne, lê zêdetir ilmen dîni cih digirin di pirtûkên wî de. Teqrîza xwe de jî vê yeke didomîne.

Zimanê kurdî ji bo Xelîfe xwedî cihekî taybet e û ew vê yekê hem di tevahiya teqrîzê de hem jî di destpêk an jî encama berhemên xwe yê din de eşkere dike. Nivîsandina berhema kurdî wekî mizginî dide gelê kurd û ev mizginî jiholêrabûna astengiyên li ber xwendin û fêrbûna gelê kurd dibine. Ligel qedexeyên giran ên serdema xwe berhemên xwe bi kurdî dinivîse û dide çap kirin. Xelîfe bi vî awayî qîmetdayîna zimanê kurdî nîşanê me dide.

5. WÊJENAS Û KLASÎKÊN KU LI SER XELÎFE YÛSIF TESÎR KIRINE

Wekî gelek kesan Xelîfe jî, di bin tesîra çend otorîteyên wêjeya kurdî ya klasîk; Ehmedê Xanî,¹²⁴ Mela Huseynê Bateyî¹²⁵ û Mela Xelîlê Sêrtî¹²⁶ de maye. Di Teqrîza

¹²⁴ Ehmedê Xanî, di sala 1061ê hîcrî de ku beramberî sala 1951ê mîladî tê, li Bazîdê hatiye dunyayê. Di sala 1121/1709an de 57 salî li Bazîdê wefat kiriye. Nivîskarê berhemên wekî Nûbihara Biçûkan, Eqîdeya Îmanê û Mem û Zînê ye. Lê Diwaneke wî jî heye ku helbestên wî yê cihêreng di hundirîne. Bi van berhemên xwe ve heta îro tesîreke girîng li ser gelê kurd hiştiye û xuya dike ku ev bandor dê gelek salan berdewam be. Ji bona agahiyên zêdetir bnr. Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn (Metnê Kurdî & Tirkî)*, Cizre Kaymakamlığı Yayınları, İstanbul 2016. r. 5-6; Kadîr Yıldırım, *Ehmedê Xanî'nin Fikir Dünyası*, AKYAD, Ağrı, 2008. r. 23-55.

¹²⁵ Mela Huseynê Bateyî, nivîskarê yekem e ku bi navê Mewlûdê berhemek nivîsiye. Mela Huseynê Bateyî di sedsala XVIIan û XVIIIan de jiyaye û 65-75 sal emir kiriye. Xeynî Mewlûdê bi navê Hemaîl, Zembîlfiroş du berhemên wî yê din jî hene. Her wiha xeynî van ji 30î zêdetir helbestên wî jî hene ku ji aliye hin nivîskarên ve wek berhemekî hatine çapkirin. Ji bona agahiyên zêdetir bnr. Ziver İlhan, *Mewlûda Mela Huseynê Bateyî (Metn û Lêkolîn)*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn 2013. r. 5-14.

¹²⁶ Mela Xelîl Sêrtî, di çavkaniyan de di derheqê tarixê jidayikbûn û wefata wî de îxtilaf hebe jî sala jidayikbûna wekî 1750-1751î û sala wefata wî jî wekî 1843î tê diyarkirin. Bi eslê xwe jî gundê

Xelîfe de ev karîgerî baştir xuya dibe. Li jêr, me hewl daye ku vê bandorê tespît bikin. Vêca, wekî rêbaz me bandora heryekî di bin sê xalan de destnîşan kiriye.

a) Nazîreyên ku Xelîfe li ser helbestên wan nivîsiye.

b) Behskirina navê wan.

c) Wekhevî û şibandina îbare û risteyan.

5.1. Ehmedê Xanî

Li vir jî, em ê li bandora Xanî ya li ser Xelîfe rawestin. Di hemû *Teqrîzê* de û berhema wî ya bi navê *Tuhfetu'l Sibyan* de karîgeriya Xanî berbiçav xuya dike. Lê ev tesir bi van herdu berheman tenê nebûye, her wiha di kurdî/kurmancînûsiya Xelîfe de Xanî wekî helwestekî bibandor e. Xelîfe di destpêka *Teqrîzê* de bi çavekî etîk li kurdî/kurmancî û zanebûnê dinêre. Paşê behsa girîngiya ziman û wêjeya kurdî dike. Lê hîpoteza xwe bêbingeh nahêle, xwe dispêre nivîskarên kurd yê klasîk. Wekî mînak di malika 23an a *Taqrîzê* de navê Ehmedê Xanî û ya 24an de jî navê çend berhemên Xanî derbas dibin;

Meger kor î, bi kurmancî nizanî

Çend kitab gotine **Ehmedê Xanî**

(I/23)

Xelîfe li gor şert û mercên serdema xwe *Yûsûf û Zuleyxa* wek berhemeke Ehmedê Xanî zanibûye û her wiha di malika jêrîn de jî vê tîne ser zimên. Me ewil jî ev mijar zelal

Gulpîkê ye ku ev gund li ser Hîzana Bedlîsê ve ye. Li ser navê wî yê Mollâ Xelîl es-Si'îrdî îxtîlaf nîne ku hem li ser berhemên xwe navê xwe bi vê formê nivîsiye hem jî xebatên li ser wî hatine amadekirin de wekî forma jorîn derbas dibe. Bi mexlesên Şewqî û Xelîl jî tê naskirin. Ji xeynî Nehcu'l-Enama wî nêzî 30î berhemên wî hene. Ji bona agahiyên zêdetir bnr. İbrahim Gözetin, *Mele Xelîlê Sêrtî û Berhema Wî ya Nehcu'l-Enam (Metn û Lêkolîn)*, Teza Lisansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mûşê, Mûş 2015. r. 15-28.

kiribû ku lêkolînên van salên dawiyê de teqez nîşan dane ku ev berhema ya Selîmê Hîzanî ye.¹²⁷

Yûsuf (û) Zuleyxa û Mem û Zîn

Nûbihara fesîh bi elfazê şekirîn

(I/24)

5.2. Mela Xelîlê Sêrtî

Di jiyana Xelîfe de cihê Mela Xelîlê Sertî jî cihekî girîng digire. Ji ber ku, dema piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn malbata Xelîfe ber bi başûr ve koç dikin û li bajarê Sêrtê cih dibin. Li Sêrtê Xelîfe xwendina xwe ya medreseyê di medreseya Mela Hemîd de didomîne ku ew bi xwe kurê Mela Xelîlê Sêrtî ye.¹²⁸ Ango Xelîfe çawa ku ji ekola Xanî bêpar nemabû her wiha ji ekola Sêrtî jî sûd wergirtiye. Di Teqrîzê de karîgeriya Mela Xelîl, di malika jêr de jî xwe nîşan dide;

Bizanî tu **Nehcul Enam** celîl e

Bi kurmancî te' lîfa **Mele Xelîl** e

(I/25)

Lê divê bê gotin ku Xelîfe van klasîkên kurdî û berhemên wan ji bona kesên ku zimanê kurdî hêjayî berhemdariyê nabînin, bilêv dike.

5.3. Melayê Bateyî

Nivîskarê *Mewlûdê* Mela Huseynê Bateyî di nava tradisyona medreseye de û wêjeya kurdî ya klasîk de xwedî nav û dengê mezî e. Ji ber vê yekê gelek wek referans navê wî bi lêv kirine û jê sûd wergirtine.¹²⁹ Xelîfe jî di Teqrîza xwe de çawa kul i jor jî me behs kiribû, navê Melayê Bateyî û Mewlûda wî wek nîşaneyê pêşveçûna ziman

¹²⁷ Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Kadîr Yıldırım, *Êhmedê Xanî'nin Fikir Dünyası*, AKYAD, Ağrı, 2008; Selîmê Hîzanî, *Yûsuf û Zuleyxa*, (Edisyon, Krîtîk Amadekarî Ayhan Gevêrî), Weşanên Nûbihar, Stenbol 2013.

¹²⁸ Nacî Kutlay, *21. Yüzyıla Girerken Kürtler*, Pêri Yayınları, İstanbul 2011. r.

¹²⁹ İlhan, Zîver, *Mewlûda Mela Huseynê Bateyî (Metn û Lêkolîn)*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn 2013. r.

û derfetên zimanê kurdî zikir dike. Ango ya girîng wate û peyam e, lê ger bi zimanê zikmakî derfêt hebin divê ew delîve baş bên bi kar anîn.

Ne **Şêx(ê) Bate** xwedan qelbê munewer

Bi kurmancî gotiye **Mewlûda Pêxember**

(I/26)

BEŞA ÇAREM

NIRXANDINEK LI SER NAVEROKA TEQRÎZÊ

Wek gelek alimên medreseyan mebesta Xelîfe Yûsif jî fêrkirina ilmê û xwendin û femkirina dînê Îslamê ye. Ji bona vê yekê hemû berhemên xwe bi vê ramanê amade kiriye û gelek caran di nav berhemên xwe de –bi taybetî jî di Teqrîzê de- ev niyeta xwe eşkere kiriye. Di risteyên Teqrîzê de ev xal baştirîn xuya dike. Xelîfe her tim girîngiya xwendina ilmê, xwendina zanistên dînî, hûrguliyên dînê Îslamê dubare dike û dixwaze ku ji aliyê her kesî ve jî bê zanîn. Li gor wî ya herî girîng wate û ‘emel e. Ya herî girîng ew e ku, rastiyên dînî -bi çi zimanî hatibe nivîsandin- ûpeyama Xwedê Teala ji qûlên xwe re şandiye baş bê fem kirin û pê ‘emel bê kirin. Lewma Xelîfe dide diyar kirin ku zanîna ilmê tena serê xwe bes nîne, divê bi wê zanîne ‘emel jî pê bê kirin.

Bi vî awayî di Teqrîzê de Xweda (c.c), Qur’an, Hz. Mihemed (s.x.l), hin pêxemberên din, alimên navdar, hêmanên dînî û hwd hatine bi kar anîn.

1. HÊMANÊN DÎNÎ

1.1. Xwedê

Xwedê Teala (c.c.) ne wekî hêmayên dinêye ku mirov bi hin malikan mînakên bide. Ji xwe di seranserê Teqrîzê de hemd û sena ji bona Xwedê tê xwestin û Xelîfe dixwaze ku bi rêya berhemên xwe yên dînî ve peyamên Xweda ji bawermendan re bide zelal kirin û wan fêr bike.

1.2. Pirtûkên Pîroz (Qur’an û Tewrat)

Di teqrîzê de navê du pirtûkên pîroz derbas dibe; Qur’an û Tewrat.

Qur’an

Ji ber ku di tevahiya berhemên Xelîfe û di Teqrîzê de mebesta nivîskar a sereke, ravekirin û têgihîştandina Qur’anê û rastiyên ola Îslamê ye, em ê di vir de zêde li ser vê babetê nesekinin. Em ê tenê malika ku têgeha ‘Qur’an’ê dibore li jêr nîşan bidin.

Ewel bixwîne **Qur’ana** ‘ezîm ji ezber

Paşê li pey wî ‘Irşad’ul ‘Ibad çend per

(IV/55)

Tewrat

Pirtûka pîroz ya ola cihûtiyê di Teqrîzê de carekî tenê dibore. Di malika jêrîn de Xelife bi gelek şîretan kesên serhişk vedixwîne ser riya rast û dixwaze peyama xwe bigihîne wan. Lê Xelîfe dawîya peyama xwe bi Tewratê dide sekinandin, ger kesên ku nexwazin ji berhemên wî yên olî û rastiyan Îslamê fem bikin, ji Tewratê jî şîretan bike bêfeyde ye;

Ev qeder kafî ye ji bo te, eger bizanî
Wer ne, **Tewratê** ji te ra bêjim dîsa nizanî

(III/25)

1.3. Pêxember

Teqrîzê de navê sê pêxemberan drbas dibe: Hz Mihemed (s.x.1), Hz. Yûsif, Hz. Silêman.

Hz. Mihemed (s.x.1)

Wek gelek klasîkên kurdî di Teqrîzê de jî rêz û hurmeteke mezin ji bona pêxemberê ola Îslamê Hz. Mihemed (s.x.1.) tê nîşankirin. Di destpêka Teqrîzê de selat û selamê ev rêzgirtinm dest pê dike;

Sed hezar salat û selam her zemana
Li ser **Wî** al û eshaba, her wext û hîn û ana

(XII)

Lewra ew şerî'eta şemsê cîhan e
Hezretî **Muhemed** xatemê enbiyan e

(I/12)

Her wiha di gelek cihan de jî pêxember bi navê wî yê Mistefa bi lêv kiriye;

Gerçi ew darek kêmbiha ye
Lakîn semerê wê şer'a **Mistefa** ye

(I/12)

'Irşad'ul 'Ibad şer'a terîqa **Mistefa** ye

Ji bo ehlê ta'et her wek fener û çira ye

(VIII/1)

Hînga şek û mereza qelbê wan şifa be

Meger dewa û derman ji nezera **Hezretî Mistefa** be

(IX/13)

H.z. Silêman

Xelîfe ji bona hewcedarî û hêjabûna ilmê Erebi nîşan bide, ilmê 'erebi dişibîne gustîla H.z. Silêman. Gustîla H.z. Silêman ne ku gustîleke asa û sade bû, ew di heman deme de mohr bû, nîşaneyê hêz û quweteke mezintirîn bû ku bi wê gustîlê hukm li ser hemû cîhanê dikir. Li gor rîwayetan li ser vê mohrê 'milk ên Xweda ye' hatibû nivîsandin û ji aliyê H.z. Cebraîl ve gihîştibû destê H.z. Silêman. Xelîfe bi vê mînakê girîngiya ilmê erebi û qîmeta wê nîşanê me dide.¹³⁰

'Ilmê 'erebi qîmetgiran e

Qenctir e, ji xatema **Suleyman** e

Tu ku neşê, bigrî evî erzanî

Çi la'îqî xatema **Suleyman î**

(I/36 û 39)

H.z. Yûsif

Çawa ku tê zanîn H.z. Yûsif xwediyê bedewî û qeşengiyeke bêmîsal bû û pêxemberiya wî jî digel exlaqê wî ye bedew, bi vê çelengiya wî ve jê re bibû muyeser. Xelîfe jî dema ku şîretê li aliman û misilmanan dike, wan kesan dişibîne maşûq û aşiq, ango Zuleyxa û Yûsif. Ê dibêje ku eger hûn Qur'an, şerîet û ilmê

¹³⁰ H.z. Silêman hem di cihûtiyê de hem jî Îslamê de xwedî cihekî girîng e. Li gor baweriya Îslamê hukmê wî hem di dîn de hem jî dunyayê de derbas dibe. Di gelek ayetên Qur'anê de navê H.z. Silêman dibore; Enbiya (21), 78-82; Naml (27), 17-19; Sad (38), 35-36; Nisa (4), 163; En'am (6), 84. Ji bona agahiyên zêdetir bnr. Elif Akkaya, *Kitab-ı Mukaddes ve Kur'an-ı Kerim Çerçevesinde H.z. Süleyman*, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Ankara Üniversitesi, Ankara 2003, r. 63.

nexwînin û rû jê vegerînin hûn dê kor bin wekî Zuleyxa yê û Yûsif jî nema bibinin.¹³¹

Lewra bi dîtina **husn û cemalê**

'**Aşiq û me'sûq** têne xiyalê

Ey korê xwedan heşret û te'suf

Wî mehrûmê ji dîtina cemala **Yûsûf**

(IV/8-9)

1.6. Mezheb û Alimên Mezheban

Ebû Hanîfe/Îmam-i Âzam, Ebû Yûsuf û Muhammed b. Hasan eş-Şeybânî

Teqrîzê de di malika jêrîn de navê sê kesan derbas dibe û tê zanîn ku ev her sê alim di avakirina serkaniya mezhebe Henîfîtiyê de pêşeng in.

Babê nikahe çî babek melîh e

Ji mezhebê **Muhammed, Yûsûf [û] Ebî Henîfe**

(X/3)

Nêrîna Xelîfe li Ser Mezheban

Piraniya gelê kurd piştî pejirandina dînê Îslamê û pêkhatina mezheban, mezhebê Şafîtiyê qebûl kirine û heta îro jî bi vî awayî di nav kurdan de ev mezheb berbelav e. Di medreseyan kurdistanê de jî perwerdehî li gor mezahîbê Şafîtiyê dihat meşandin. Xelîfe jî li gor îtiqadê li ser mezhebe Şafîtiyê bû.¹³² Lê di teqrîzê de ji mînakên jêrîn jî diyar dibe ku di emel de rê li ber sûdwegirtina mezhebên din, ango Henîfîtiyê vekirîye. Ji ber ku emelkirina tenê bi mezhebekî dijwar û zehmet e, lewma hewce ye ku hin caran jî mezhebe din jî emel bê kirin.

Babê nikahe çî babek melîh e

Ji mezhebê **Muhammed, Yûsûf [û] Ebî Henîfe**

¹³¹ Ji bona agahiyên zêdetir bnr. <https://tr.wikipedia.org/wiki/HzYusuf>, Mêjûya Ragihandinê: 3ê Cotmeh 2016.

¹³² *Hevdîtin Bi Nevîyê Xelîfe Yûsif–Mela Ebdullah Tanrıverdi- re*, Bazîd, 3ê Îlonê 2016.

Ev mezheb, serdarê cumle mezahîb

‘Amil in bi wî, ehle meşarîk û megarîb

Kes nikare ‘emel bi **mezhebê** xwe carek

Teqlîd bike bi vî **mezhebê** mubarek

Ew ê derkeve ji werçeya bela’ê

Ji Xwedê ra hemd [û] **senaê**, ji me ra bike du‘a’ê

Belkî bi wî du‘a’ê mustecab û mubarek

Cera’imê me Xweda ‘efû bike bi carek

1.7. Hin Alim û Kesayetên Navdar

Dîsa di teqrîzê de em pêrgî hin nava tên ku bi kar anîn û mînakdayîna wan nîşaneyê xurtbûnê ya zanebûn û ilmê Xelîfe ne. Di mînakdayîna van kesayetên navdar de hem peyamên erênî hem jî neyînî hene.

Xewsê Geylan

Ewil jî hatibû gotin ku Xelîfe Yûsif du caran ji terîqeta Neqşîbendiyê îcaze girtiye û nasnavê ‘xelîfe’ jî ji vê taybetiya wî lê hatiye danîn. Çawa kut ê zanîn Xewsê Azam Ebdulqadirê Geylanî serkaniya terîqeta neqşîbendiyê¹³³ ye û xuya ye di malika jêrîn de Xelîfe xwestiye li ser Xews merama xwe nîşan bide. Lewma Xelîfe dema ku kesên navmela û durû rexne dike, dibêje bi sere pîrê xwe xewsê xwe sond dixwin, lê pîrê wan Xews nîne, belkî şeytan be.

Zen neke ku ew pîr **Ĝewsê Geylan** e

Lewra **Ĝews** pîrê şeyx û ewliya ne

(XI/21)

¹³³ Ji bona agahiyên zêdetir bnr. <https://tr.wikipedia.org/wiki/gavs>, Mêjûya Ragihandinê: 3ê Cotmeh 2016.

Loqmanê Hekîm

Loqman Hekîm kesayetekî navdar e ku li rojhilatê xwedî cihekî taybet e. Her wiha di Qur'anê de sûreya Loqman de behsa wî tê kirin û ji sûreyê jî tê dîtin ku ilm û hikmeta wî ji teref Xwedê Teala (c.c) ve hatiye dayîn. Xelîfe ji bona îxtîlaf û çavnebariya gelê kurd ku nexweşiyêke xeter e, di van malikên jêrîn de navê Loqmanê Hekîm mînak dide. Ango ew kesên ku zimanê xwe biçûk û bêqîmet dibinin û dema mijarekê ji kurdî/kurmancî dibîbin rûyê xwe tîrş dikin û aciz dibin, ji şifaya bijîşkê navdar –Loqmanê Hekîm- jî were faîde nake ji wan re.

Ev kar e, ji bo kesê kêr 'aql û noqşan
Dûr jê herin gerçi bibe **Hekîmê Loqman**

Ji bê edeba kemalê neke hêvî û guman
Gerçi bibin şagirdê Eflaûn [û] **Hekîmê Loqman**
(IX/9 û 11)

Wan himet û nufûsê şifa'ê cumle derdan e
Çêtir in ji dermanê **Hekîmê Loqman** e
(XI/8)

Museylemet'ul Kezab

Museylemet'ul Kezab (Mesleme bin Habîl ?-633), Pêxemberê derewkar ê navdar. Bi mexlesa kezab –ango yê ku dikare bi hêsanî derewa bike- hatiye nas kirin. Xwe wek pêxemberekî daye nas kirin û seba binê vê îdiaya xwe dagire jî hewl daye ku hin mûcîzeyan nişan bide. Her çiqas bi ser neketibe jî li hawirdora xwe gelek mirov kom kiriye û gelek kes pê xapiyane. Piştî wefata Hz. Mihemed di dewra Xîlafeta Ebubekir de û di şerê Yemamê de tê kuştin.¹³⁴

Bi tifa zalimê **Museylemet'ul Kezab**
Çav kor bû, di bîrê de nema qetrek ab
(XI/16)

¹³⁴ Bnr. <http://rehber.ihya.org/yenirehber/museylemet-ul-kezzab.html>, Mêjûyê Ragihandinê: 12.09.2016.

1.8. Iblîs (Şeytan)

Şeytan ji aliyê Xelîfe ve di teqrîzê de neh caran bi forma şeytan/şeyatîn/îblîs hatiye bi kar anîn. Şeytan wekî lehengê xirabiyê di edebiyatê de hêmaneke girîng e ku tê tercih kirin. Xelîfe îbadeta ku bêilm û zanîn jî badilhewa dibine û wekî xebatkariya xizmeta şeytan teswîr dike. Li gor wî ilmê bi emel li hemberî cehalet û şeytan amûrekî şer e û laîqê kesên ciwan û merd e. Ew cihê ku ilm û zanîn lê tunebe ew baxçeyê şeytan e. Ku kesek bi ilm îbadet neke hevalê wî jî dîsa îblîs e. Heta ew kesên xwe wek alim bi nav dikin û bi hîlekarî dimeşin, ji şeytana jî kêmtir û bêqîmettir in.

Lewra ta'etê bê 'ilm û zanîn beçal e

Ji xizmeta **şeytan** ra nebe tu pale

(IV/57)

'İlmê şerîf sîlaħa şerê **şeytan** e

La'îqê merd û mêrê nûcîwan e

(VI/7)

Haşa! Ciyê bê 'ilm bibe ocağ e

Belkî ji bo **şeytanê îblîs** ra bostan û bağ e

Çi kesê ku nufûsê wan xebîş in

Bê ta'e[t] ew refîqê **îblîs** in

Ew xebîşê ku navê xwe danîne dîwane

Erwahêd wan **şeytan** in, eger çi însan xuya ne

Haşa! Ew ne pîr û şêx[ê] parsgiran e

Belkî pîrê her yek ji wan şêsid **şeytan** e

Zehmet bibare li wan digel pîrê wan

Şeytan serwerê hemû tebdîrê wan

Ekşerê van kezab [û] xebîşê bêdîn

Xirabtir in ji şed hezar cin û şeyatîn
(XI/6,17,19,22,24 û 26)

2. DUA, ŞÎRET Û DIJÛN

2.1. Dua

Dua hêmaneke girîng e di helbesta kurdî ya klasîk de. Xelîfe jî di Teqrîzê de ev edet domandiye. Ji xwe mebesta helbestvan ya bingehîn ew e ku dînê Îslamê û peyama Qur'anê baş bê fem kirin. Ji ber vê yeke her tim selat û selaman bilêv dike.

Şed hezar şalat û selam her zemana
Li ser wî âl û eşaba her wext [û] hin [û] a'na
(XII)

Çi xweş la'îq e, ji wî ra 'imamet
Xwedê bide wî bext hem sa'edet

Xwedê bide wî tewfîq û hîdayet
Refîqê wî bike nuşret [û] 'îneyet

Xwedê bide wî 'ilm [û] 'emelek bênîhayet
Xelqê bi 'ilmê wî bike hîdayet

Me divê da'ima ku hûn wisa bin
'Emel bikin ber li dergahê Xweda bin

Berê ji Xwedê ra bikin medh û şena'ê
Paşê destê xwe hildin ji me ra bikin du'a'ê
(I/45,46,47,49)

Ya Rebb! Bi cah [û] hürmeta wî Hebîbî
Işlaħa me bikî bi şefa'eta wî tebîbî

Me bikî salikê terîqeta wî
Bikî 'amil bi ferman û şerî'eta wî

Setr bike li me cumle ‘eyb û ‘ar î
Bi şefa‘eta wî xilaş bibin ji narî

Li ser wî hem al û eşhabê mubarek
Hezar şelat û selam, her lehze bi carek

(VII/20-23)

Ya Reb bike me‘lûl û zelîl wan bi carek
Hefz bikî ji şerrê wan vê umeta ‘ezîz [û] mubarek

(VIII/12)

Bêje: “Ez gunehkar im, Tu qenc dizanî
Qebûl bike bi rehma xwe du‘a‘ê min nezanî”

(XI/18)

Ya Rebî bike me‘lûl û zelîl wan bi carek
Hifz bike ji şerê wan vê ‘umeta ‘ezîz û mubarek

(XI/27)

Li ser erwahêd wanê mubarek
Rehmeta Xweda be, hezar car ne carek

Rehm bike ew Xweda li me gunehkara
Setr bike ‘uyûbê me rûsiyah û jara

(X/4,13)

2.2. Şîret

Me ji bona mînakdayîna malikên şîretê 18 heb malik jibart ji teqrîzê. Lê bi ya me di seranserê teqrîzê de şîret hêmaneke sereke ye. Ji xwe mebesta Xelîfe ew bû ku, bi rêya berhemên xwe ve misilmanan vexwîne rastiyên dînê Îslamê û peyama Qur’anê.

Ger te bivê meraza cehlê ji te be zaîl
Ji çerîqa musteqîm nebî tu maîl

Bi destê xwe bîne tu 'Irşad'ul Îbadê [û] Mecme'ul Mesaîl
Şev û roj ji xwe ra bike baz û bend [û] hemaîl

Guh nede wî cahilî, wî bêedebî
Ku dibêje 'ilm nîn e ji xeyrî 'erebî
(I/1-3)

Lazim e ji wî şemerî nebî tu gafil
Gerçi tu yî xwedan îdrak û 'aqil

Wacib e tu cehdê bikî zû wan bizanî
Xaşma di vî axira zeman î

Tu ku neşê, bigrî evî erzanî
Çi la'îqî xatema Suleyman î

Ger te hebûya 'aql û kiyaset
Te yê wê bixwenda her wext [û] se'et

Tu qedrê kitêba xwe qenc bizane
Nebê kurmancî ye, kes qedrê wê nizane
(I/13,31,40,42)

Ey kesê ku hûn 'ummî [û] nezan in
'Ihsanek 'ezîm ji Xwedê ger hûn bizanin
(II/1)

Tu nezer ke bira, li vê kîtabê
Bi 'eynê îşlahê, ne ya 'îtabê

Tu te'mul bike, di wî da bi dil û can
Îşlah bike ji wî xeṭa û nîsyân

Ey kesê muflîs, ku te sermaye nîn e
Qeṭ na, cehd bike ewan bi destê xwe bîne

Ger terk bikî ewan jî di vî zemanî
Heyata wî yê telef bibe, bi cehl û nezanî

Bi gotina wan lazim e bibî tu zakir
Nebê ketm bikî, cihê xwe bikî tu 'agir

Wî kesî li pêgember ezîyet û cefa kir
Ku emrê wî teblîg nekir, bi wî ra bêwefa kir

Çi kesê ne teblîg û ne xizmet eda kir
Ew ê bê gemkirin, yeqîn bilîcamê 'agir

Heta tu nekî ewan tekrar û ezber
Ne la'îq e, tu bibî îmam û serwer

(III/1,2,6,7,10,11,12,13)

Ger te bivê, du'a'ê te jî bo mereza şifa be
Ta'et bike, da'îma raci'ê dergehê Xweda be

(XI/17)

2.3. Dijûn

Ji seranserê teqrîzê de xuya dike ku Xelîfe mirovekî rastgo ye û ji bona vê rastbûna xwe jî xwe ji hin gotinan dûrnaxe. Di Teqrîza xwe de carna tundtir dibe û wek malika jêrê eşkerê gotinên xwe vedibêje. Temla wî li hember durûtfî û derewkariyê tune ye. Divê kesê ku navê zanebûn û 'alimbûnê li ser xwe xist, li gorê wê jiyana xwe bidomîne. Li gor wî, hîlekarî û derewkarî ne kirasê 'aliman e. Ji ber ku me di beşa şibandin û mînakên ajalan di teqrîzê de bi berfirehî mînak daye, lewma em ê di vir de tenê bi mînaka jêrîn rawestin.

Bi dest û devê xwe girtine **kîrê** xwe
Da'îm şond dixwin bi serê pîrê xwe

(XI/20)

3.2. ŞİBANDIN Û MÎNAKÊN AJALAN DI TEQRÎZÊ DE

Ger yek funûnê hemû ‘ilma bizane
Dema ‘emel pê neke, **heywanek** nezan e

Bedcewher e, însan ji wî çê nabe
Wekî kerê ku barê wî tamam kîtab e

(VI/1-2)

Navê ajalên ku di Teqrîzê de derbas dibin ev in: Ker, rovî, kûçik (kelb, se, sa), şêr, piling, gakovî, mirîşk, mişk, mêşa hingivê. Ev ajal di gelek ristan de ji bona şibandînê hatine bi kar anîn. Û Xelîfe ev ajal wek mînak ji bona peyama xwe dîtiye, vegotina xwe bi vî awayî xurtir kiriye.

Xelîfe hem di serdema xwe ya Bazîdê de, hem serdema Sêrtê de hem jî serdema Cizîrê de her tim di nava jiyana gundewariyê de bûye. Vê yeke jî karigeriyeke mezin li ser wî û zimanê wî hiştiye. Mebesta helbestên xwe bi sembolên ajalî xemilandiye û bi ya me ev yek asta helbesta wî bilintir dike.

3.2.1. Şêr

Şêr bi xwîdana eniya xwe û quweta xwe ve meşhûr e. Çawa ku me li jor jî diyar kir, Xelîfe di Teqrîzê de şêr berawirdê rovî kiriye. Armanca wî nîşankirina hêza şêr e. Di wêjeyê de ev rêgezeke balkêş e û Xelîfe jî ev rêbaz serkeftî bi kar aniye. Xwestiye ku kesên wek şêran bipesîne û cihê wan diyar bike. Rexneya xwe jî li ser vê berawirdkirinê ava dike. Dîsa li pêşberî tîrên wî şêxên derewkar heye. Xelîfe wan şêxan vedixwîne meydanê da ku ‘ilm û hunera xwe nîşan bidin. Hîlekarî û derewkariyê layîqê kesên sahibhuner nabîne.

Ger tu **şêhr** î, meydana herba şêhra veke

Ger tu rovî yî, de‘wa meydana **şêhrtiyê** meke

Ger tu **şêhrekî** namîdar î

Ne la’îqî te ye, kîzb û hîlekarî

Ger tu **şêhr** î, şahîbhuner î
Qewlek heq bibêje, heta ku biçite serî

Lewra ev meydan cihê piling û **şêhran** e
Ne meydana roviyê malikwêran e

Eger tu roviyê ze‘îf û jar î
Ne’ê meydana piling û **şêhra**, tu şermesar î

Roviyê ku kêmquwet û natemam e
Sekna li meydana piling û **şêhra** heram e

Nêçîr û xwarina **şêhra** gayê kovî ye
Mirîşk û mişk, seyde û nêçîra rovî ye

(IV/19-25)

3.2.2. Piling

Piling jî wek şêr di helbestê de nîşaneyê xurtbûn û hêzbûnê ye. Her wiha wêrekî jî xala bingehîn a vê şibandîne ye.

Lewra ev meydan cihê **piling** û şêhran e
Ne meydana roviyê malikwêran e
(IV/22)

3.2.3. Gakovî

Çawa ku di zargotin û destanên kurdî yê wekî Siyabend û Xecê û yê mayîn de jî derbas dibe, gakovî di nava folklorê kurdî de xwedî cihekî girîng e. Di Teqrîzê de jî cihê xwe girtiye. Dema ku Xelîfe kesên ku haja wan ji ‘ilmê nîne û niyeta wan zanîna wê jî tune ye şermezar dike, yê ku bi hişmendî û bi feraset ‘ilm dixwînin û li ser rîya heq dimeşin wan a dişibîne şêra û şîva wan jî wek gakovî diyar dike.

Nêçîr û xwarina şêra **gayê kovî** ye
Mirîşk û mişk, seyde û nêçîra rovî ye
(IV/25)

3.2.4. Deve

Deve tenê carekî derbas dibe. Ew malika ku jêrê jî hatiye nivîsîn wek dawiya peyamê ye û mebest jê bêdelîvebûna du têgehane. Kesên ku ji şîret û gotinan tiştêkî tê nagîhîjin divê mirov li hemberê wan lal bimîne û êdî bersiva wan nede. Ji ber ku li bazara mirîşka deve nayê firotin, cihê her pêdiviyê cuda ye.

Ji bo mu'anîda fa'îde ew e, negotin

Li sûka mirîşka **deve** na'ê firotin

(II/22)

3.2.5. Ker/Guhdirêj

Teqrîzê de heşt caran peyva 'ker'ê carek jî 'guhdirêj' derbas dibe. Xelîfe rexneya xwe zêdetir bi vê sembolê aniye zimên. Rexneya ku li dijberê ew kesên ku kurdî/kurmancî wek zimanekî bi rek û pek nahesibînin û ew şêxên durû û derewkar in, bi kar aniye.

Kesê ku wiha fehm neke, ew nezan e

Ew ne însan e, **kerek** xwedan palan e

Kerê reş ji wî çêtir bizane

Ger guh piçûk e, ne wekî keran e

Guhê **kerê** li ser serê wî da ne

Kerbûna wî da qenc bibe 'eyan e

(I/14-17)

Meriv bi ta'etê Xwedê tamam însan e

Wer ne, xûn û goşt zehftir digel **keran** e

(IV/49)

Ji bo wan wareng elem xuya e

Zen dikin li wan rabûye sereca **kera** ye

(VIII/7)

Çawa ku me dîsa bilêv kiribû, Xelîfe rexneya xwe di şibandinên ajalî de daye xuya kirin. Di vir de asta gotina xwe girantir dike û kesên ku xwendî û zane bin, lê bi wê 'ilma xwe netevgerin, di navbera wan kesan û keran de cudahiye tune ye. Ew kes wek ajalekî ku pirtûk lê bar kirî ye.

Bedcewher e, însan ji wî çê nabe

Wekî **kerê** ku barê wî tamam kîtab e

(VI/2)

Di hin cihan de jî Xelîfe dewsa peyva ker ê, têgeha guhdirêj bi kar tîne. Guhdirêj ji taybetiya kerê ya guhên dirêj darijiye, lê divê bê diyarkirin di axaftinê de guhdirêj wateya xwe nermtir û kubartir dike. L1 devera Serhedê di nava gel de peyveke berbelav e û bi ya me gelek resen e.

Ey kesê xebî tu ne **guhdirêjî**

Ma tu fetwa bi xelqê re bi 'erebî dibêjî

(I/18)

3.2.6. Rovî

Rovî bi hîlekariya xwe ve navdar e û di nava civaka kurdî de jî ev taybetiya wî her tim ji bo kesên fesad û bêhêz bûye semboleke balkêş, ew kes wek rovî hatiye şibandin.¹³⁵ Di Teqrîzê de jî em dibinin ku Xelîfe rovî her tim dijwateya şêr derxistiye pêş. Xwestiya ku divê kesê ku wek rovî bêhêz be, divê dernekeve meydana şêran. Lewre qada şêran cihê quwet û îqtîdarê ye, ji ber vê yeke jî nêçîra baş gakovî mafê şêran e. Li gor lawazbûna xwe, bêhêziya xwe divê rovî qîma xwe bi mirîşk û mişkan bîne. Xercê wî tenê ew in.

Xelîfe di gelek cihan de bi vî awayî rovî berawirdê şêr dike. Ev tenê şerekî şênber nîne bêguman. Şêrê rastî û derewê; zanistî û nezaniyê; îqtîdar û bêhêziyê; hişmendî û bêfemiyê ye.

Ger tu şêhr î, meydana herba şêhra veke

¹³⁵ Ji bona agahiyên zêdetir bnr. <https://tr.wikipedia.org/wiki/kurnaztilki>, Mêjûya Ragihandinê: 3ê Cotmeh 2016.

Ger tu **rovî** yî, de‘wa meydana şêhrtiyê meke
(IV/19)

Nêçîr û xwarina şêhra gayê kovî ye
Mirîşk û mişk, şeyd û nêçîra **rovî** ye
(IV/25)

3.2.7. Mirîşk

Di jiyana gundan de agahiyeke berbelav e ku dema rovî ji ber birçîbûna xwe dikevî nava gund, ewil ber bi pûnika/lîsika mirîşkan ve dimeşin. Ango ew xwe hêjayê vê xwarinê dibinin. Di vê mînaka Xelîfe de jî mebest ji roviyan ew kesên bi nav ‘alim lê bi tevger û zanebûnê cahilin. Ew kes tenezulê malê dunyayê dikin û armanca wan rîya heq nîne.

Nêçîr û xwarina şêhra gayê kovî ye
Mirîşk û mişk, şeyd û nêçîra rovî ye
(IV/25)

Ji bo mu‘anîda fa‘îde ew e, negotin
Li sûka **mirîşka** deve na’ê firotin
(II/22)

3.2.8. Mişk

Mişk jî wek mirîşkan şîva roviyan e û xwarineke qirêc e. Ew kesên ku bi nav mela û alim in lê ji bona berjewendiyên xwe, ji bona nefsa xwe ya tenik qedrê dîne Îslamê yê rûmetbilind nizanin û tenezulê tiştên qirêc û haram dikin. Xelîfe jî wek gelek rexneyên xwe wan kesan dişîbîne ajalên xirab û her wiha xwarin û vexwarina wan jî bi vî awayî necîs dibine.

Nêçîr û xwarina şêhra gayê kovî ye
Mirîşk û **mişk**, şeyd û nêçîra rovî ye
(IV/25)

3.2.9. Kelb/Se/Sa

Kelb an jî kûçîk/se/sa di teqrîzê de şeş caran derbas dibe û her şeşan de jî peyv bi hemwateyeke cuda ve hatiye nivîsandin. Di destpêka teqrîzê de bi dijûnî kesên cahil, lê xwe zanê dihesibînin dişibîne kelbên kûtxwer û wan kesa hêjayê kelbtîya şivantîyê jî nabîne.

Kelbê kûtxwer bi kêr şivanî na'ê

Cahilek nezanî Xwedê neda'ê

(III)

Kesê ku ji dîn qeş şey'ek nizane

Wê bêjin: "Dûr herin, ew necîs in, wekî **sa ne**"

Wellahî tu **sa** ji wî çêtir bizane

Qedrê wî li nik Xwedê kêmtir ji **sa ne**

Ew ê ku kêmtir ji xinzîr û **sa ne**

Mirin ji heyata wî, jê ra çêtir bizane

Lewra di **kelba** da he ye gelek menafî

Ev wekî xinzîr bê nef' e, nebe tu tabî

(V/11-14)

Wan divê ji dunya'ê kes şey'ek nezane

Malê firaq bimînin bi hêviya pişîk û **sa ne**

(VIII/10)

3.2.10. Beraz/Xinzîr

Li gor dînê Îslamê beraz ajalekî heram û necîs e ku hewce ye misilman jê dûr bisekinin. Xelîfe bi çavekî xirab li wan kesên ku nezan û cahile dînê xwe ne û tu tiştî ji dînê xwe nizanin, dinêre. Li gor wî ew kes ji kelban, heta ji xinzîran jî xirabtir û kêmtir in.

Ew ê ku kêmtir ji **xinzîr** û sa ne
Mîrin ji heyata wî, jê ra çêtir bizane

Lewra di kelba da he ye gelek menafî‘
Ev wekî **xinzîr** bê nef‘ e, nebe tu tabî‘

(V/13-14)

3.2.11. Pişîk/Pisîk

Xelîfe di beşa VIIIan û malika jêr de dîsa li dijberê kesên navmela disekine, rewşa wan a cahili û hîlekariyê derdixe pêş. Ji ber ku ew kes ji rêya heq derketine û naxwazin tu kes bi aram û bi bawerî jiyana xwe bidomîne. Her tim mirazê wan kesan ew e ku bawermend cahil, xizan, nezan bimînin û heta tiştêkî tenê jî bêpar bimînin. Di malika jêr de ilm û dunya dişibîne malekî, Mîna maleke bê xwedî ku dî hundirê wê de kesek tune be û mal hêviya pişîk û kûçikan bimîne.

Wan divê ji dunya’ê kes şey’ek nezane
Malê firaq bimînin bi hêviya **pişîk** û sa ne

(VIII/10)

BEŞA PÊNCHEM

METNÊ TÎPVEGUHESTÎ YÊ TEQRÎZÊ

- I. Ji ewil kes nediye heta evî zemanî
Bi vî tertîbî xaşma bi vî lîsanî
- II. Lîsanê kurmancî çil bav [û] kala
Hê`j nîzanî bi xwendina meh [û]sala
- III. Kelbê kûtxwer¹³⁶ bi kêr şivanî nayê
Cahilek nezanî Xwedê nedayê
- IV. Ey cahilê malxirab [û] wêran
Neke d`ewa meydana piling [û] şêhran
- V. Tu ku eħmeq î, lîsanê aba`e¹³⁷ xwe nîzanî
Şerm [û] heya bike tu kêmtir ji sa nî
- VI. `İlmê `erebî nûrek ğayet munewer
Ji bo kêma kesa Xwedê dike muyeser
- VII. B`ilmê `erebî navê xwe dikî tu ma`lûm
Bê zanîn, li dunya û axreta xwe dikî rezîl û meħrûm
- VIII. Ger finûnê hemû `ilma bizanî
Wexta `emel nebe cahilek nezan î
- IX. Ger neħw¹³⁸ [û] şerf û menşiq bixwîni ji ezber
Dema `emel nebe mecnûnekî dîn î ebter¹³⁹
- X. Ne ji bo Xwedê `ilm dixwîni, dizanî
Belkî ji bo xwarina cîfe`e¹⁴⁰ dunya`e fanî
- XI. Nebêje yê gotî, mû`anid û nezan e
Ya heq wiha ye, çawa ku Xwedê dizane
- XII. Şed hezar şalat û selam her zemana
Li ser wî âl û eşhaba her wext [û] hîn [û] ana

¹³⁶ **Kûtxwer [K]:** Kesê ku qîma xwe bi tiştên nebaş, xirab û bêqîmet tîne

¹³⁷ **Aba [K]:** Mezin, bav û kal, ewil

¹³⁸ **Neħw û Şerf [‘E]:** Rêziman, gramer

¹³⁹ **Ebter [‘E]:** Dîn, mecnun, efsene

¹⁴⁰ **Cîfe [‘E]:** Mirar, mirdar

Bismillaḥirrahmanirrahim¹⁴¹

Nezm

I.

1. Ger te bivê meraza¹⁴² cehlê ji te be zaîl¹⁴³
Ji terîqa musteqîm nebî tu maîl¹⁴⁴
2. Bi destê xwe bîne tu 'Irşad'ul-Îbadê¹⁴⁵ [û] Mecme'ûl-Mesaîl¹⁴⁶
Şev û roj ji xwe ra bike baz û bend [û] hemaîl¹⁴⁷
3. Guh nede wî cahilî, wî bêedebî
Ku dibêje 'ilm nîn e ji xeyrî 'erebî
4. Lewra dîn 'ibaret ji me'nan e
Ne ku bi kelîme û lefz û herfan e
5. Nebêje Yûsûf xwedan 'eyb [û] natemîz e
Qewlê¹⁴⁸ wî ne meqbûl û 'ezîz e
6. Nizanî tu hingiv ji bo meraza dewa ye
Gerçi ji mêşek denî¹⁴⁹ û bê biha ye
7. X(w)arina wê lezîz e gelek şîrîn e
Nebêje wê, bi kevçik[ê] dar e we ya zêrîn e
8. Lazim e tu dînê xwe qenc bizanî
Gerçi bi kurmancî we ya bi 'Ibrani¹⁵⁰

¹⁴¹ Bi navê Xwedayê Dilovan û Dilovîn

¹⁴² **Meraz** ['E]: Nexweşî

¹⁴³ **Zaîl** ['E]: Xilas bûn, rizgar bûn, dûrketin

¹⁴⁴ **Maîl** ['E]: Nêzik mayîn, dûrneketin

¹⁴⁵ Pirtûka X. Y. ya li ser fiqhê ye.

¹⁴⁶ Pirtûka X. Y. ya li ser hedîsên cenabê pêxember e.

¹⁴⁷ **Hemaîl** ['E]: Nivişt

¹⁴⁸ **Qewl** ['E]: Qiset, gotin

¹⁴⁹ **Denî** [K]: Genî, bêqîmet

9. Gerçi ‘erebî durr e¹⁵¹ xwedan biha ye
Îro wê muşterî qeṭ kes nemaye
10. Ji bo fazîletê ew e nîhayet¹⁵²
Lew ref‘a¹⁵³ wî bûye nîşanê qiyamet
11. Lîsanê kurmancî eger çî naşirîn e
Lakîn di benda, me‘nayê da şekirîn e
12. Gerçi ew darek kêmbiha ye
Lakîn şemerê wê şer‘a¹⁵⁴ Miştefa ye
13. Lazim e ji wî şemerî nebî tu ğafil¹⁵⁵
Gerçi tu yî xwedan îdrak û ‘aqil
14. Kesê ku wiha fehm neke, ew nezan e
Ew ne însan e, kerek xwedan palan e¹⁵⁶
15. Kerê reş ji wî çêtir bizane
Ger guh piçûk e, ne wekî keran e
16. Ji serî veke pêç¹⁵⁷ û ‘îmamet¹⁵⁸
Xwedê nedaye wî, bext û se‘adet¹⁵⁹

¹⁵⁰ **‘İbranî:** Zimanê fermî ê dewleta Îsraîlê. Ango zimanê cihûyan. Lê hinek netewên ku cihû nînin jî bi vî zimanî diaxivin. Li seranserê dunyayê nêzî 7 milyon kes vî zimanî bi kar tîne. Di derbarê Zimanê Îbranî de ji bona agahiyên zêdetir bnr. <https://tr.wikipedia.org/wiki/İbranice>, Mêjûya Ragihandinê: 3ê Cotmeh 2016.

¹⁵¹ **Durr [‘E]:** Lûlû

¹⁵² **Nîhayet [‘E]:** Axir

¹⁵³ **Ref‘ [‘E]:** Ji holê rakirin

¹⁵⁴ **Şer‘ [‘E]:** Şerîet, rêya Îslamê

¹⁵⁵ Peyva “semer”ê her çiqas li vir di wateya fêkiyan de hatibe bikaranîn jî, semer di heman demê de tê wateya hilberîn, encam û sohbeta şevê jî. Bnr. Selim Temo, *Kürt Şiir Antolojisi I*, Agora Kitaplığı, İstanbul, 2010. r. 621.

¹⁵⁶ **Palan [F]:** Semer (Lê ew semera ku davêjin ser pişta keran)

¹⁵⁷ **Pêç [K]:** Şaşik

¹⁵⁸ **Îmamet [‘E]:** Pêçeka dora serî

17. Guhê kerê li ser serê wî da ne
Kerbûna wî da qenc bibe ‘eyan e
18. Ey kesê gebî¹⁶⁰, tu ne guhdirejî¹⁶¹
Ma tu fetwa ji xelqê ra bi ‘erebî dibêjî
19. Ya tu fehm dikî ji hûrûfê ‘erebî bi qencî
Paşê ji wan ra teqrîr¹⁶² dikî bi kurmancî
20. Min jî ji ‘erebî wisa fehm kiriye
Paşê bi zimanê kurmancî nivîsiye
21. Xweziya wexta tu wan dikî ‘îtirazê
Ez jî hêzîr bibûma wî wext [û] lehze¹⁶³
22. Ewan dê bidiya ji min ‘eceb îcabet
Heta qiyamet bibûna şermî û xecalet¹⁶⁴
23. Meger kor î, bi kurmancî nizanî
Çend kitab gotine Ehedmedê Xanî¹⁶⁵
24. Yûsûf û Zuleyxa¹⁶⁶ û Mem û Zîn¹⁶⁷

¹⁵⁹ **Se‘adet** [‘E]: Şadûmanî, xurremî

¹⁶⁰ **Ĝebî** [‘E]: Bêaqil, bêfem

¹⁶¹ **Guhdirêj** [K]: Ker. Li devera Serhedê dewsa peyva ‘ker’ê ev bêje zêdetir tê bikaranîn. Ji bona ku gotin kubartir û edeptir bibe ev peyv tê tercihkirin.

¹⁶² **Teqrîr** [‘E]: Dubare

¹⁶³ **Lehze** [‘E]: Dem, wext

¹⁶⁴ **Xecalet** [‘E]: Şermî, fêdikirin, çilmisîn

¹⁶⁵ **Ehedmedê Xanî**, di sala 1061ê hîcrî de ku beramberî sala 1951ê mîladî tê, li Bazîdê hatiye dunyayê. Di sala 1121/1709an de 57 salî li Bazîdê wefat kiriye. Nivîskarê berhemnên wekî Nûbihara Biçûkan, Eqîdeya Îmanê û Mem û Zînê ye. Lê Dîwanekê wî jî heye ku helbestên wî yê cihê reng di hundirîne. Bi van berhemên xwe ve heta îro tesîreke girîng li ser gelê kurd hiştiye û xuya dîke ku ev bandor dê gelek salan berdewam be. Ji bona agahiyên zêdetir bnr. Ehedmedê Xanî, *Mem û Zîn (Metnê Kurdî&Tirkî)*, Cizre Kaymakamlığı Yayınları, İstanbul 2016. r. 5-6; Kadîrî Yıldırım, *Ehedmedê Xanî'nin Fikir Dûnyası*, AKYAD, Ağrı, 2008. r. 23-55.

Nûbihara¹⁶⁸ feşîh bi elfazê¹⁶⁹ şekirîn

25. Bizanî tu Nehcul `Enam¹⁷⁰ celîl e

Bi kurmancî te`lîfa Mela Xelîl e¹⁷¹

26. Ne Şêyxê Batê¹⁷² xwedan qelbê munewer¹⁷³

Bi kurmancî gotiye Mewlûda Pêgember¹⁷⁴

¹⁶⁶ Di vir de xuya ye ku Xelîfe, *Yûsuf û Zuleyxaya Selîmê Hîzanî*, wek berhema Ehmedê Xanî pejrîrandiye. Lê piştî lêkolînên van salên dawiyê bi teqezî diyar bûye ku ev berhem a Selîmê Hîzanî ye. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Kadri Yıldırım, *Êhmedê Xanî'nin Fikir Dünyası*, AKYAD, Ağrı, 2008; Selîmê Hîzanî, *Yûsuf û Zuleyxa*, (Edisyon, Krtik Amadekarî Ayhan Geverî), Weşanên Nûbihar, 2013, Stenbol.

¹⁶⁷ **Mem û Zîn**, Mesnewiya Ehmedê Xanî ya ku bi kurdî hatiye nivîsandin û ji 2656 beytan pêk tê. Ev mesnevîm bîngeha xwe jî –her wiha navê xwe- ji destana evînê ya bi nav û deng Memê Alan digire. Ehmedê Xanî di Mem û Zînê de ramanên xwe yê civakî, siyasî, çandî, felsefî û tesewufî derxistiye pêş û nasnameya kurdî jî di gelemperiya berhema xwe de neqîşandiye. Ji bona agahiyên zêdetir bnr. Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn (Metnê Kurdî&Tirkî)*, Cizre Kaymakamlığı Yayınları, İstanbul 2016. r. 5-6; Kadri Yıldırım, *Êhmedê Xanî'nin Fikir Dünyası*, AKYAD, Ağrı, 2008. r. 42-55.

¹⁶⁸ **Nûbihara Biçûkan**, ferhenga duzimanî ya menzûm a Êrebî-Kurdî ye ku wekî yekem ferhenga kurdî tê qebûl kirin û nivîskarê wê jî dîsa Ehmedê Xanî ye. Di sala 1683an de hatiye nivîsîn û nêzî 1000 peyvên Êrebî û wateya wan a kurdî pêk tê. Ji destpêka vê berhemê jî diyar dibe ku Xanî ji bona zarokên kurd di medreseyan de fêrî xwendin û nivîsandinê bibin, hatiye amadekirin. Ji bona agahiyên zêdetir bnr. Ehmedê Xanî, *Nûbihara Biçûkan*, Analiz ve Şerhî: Kadri Yıldırım, Weşanên Avesta, Stenbol 2008, r. 39-40; Kadri Yıldırım, *Êhmedê Xanî'nin Fikir Dünyası*, AKYAD, Ağrı, 2008. r. 27-32.

¹⁶⁹ **Elfaz [‘E]**: Pirjimara peyva ‘lezz’ê, gotin

¹⁷⁰ **Nehcu’l Enam**, berhema menzûm a Mela Xelîlê Sêrtî ye. Xuya ye ku di amadekirina vê berhemê de Mela Xelîl di bin tesîra Eqîdeya Îmanê ya Xanî de maye. Nehcu’l Enam bi teşeya mesnewiyê û bi kêşeya qafîye û nezmê hatiye nivîsîn. Ji bona agahiyên zêdetir bnr. İbrahim Gözetin, *Mele Xelîlê Sêrtî û Berhema Wî ya Nehcu’l-Enam (Metn û Lêkolîn)*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mûşê, Mûş 2015.

¹⁷¹ **Mela Xelîl Sêrtî**, di çavkaniyan de di derheqê tarixa jidayikbûn û wefata wî de îxtîlaf hebe jî sala jidayikbûna wekî 1750-1751î û sala wefata wî jî wekî 1843î tê diyarkirin. Bi eslê xwe jî gundê Gulpîkê ye ku ev gund li ser Hîzana Bedlîsê ve ye. Li ser navê wî yê Mollâ Xelîl es-Sî’irdî îxtîlaf nîne ku hem li ser berhemên xwe navê xwe bi vê formê nivîsiye hem jî xebatên li ser wî hatine amadekirin de wekî forma jorîn derbas dibe. Bi mexlesên Şewqî û Xelîl jî tê naskirin. Ji xeynê Nehcu’l-Enama wî nêzî 30î berhemên wî hene. Ji bona agahiyên zêdetir bnr. İbrahim Gözetin, *Mele Xelîlê Sêrtî û Berhema Wî ya Nehcu’l-Enam (Metn û Lêkolîn)*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mûşê, Mûş 2015. r. 15-28.

¹⁷² **Mela Huseynê Bateyî**, nivîskarê yekem e ku bi navê Mewlûdê berhemek nivîsiye. Mela Huseynê Bateyî di sedsala XVIIan û XVIIIan de jiyaye û 65-75 sal emir kiriye. Xeynê Mewlûdê bi navê Hemaîl, Zembîlfiroş du berhmên wî yê din jî hene. Her wiha xeynê van jî 30î zêdetir helbestên wî jî hene ku ji aliye hin nivîskaran ve wek berhemekî hatine çapkirin. Ji bona agahiyên zêdetir bnr. Ziver İlhan, *Mewlûda Mela Huseynê Bateyî (Metn û Lêkolîn)*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn 2013. r. 5-14.

¹⁷³ **Munewer [‘E]**: Rewnaq

¹⁷⁴ Mewlûda menzûm a Mela Huseynê Bateyî ye ku pesinnameya jiyan û pêxemberiya Hz Mihemed (s.x.l.) e. Di wêjeya kurdî de mewlûdnameya yekem ev berhem e. Ji bona agahiyên zêdetir bnr. Ziver İlhan, *Mewlûda Mela Huseynê Bateyî (Metn û Lêkolîn)*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn 2013. r. 10.

27. Gerçi kurmanciya me ne feşîh e
Fehma me‘na’ê ji wî gâyet melîh e¹⁷⁵
28. Wereng tu bêje wan cewabê
Xweda ‘alim e, bi heqîqet û şewabê
29. Çi xweş kitab in Îrşad [û] Mecme‘il Mesa’îl
Bi zanîna wan Xwedê bike we na’îl¹⁷⁶
30. Lazim e hûn wan terk nekin bi tu hâla
Ji bo we çêtir in, ji şerwet û milk û mala
31. Wacib e tu cehdê bikî zû wan bizanî
Xaşma¹⁷⁷ di vî axira zeman î
32. Lewra kes nîn e, ji nasa¹⁷⁸ ra ‘eyan ke
Behşa dîn ji wan ra tefşîl¹⁷⁹ û beyan ke
33. Nas mane, der zûlmet¹⁸⁰ û cehalet
Ekserê¹⁸¹ wan girtine rêya dalalet¹⁸²
34. Wellahî bi şer‘ ‘alim e, ne cahil
Kesê bizane ji dîn hindê¹⁸³ mesa’îl¹⁸⁴

¹⁷⁵ **Melîh** [‘E]: Xweş, xweşik, baş, ecibandin

¹⁷⁶ Tîpa “ز”yê xuya ye ku di çapxaneyê de bi xelêti hatiye nivîsandin. Lewre ku “ز” hebe wateya malikê xirab dibe. Ku “ز” hebe malik wiha dibe:

“Bi zanîna wan xwe di rê bike we naîl”

¹⁷⁷ “ج” hatiye nivîsandin, lê peyveke bêwate derdikeve hole. Ji ber wê divê “ج” be ku peyv bibe xaşma û malik watedar be.

¹⁷⁸ **Nas** [‘E]: Mirov, însan

¹⁷⁹ **Tefşîl** [‘E]: Şîrovekirin, zelalkirin, vegotin

¹⁸⁰ **Zûlmet** [‘E]: Tarîti

¹⁸¹ **Ekser** [‘E]: Piranî, pir

¹⁸² **Dalalet** [‘E]: Jirêderketin

¹⁸³ **Hindê** [K]: Hinek

35. Ew jî ‘alim e, di heyata dunya’[ê]
Hem digel wan e, di axîret [û] ‘ûqba’[ê]¹⁸⁵
36. ‘Ilmê ‘erebî qîmetgiran e
Qenctir e, ji xatema¹⁸⁶ Suleyman e
37. Ew kîngê ji te ra dibe muyeser¹⁸⁷
Meger Xweda ji ezel¹⁸⁸ bike muqader¹⁸⁹
38. Ne wekî kurmancî qîmeterzan e
Çi kesê bigre wî qenc bizane
39. Tu ku neşê¹⁹⁰, bigrî evî erzanî
Çi la’îqî xatema Suleyman î
40. Ger te hebûya ‘aql û kiyaset¹⁹¹
Te yê wê bixwenda her wext [û] se‘et
41. Kêmqîmet e, âemen¹⁹² erzan e
Kurmancî ye, her kes dizane
42. Tu qedrê kitêba xwe qenc bizane
Nebê kurmancî ye, kes qedrê wê nizane
43. Çi kesê wê xwend û qenc zanî

¹⁸⁴ **Mesa’îl** [‘E]: Mesele, mijarên dînî

¹⁸⁵ **‘ûqba** [‘E]: Roja axretê, qiyamet

¹⁸⁶ **Xatema** [‘E]: Gustîl

¹⁸⁷ **Muyeser** [‘E]: Nesîb

¹⁸⁸ **Ezel** [‘E]: Herhebûn

¹⁸⁹ **Muqader** [‘E]: Nivîsandî

¹⁹⁰ **Neşê** [K]: Nikare, taqet neke

¹⁹¹ **Kiyaset** [‘E]: Aqil

¹⁹² **âemen** [‘E]: Biha

Pêç û ‘îmamet li ser serê xwe danî

44. Şed car bibe, belkî ne carek

Pêç û ‘îmamet li we mubarek

45. Çi xweş la’îq e, ji wî ra ‘îmamet¹⁹³

Xwedê bide wî bext hem se‘adet¹⁹⁴

46. Xwedê bide wî tewfîq¹⁹⁵ û hîdayet¹⁹⁶

Refîqê¹⁹⁷ wî bike nuşret¹⁹⁸ [û] ‘înayet¹⁹⁹

47. Xwedê bide wî ‘ilm [û] ‘emelek bènîhayet²⁰⁰

Xelqê bi ‘ilmê wî bike hîdayet

48. Me divê da’ima ku hûn wisa bin

‘Emel bikin ber li dergahê Xweda bin

49. Berê ji Xwedê ra bikin medh û şena’ê

Paşê destê xwe hildin ji me ra bikin du‘a’ê

¹⁹³ **Îmamet** [‘E]: Melatî

¹⁹⁴ **Seadet** [‘E]: Aramî, kêfxweşî

¹⁹⁵ **Tewfîq** [‘E]: Serkeftin

¹⁹⁶ **Hîdayet** [‘E]: Rêya rast

¹⁹⁷ **Refîq** [‘E]: Heval, hogir, rêheval

¹⁹⁸ **Nuşret** [‘E]: Alîkarî

¹⁹⁹ **Înayet** [‘E]: Piştgirî

²⁰⁰ **Bènîhayet** [‘E]: Bêdawî

II.

1. Ey kesê ku hûn 'ummî [û] nezan in
‘Ihsanek ‘ezîm ji Xwedê ger hûn bizanin
2. Gerçi ne muhtacê wî ne ‘alim û zana
Lakîn zanîna wan ferz e, ji bo cahil û nezana
3. Wacib e li ser kullî²⁰¹ mu'mîn²⁰² [û] mu'mînata²⁰³
Zanîna ‘ilmê dîn, ji ferz û wacîbata
4. ‘Ilmê ‘erebî cewherek gayet biha ye
Wekî ‘enqaê²⁰⁴ çû ye ‘edem²⁰⁵, îsmê wî maye
5. Bi ‘ilmê fexir²⁰⁶ neke, ey kesê ‘alim û zana
Fexra we, tedbîr bikin ji bo cahil û nezana
6. Wan hişyar kin, heta ku dînê xwe naskin
Ji cehl û dalaletê²⁰⁷ ewan xilaş kin
7. Ne bi lîsanê xwe, ne bi geyrê wî dizanin
Lew kullî wan cahil û ‘ummî²⁰⁸ û nezan in
8. Lazim e tu bêjî, teblîg kî ma ‘aleyke²⁰⁹
Ger nebihên, qebûl nekin fe ma ‘aleyke²¹⁰

²⁰¹ **Kullî** [‘E]: Hemû, tev

²⁰² **Mu'mîn** [‘E]: Misilmanên mêr

²⁰³ **Mu'mînata** [‘E]: Misilmanên jin

²⁰⁴ **‘Enqa** [‘E]: Çûkê navdar yê çîrokên efsûnî

²⁰⁵ **E‘dem**: Tunebûn

²⁰⁶ **Fexir** [‘E]: Pozbilindî, xwerazîbûn

²⁰⁷ **Dalalet** [‘E]: Jirêderketin

²⁰⁸ **‘Ummî** [‘E]: Nexwendî, cahil, nezan

²⁰⁹ **Ma ‘aleyke** [‘E]: Ango tiştê ku peywîr û wezîfeya te ye

²¹⁰ **Fe ma ‘aleyke** [‘E]: Tiştê ku peywîr û wezîfeya te nîne.

Nîşe: Qertafa ‘ma’ ya rêzika yekem de derbas dibe, navê mefsûl e û wateya peyvê erênî dike. Di rêzika duyem de jî ‘ma’ neyînî ye.

9. Ekserê xwendiyê ku navmela ne
Bi ‘ucb û tekabbur²¹¹ ew mubtela²¹² ne
10. Bi t‘en²¹³ [û] îstîhzâ²¹⁴ û behana²¹⁵
Men²¹⁶ dîkin ji t‘elîmê,²¹⁷ cahil û nezana
11. Ewê digel ‘ilmê xwe bimirin, herin fena’ê²¹⁸
Ehl²¹⁹ û etba’ê²²⁰ wan ummî dimînin li dunya’ê
12. Nizanin ji bo wan bikin tedbîr û çara
Dihêlin ewan ‘ummî, wekî esîr û jara
13. Fexrê²²¹ dîkin bi ‘ilmê aba’²²² û ecdadê²²³ xwe
Agah²²⁴ nîn in, ji cehl²²⁵ û esîriya hâlê xwe
14. Ew ‘alîmê ku ‘ilmê ‘erebî qenc dizanin
Ehl [û] ewladê wan gâlîben²²⁶ ‘ummî û nezan in

Xelîfe di vir de îşaretê ayeta 20an a Sureya Alî İmran dike: “Eger (ew di derbara dîn de) bi te re xirecîrê bikin, ji wan re bibêje: Mîn digel wan ên ku dane pey min, me xwe ji Xwedê Teala re berdest kir. Ji Xwedankitêb û nexwendeyan (muşrîkan) re bibêje: Ma hûn jî, ji Xwedê re berdest bûn? Eger wan jî xwe berdest kir, jixwe ew jî ketine ser rêka rast. Eger ew pişta xwe bidinê, vêca (wezîfeya) te tenê ragihandin e. Xwedê (bi kar û kiryarên) bendeyên xwe bîner e.”, *Qur’ana Pîroz*, Werger: M. Huseyn Êsî & M. Se’îd Girdarî & M. Muhammed Bêrkevanî, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2011. r. 51.

²¹¹ ‘Ucb û tekabbur [‘E]: Nefsmezîni, xwemezîndîtin

²¹² Mub’tela [‘E]: Girtî, aşiq

²¹³ T‘en [‘E]: Gef

²¹⁴ Îstîhza [‘E]: Tirane, tinaz

²¹⁵ Behane [F]: Qesd, sedem, mebest

²¹⁶ M’en [‘E]: Astengî, tengasî

²¹⁷ T’elîm [‘E]: Perwerdehî

²¹⁸ Fena [‘E]: Xirabî, felaket, rewşeke xeter

²¹⁹ Ehl [‘E]: Malbat

²²⁰ Etba [‘E]: Tabî, kesên ku ji nesebekî tîn, zarok

²²¹ Fexr [‘E]: Şanazî

²²² Aba [‘E]: Mezin, bav

²²³ Ecdad [‘E]: Bav û kal, mezin

²²⁴ Agah [F/K]: Haydar

²²⁵ Cehl [‘E]: Cahilî, nezani

²²⁶ Gâlîben [‘E]: Piranî, gelek caran

15. ‘Alim ew e, ‘ilmê dîn mezin bizane
T‘elîma dîn ta‘etekî²²⁷ mezin bizane
16. Çi kesê ji ‘ilmê wî mehrûm bin eqarîb²²⁸
Nabînin fa’îde ji wî, cîran²²⁹ û ecanib²³⁰
17. Lew wacib e li ser ‘alîma seraser²³¹
Ji bo cahîla dîn bêjin, bi tarîqa muyesser²³²
18. Her çi ji dîn wacib e, emanet
Da we ku, ew nebin salikê²³³ mesleka dalalet²³⁴
19. Ger bêjin kurmancî ye, ne feşîh²³⁵ û leţîf e²³⁶
Haşa! Xaliş²³⁷ m‘ena’[ê] şer‘a şerîf e²³⁸
20. Ji şer‘ê, qeţ meqşed feşahet²³⁹ nîn e
Belkî ‘emelê şehîh,²⁴⁰ silûka²⁴¹ terîqa²⁴² dîn e
21. Ger hûn qebûl kin, ya heq wiha ye
Werne cewher jî, li sûka²⁴³ beqala²⁴⁴ bê biha ye

²²⁷ **Ta’et** [‘E]: Ibadet

²²⁸ **Eqarîb** [‘E]: Pirjimara oeyva eqreba, xizm

²²⁹ **Cîran** [K]: Cinar

²³⁰ **Ecanîb** [‘E]: Pirjimara peyva ecnebî, xerîb, biyanî

²³¹ **Seraser** [K/F]: Seranser, tevahî

²³² **Terîqa Muyeser** [‘E]: Rêya zelal, rêya eşkere, rêya rast

²³³ **Salik** [‘E]: Rêwî

²³⁴ **Dalalet** [‘E]: Jirêderketin

²³⁵ **Feşîh** [‘E]: Zelal

²³⁶ **Leţîf** [‘E]: Xweş, delal

²³⁷ **Xaliş** [‘E]: Ji dil

²³⁸ **Şer‘a Şerîf** [‘E]: Şerîet, Ayetên Qur‘anê

²³⁹ **Feşahet** [‘E]: Rewanbêjî, fesîh, belaxî, zelalî û ahenga vegotinê, di vegotinê de bêqusûrî

²⁴⁰ **‘Emelê Şehîh** [‘E]: Li gor baweriya dîne Îslamê kirinên baş, tevgerên rast

²⁴¹ **Silûk** [‘E]: Rê

²⁴² **Terîq** [‘E]: Rêç

²⁴³ **Sûk** [K]: Çarsî, bazar

²⁴⁴ **Beqal** [‘E]: Dikan

22. Ji bo mu‘anîda²⁴⁵ fa’îde ew e, negotin²⁴⁶

Li sûka mirîşka deve na’ê firotin

²⁴⁵ **Muanîd [‘E]:** Berxwedêr, bi rik

²⁴⁶ Bediuzzeman Seidê Kurdî jî gelek caran ji bo kesên bêfem/femkor biwêja “*Cewab’ul ahmak essukut*” bi kar tîne. Bnr. Bedüzzeman Said Nursî, *Şualar*, Zehra Yayınları, İstanbul, r. 553; *Mektubat*, r. 502 û 620.

III.

1. Tu nezer ke bira, li vê kîtabê
Bi ‘eynê îşlahê,²⁴⁷ ne ya ‘îtabê²⁴⁸
2. Tu te’mul²⁴⁹ bike, di wî da bi dil û can
Îşlah bike ji wî xeta û nîsyan²⁵⁰
3. Min şed hêvî ye ji te, belkî ne carek
Tu rast bikî xeta’ê wî, bi qelema xwe î mubarek²⁵¹
4. Lewra ew jî ta’et e²⁵², ji bo Xweda ye
Îşlah wî gelek la’îq û rewa ye²⁵³
5. Gerçi sermayedar muhtac nîn in
Ewêd bê sermaye qeç mislê wî nabînin
6. Ey kesê muflîs²⁵⁴, ku te sermaye nîn e
Qeç na, cehd²⁵⁵ bike ewan bi destê xwe bîne
7. Ger terk bikî ewan jî di vî zemanî
Heyata wî yê telef bibe, bi cehl û nezanî
8. Tuhfet²⁵⁶ û Fera’îz²⁵⁷ û Irşad`ul ‘Ibad xweş kîtab in

²⁴⁷ **Îşlah** [‘E]: Başkirin, durustkirin, ber bi qencyê ve birin

²⁴⁸ **Îtab** [‘E]: Biçûk xistin, xeyîdîn, bi tund bersiv dayîn

²⁴⁹ **Te’mul** [‘E]: Sebîr kirin, berxwedan, tamîş dayîn

²⁵⁰ **Nîsyan** [‘E]: Bîrkirin, bîrçûyîn

²⁵¹ Xelîfe di vir de îşaretê ayeta destpêkê, ya Sureya Nûrê dîke: “*Ev sûreyeke ku me ew hinartiye û me (hukmên ku tê de ne li ser we) ferz kirine. Me aşkera (û mebestdiyar) tê de anîne da ku hûn bifikirin, jê şîretê bigirin.*”, Qur’ana Pîroz, Werger: M. Huseyn Êsî& M. Se’îd Girdarî& M. Muhammed Bêrkevanî, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2011, r. 351.

²⁵² **Ta’et** [‘E]: Ibadet, perestîş

²⁵³ **Rewa** [F]: Hêja, layîq

²⁵⁴ **Muflîs** [‘E]: Ew kesê ku hemû mal û milkê wî (hem maddî hem jî manewî) ji dest çûye

²⁵⁵ **Cehd** [‘E]: Xîret

²⁵⁶ Tuhfet, ango Tuhfet`ul ‘Amilîn. Bnr. Xelîfe Yûsif, *Tuhfetu`l Amilîn*, Nur Matbaası, Ankara 1961.

²⁵⁷ Feraîz, pirtûka X. Y.a li ser mîratê, bnr. X. Y., *Tuhfetu`l Amilîn*, Nur Matbaası, Ankara 1961.

Mişlê wan îro qeş li tu cihî peyda nabin

9. Ey kesê Xwedê bi zanîna²⁵⁸ wan te şa kir
Te bi luft û îhsan ji gefletê²⁵⁹ hişyar kir
10. Bi gotina wan lazim e bibî tu zakir²⁶⁰
Nebê ketm²⁶¹ bikî, cihê xwe bikî tu 'agir
11. Wî kesî li pêgember eziyet û cefa kir
Ku emrê wî teblîg nekir, bi wî ra bêwefa kir
12. Çi kesê ne teblîg û ne xizmet eda kir
Ew ê bê gemkirin, yeqîn bi lîcamê²⁶² 'agir²⁶³
13. Heta tu nekî ewan tekrar û ezber
Ne la'îq e, tu bibî îmam û serwer²⁶⁴
14. Çi kesê zanîna wî natemam e
Serwer û îmametî jê ra heram e
15. Wî kesê se'adet li xwe bi der da
Ku bêzanîn ji emrê Xwedê xeber da
16. Rûreş e, li nik Xwedê û pêgember
Ew kesê bêzanîn bûye îmam û rehber

²⁵⁸ Di vir de peyv wekî 'zatîna' xelet hatibû nivîsîn, me li gor malike sererast kir.

²⁵⁹ **Geflet** ['E]: Xew

²⁶⁰ **Zakir** ['E]: Kesê ku zikir dike

²⁶¹ **Ketm** ['E]: Negotin, veşartin

²⁶² **Lîcam** ['E]: Gem, hevsar, werîs

²⁶³ Di vir de Xelîfe îşareta Sûreya Tebbetê ayeta 5an dike: "Di stûyê wî de werîsekî girêdayî heye.", Qur'ana Pîroz, Wergêr: M.Huseyn Êsî& M. Se'îd Girdarî& M. Muhammed Bêrkevanî, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2011. r.605.

²⁶⁴ **Serwer** ['E]: Îmam, rêber

17. Lewra ew kes bêçav û kor û ‘elîl e²⁶⁵
Çewa ji bo kesa ra dibe rehber û delîl e
18. Tu kesî nediye ku kor newbedar bin²⁶⁶
Ne ker bi hewar û gaziya hişyar bin
19. Yeqîn bizan, nezan ‘eduwê²⁶⁷ dîn e
Wekî kor, la’îqê şivanî nîn e
20. Lazim e serwerê dîn emîn be
Ji Xwedêtirs û li terîqa musteqîm be²⁶⁸
21. Ger bikî rehber ji xwe ra yekî nela’îq
Wê li rêya çalaletê bike te sa’îq²⁶⁹
22. Hekîm birîn û dermana nezane
Ew ne hekîm e, tu wî ji xwe ra qatil bizane
23. Billahî neşîhet e, ji we ra ez dibêjim
Ne ku beyhûde²⁷⁰ kelamek e, ji bo we ez dibêjim
24. Ger van penda²⁷¹ ji xwe ra neşîhet nezani
Tu ê bibînî, yeqîn xecalet²⁷² û poşmanî
25. Ev qeder²⁷³ kafî ye ji bo te, eger bizanî
Wer ne²⁷⁴ Tewratê ji te ra bêjim dîsa nizanî

²⁶⁵ ‘Elîl [‘E]: Nexweş, kulek

²⁶⁶ Newbedar [‘E]: Nobedar

²⁶⁷ ‘Edûw [‘E]: Neyar, dijmin

²⁶⁸ Terîqa Musteqîm [‘E]: Rêya rast

²⁶⁹ Saîq [‘E]: Ajojina ber bi rêya xirabiyê

²⁷⁰ Beyhûde [F]: Vala

²⁷¹ Pend [F]: Şîret, nesîhet

²⁷² Xecalet [‘E]: Mehcûbiyet, poşmanî

²⁷³ Ev Qeder [‘E]: Ev qas

IV.

1. Tuḥfet û Feraîz û Irşad`ul `Ibad xweş dewa ne
Ji bo elema qelbê cahila `eceb şîfa ne
2. Lewra me`na`ê şer`a Miştefa ne
Terîqeta merîfeta rahê²⁷⁵ Xweda ne
3. Ger qenc bizan yekî ji wana ji ezber
Wê biçê zûlmet²⁷⁶, qelbê te bibe munewer
4. Çi kesê vê nî`metê bizane [û] înkâr ke
Xwedê wî rûsiyah û şermesar²⁷⁷ ke
5. Kesê wan qebûl neke, nehebîne²⁷⁸
Yeqîn kor e, her du çavê wî nîn e
6. Ey çavkorê qelbreş û tarî
Înkara şer`ê neke bi kîzb²⁷⁹ û bi hîlekarî
7. Înkara wê kufr e, gâyet bela ye
Derd û elemekî bêderman û bêdewa ye
8. Lewra bi dîtina ḥusn û cemalê
`Aşîq û me`şûq têne xiyalê
9. Ey korê xwedan ḥesret û tesuf
Wî meḥrûmê ji dîtina cemala Yûsûf

²⁷⁴ **Wer Ne [K]:** Ku wiha nebe, eger na

²⁷⁵ **Rah [‘E]:** Rê

²⁷⁶ **Zûlmet [‘E]:** Tarîti

²⁷⁷ **Şermesar [K]:** Şermezar

²⁷⁸ **Ḥebandin [K]:** Hez kirin, qebûl kirin, pejirandin

²⁷⁹ **Kîzb [‘E]:** Vir, derew

10. Ya ġayet ‘alim î, muħtacı nîn î
Ya ġayet eħmeq û mecnûn û dîn î
11. Lewra ferman kiriye hezretî pêġember
Çil mesa’îlê dîn kesê bikitin ji ezber²⁸⁰
12. Ew jî ‘alim e, di ħeyata dunya’ê
Hem diġel wan e, di ‘axîret û ‘uqba’ê²⁸¹
13. Ey koro! Ji Xwedê bike du‘aê
Meger ew bide çeşm²⁸² û qelbê te şîfa’ê
14. Belkî tu wê ħusn²⁸³ û cemalê bibînî
Muntefî²⁸⁴ bibî, ji wî meħrûm nemînî
15. Her kes bi mîqdarê²⁸⁵ zanîna xwe beha ye
Ger nezan e, ji bo qîmeta ne la’îq û rewâ²⁸⁶ ye
16. Lewra tucar²⁸⁷ bi sermaye’ê namîdar in
Eger nebin, feqîr û şermesar in
17. Ev meclîsa şêhrê namîdar e
Ne la’îqî roviyê kezab²⁸⁸ [û] ħîlekar e

²⁸⁰ Di vir de Xelîfe îşaretê hedîseke Hz. Mihemed (s.x.l.) dike: “*Ji umeta min kê çil hedîsan jiber bike, ew ê roja qiyametê ji teref Xweda ve di nava alim û feqîyan de bê heşirkirin*”, <http://www.rehber.ihya.org/>, Mêjûyê Ragihandinê: 07.06.2017.

²⁸¹ ‘Uqba [‘E]: Axiret

²⁸² Çeşm [F]: Çav

²⁸³ Ĥusn [‘E]: Rû, bedewiya rû

²⁸⁴ Muntefî [‘E]: Sûdwegirtin, feyde jê dîtin

²⁸⁵ Mîqdar [‘E]: Tebab, mêjer, qas, qeder

²⁸⁶ Rewa [F]: Hêja, layîq

²⁸⁷ Tucar [‘E]: Bazirgan

²⁸⁸ Kezab [‘E]: Derewkar, virek

18. Lewra ew şerî'eta şemsê²⁸⁹ cîhan e
Hezretî Muḥemed xatemê enbiyan e²⁹⁰
19. Ger tu şêhr î, meydana herba şêhra veke
Ger tu rovî yî, de'wa meydana şêhrtiyê meke
20. Ger tu şêhrekî namîdar î²⁹¹
Ne la'îqî te ye, kîzb²⁹² û hîlekarî
21. Ger tu şêhr î, şahibhuner î
Qewlek heq bibêje, heta ku biçite serî
22. Lewra ev meydan cihê piling û şêhran e
Ne meydana roviyê malikwêran e
23. Eger tu roviyê ze'îf û jar î
Neê meydana piling û şêhra, tu şermesar î
24. Roviye ku kêmquwet û natemam e
Sekna li meydana piling û şêhra heram e
25. Nêçîr û xwarina şêhra gayê kovî ye
Mirîşk û mişk, şeyd²⁹³ û nêçîra rovî ye
26. Ger qewlê min qebûl nekî bi neşîhet
Paşê tu'ê bibî şermesar û xwedan fezîhet²⁹⁴

²⁸⁹ Şems [‘E]: Roj, tav

²⁹⁰ Xatemê Enbiya [‘E]: Serwerê pêxemberan

²⁹¹ Namîdar [F]: Navdar, meşhûr

²⁹² Kîzb [‘E]: Derew, vir

²⁹³ Şeyd [K]: Nêçîr

²⁹⁴ Fezîhet [‘E]: Xûypakî, dilpakî, bêhnpakî

27. Ger ‘alim î, te‘zîm²⁹⁵ û hürmet ji te ra rewya ye
Wer ne, hebana²⁹⁶ te tijî hewa û ba ye
28. Nas, hebana pif²⁹⁷ bi te ra dibînîn
Durr û cewher e, ‘îtkad²⁹⁸ dîkin li ser dimînin
29. Ey xwedan û hamilê²⁹⁹ hebana baê
Şev û rojê ‘aşiqê medh û sena’ê³⁰⁰
30. Ger nas hebana teê vala bibinin
Yeqîn bi mêhvanî jî te nahewînin
31. Cahil zen dîkin tu ğenî³⁰¹ [û] hingivnûş î
Ew nizanin tu çerçiyê³⁰² morîfiroş î³⁰³
32. Nav[ê] ğeniya qeṭ la’îqê te nîn e
Dikana te vala ye, herkes dibîne
33. Eger lîbasê faxir³⁰⁴ li ser te nîn e
Neê der, heta kes ‘eybê te nebîne
34. ‘İlm û ğîna ji ‘eyba ra setar e³⁰⁵
Cehl û fexîr ‘eyban dîkin aşîkar e

²⁹⁵ **Te’zîm** [‘E]: Mezinahî, hurmet

²⁹⁶ **Heban** [K]: Çenteyê şivan û gavana ku di tê de hin tiştên xwarinê heye

²⁹⁷ **Pif** [K]: Vala, bi hewayê tijî

²⁹⁸ **‘Îtkad** [‘E]: Bawerî

²⁹⁹ **Hamil** [‘E]: Kesê ku xwediye tiştêkî ye

³⁰⁰ **Sena** [‘E]: Pesin

³⁰¹ **Ġenî** [‘E]: Dewlemend, zengîn

³⁰² **Çerçî** [K/F]: Dikandarên rêwî ku cihekî wan ê diyar tûneye û bi keleskeyên hespa anjî bi maşinan deveran digerin, hin pêdiviyên difiroşin. Carna berdêla wan pere be jî gelek caran bi ceh, genim û hin tiştên din ve jî danûstandinê dîkin.

³⁰³ **Mûrîfiroş** [K]: Çerçiyên ku moriyên difroşin

³⁰⁴ **Faxir** [‘E]: Pozbilindî, xwerazîbûn

³⁰⁵ **Setar** [‘E]: Ew kesê ku vedişêre/dipêçe

35. Wacib e, li ser xaş³⁰⁶ û ‘amê³⁰⁷
Zanîna erkanê îmanê, hem îslamê
36. Paşê wacib e, li ser da û bava
Te‘lîma ewlada, rûhniya her du çava
37. Lewra kesê cahil be, wan nezane
Dînê wî noqsan e, gerçi bi nav misliman e
38. Lew Xwedê wacib kiriye li ser aba û ‘ummeheta³⁰⁸
Te‘lîma ewlada, bikin hemû wacibata³⁰⁹
39. Terka wacibata ğayet ‘eyb û ‘ar e
Cezaê wan li nik Xweda ‘ezaba agir û nar e³¹⁰
40. Ey kesê bi dunya’ê meşğûl û ğafil³¹¹
Ma nîn î tu xwedan firaset³¹² û ‘aqil
41. Terka dînê xwe, çewa tu nef‘ dizanî
Dînê xwe difroşî bi dunya’ a fanî
42. Şiba peya’ê ‘ecel li te xuya be
Tê bêjî: “Wey li hâlê min feqîrî çawa be”
43. Tê bêjî: “Li min çikir ev ê dunya’ê
Îro qeç kes hewar û gaziya min na’ê”

³⁰⁶ **Xaş** [‘E]: Arîstokrat, dewlemend

³⁰⁷ **‘Am** [‘E]: Gel

³⁰⁸ **‘Ummehet** [‘E]: Ummet, kesên ku li pey pêxemberekî diçin/dimeşin

³⁰⁹ **Wacibat** [‘E]: Ew tiştên ku li gor misilmantiyê divê bê kirin

³¹⁰ **Nar** [‘E]: Agir

³¹¹ **Ġafil** [‘E]: Kesê ku haya wî ji tiştêkî tune, bêfem, femkor

³¹² **Firaset** [‘E]: Fehm

44. Tê bigirî digel hezar 'ah û derda
Tê bêjî: "Vê dunyâê 'axîret li min bi der da"
45. Tu nizanî ev a dunya ne payende³¹³ [û] baqî ye
Misafîrxane ye, kesê lê danî bar kiriye
46. Heta kîngê tê bibî meşgûlê dunya'ê
Ma qeş mirin û qebra tarî bîra te na'ê
47. Ger şebî³¹⁴ û ciwan û pîr û kal in
Dema dimrin, kes digel wan ne heval in
48. Tu bixwîne, rêya dînê xwe qenc bizane
Te'lîma dîn ta'etekî mezin ji xwe ra bizane
49. Meriv bi ta'etê Xwedê tamam însan e
Wer ne, xûn û goşt zehftir digel keran e
50. Kesê bi 'ilm û 'emel nebitin qa'îm³¹⁵
Çêtir in ji wî kelb û xinzîr³¹⁶ û behaîm³¹⁷
51. Ey bedbextê³¹⁸ku te mal xirab e
Zû ke, mirin hat çare li hâlê te nabe
52. Kesê bê 'ilm û 'emel, rûsiyah û şermesar e
Hêsirê xûnê ji çeşmê wî yeqîn bibare

³¹³ **Payende** [F]: Bêdawî, heta hetayê

³¹⁴ **Sebî** ['E]: Zarok, gede

³¹⁵ **Qaîm** ['E]: Emel kirin, pêk anîn

³¹⁶ **Xinzîr** ['E]: Beraz, donxiz

³¹⁷ **Behaîm** ['E]: Pirjimara peyva *behîmetê* ye. Ajalên çarpê yên ku goştê wan nayê xwarin

³¹⁸ **Bedbext** ['E]: Bêyom, bêşûd, bêşans

53. Tu nizanî Xweda heq e, cennet baqî ye³¹⁹
Çewa difroşî bi qirêca, dunya fanî ye³²⁰
54. Ger te bivê, rêya dînê xwe qenc bizanî
Bi sehl³²¹ û bêmeşref û bişerzek erzanî
55. Ewel bixwîne Qur'ana 'ezîm ji ezber
Paşê li pey wî Irşad`ul 'Ibad çend per³²²
56. Têrîqa heq wê ji te ra xuya be
Çi ta'etî bikî wê meqbûlê Xweda be
57. Lewra ta'etê bê 'ilm û zanîn beçal e³²³
Ji xizmeta şeytan ra nebe tu pale³²⁴
58. Lewra Xwedê ferman kiriye ji bo pêgember
Te'lîma dîn ji bo nasa bike seraser
59. Lewra yeqîn 'emelê bê'ilm beçal e
Roja qiyametê wê bejin: Ev a 'emelbeçal e
60. Ger 'emel bikî şed şala seraser
Bê 'ilm nemeqbûl e, li nik Xwedê û pêgember
61. Kesên wan bixwîne wê îman û îslamê tamam be
Wer ne, ew cahil [û] nezan e, xam [û] xam e³²⁵

³¹⁹ **Baqî [‘E]:** Bêdawî, ebedî

³²⁰ **Fanî [‘E]:** Tiştê ku temenê wê heta radeyekî ye, ango diyar e, bêdawî nîne

³²¹ **Sehl [‘E]:** Hêsa

³²² **Per [K]:** Berg

³²³ **Betal [K]:** Vala

³²⁴ **Pale [K]:** Xebatkar, karkerê cotkariyê

³²⁵ **Xam û Xam [K]:** Vik vala, zircahil

62. Digel wî kesê Xwedê kiriye îhsan e
Ku Irşad`ul `Ibadê bixwîne, qenc bizane
63. Ne Irşad`ul `Ibad e, ew belkî dewa ye
Ji bo meraza cehlê³²⁶ `eceb şîfa ye
64. Lewra ji şer`êtê da heye deh hezar mesa`îl³²⁷
Yê xwendî ji terîqa musteqîm³²⁸ nabe ma`îl³²⁹
65. Kurmancî ye şirîntir e ji şekir
Xweziya bi wî kesî ku zanî, hem jiber kir
66. Çi kesê qenc bixwîne, lê nezer ke
Wê mekrûh³³⁰ û helal û heramê ji hevdu ferq ke
67. Paşê huba³³¹ zanînê li wî eser ke
Wê ruknêd wuđû` û guslê³³² tamam jiber ke
68. Hem ew ê erkan û sunetê, nimêja mubarek
Bizane ezan û îqamet û tesbîha bi carek
69. Çi kesê bixwîne wê, ji pîr û cana
Wê bibe feqîhek³³³ xebîr³³⁴ û zana

³²⁶ **Meraza Cehlê** [‘E]: Nexweşiya nezaniyê

³²⁷ **Mesaîl** [‘E]: Mesele, mijar, babet

³²⁸ **Terîqa Musteqîm** [‘E]: Riya herî rast û durist

³²⁹ **Maîl** [‘E]: Li ser mayîn, jê dûrketin

³³⁰ **Mekrûh** [‘E]: Li gor ola Îslamê tişta ku şek û şubhe tê de hebe û her çiqas nehatibe qedexekirin jî divê neye kirin.

³³¹ **Hubb** [‘E]: Evîn, hezkirin

³³² **Ġusl** [‘E]: Li gor Îslamê girtine destmêja laşê mirovan, her wiha destmêja cenabetiyê

³³³ **Feqîh** [‘E]: Mamoste, feqî

³³⁴ **Xebîr** [‘E]: Zane, zanyar, alim

70. Hem wê bizane yê helal ji enwa‘ê³³⁵ heywana
 Ji ekla³³⁶ heram men‘ bike tamamê cahil û nezana
71. Hem bizane nimêja cema‘et û her du ‘eyda
 Hem wê di gusl û nimêja meyîta, da bibite ‘alim û seyda
72. Hem wê bizane ferza zekat û şewmê³³⁷
 Paşê la’îq bibe îmamê qewmê
73. Hem wê bizane erkan û adabê nîkahe
 Xwedê bide wî necat³³⁸ û fewzê,³³⁹ hem felahe³⁴⁰
74. Paşê li pey wê bizane ‘eqîqet³⁴¹ û dehiyet
 Xweda jê razî be, cihê wî bibite cenet
75. Hem wê bizane halê dehiyet û ‘eqîqeta şibyana
 Cenet meskenê wî be, di niv³⁴² hûri³⁴³ û gilmana³⁴⁴
76. Hem wê bizane adabê zebh³⁴⁵ û şeydê³⁴⁶
 Wê derkeve ji zulmeta cehl û bend û qeydê³⁴⁷

³³⁵ **Enwa** [‘E]: Cure

³³⁶ **Ekl** [‘E]: Xwarin

³³⁷ **Şewm** [‘E]: Rojî

³³⁸ **Necat** [‘E]: Xilasbûn

³³⁹ **Fewz** [‘E]: Nûra hîdayetê, ilm

³⁴⁰ **Felah** [‘E]: Başbûn, qencbûn

³⁴¹ **‘Eqîqet** [‘E]: Ew qurbana ku ji bona zarokên nû welidîne tê serjêkirin

³⁴² **Nîv** [K]: Nav, hundir

³⁴³ **Hûri** [‘E]: Feriştayên jin

³⁴⁴ **Gilman** [‘E]: Xizmetkarên ciwan yên bihûştê ku li gor ola Îslamê li wir ji mêran re horî, ji jinan re jî gilman hene. Bnr. Sûreya Tûr Ayeta 24an. “*Li ber desten wan, xortên nûgihîştî ji bo xizmetê diğerin, her wekî ew sedefên di qotikên xwe de veşartî ne.*”, *Qur’ana Pîroz*, Werger: M.Huseyn Êsî& M. Se’îd Girdarî& M. Muhammed Bêrkevanî, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2011. r. 525.

³⁴⁵ **Zebh** [‘E]: Serjêkirin

³⁴⁶ **Şeyd** [K]: Nêçir

³⁴⁷ **Bend û Qeyd** [K]: Koletî

77. Ger temamê mesa'îlê wan qenc bizane
Heqqa³⁴⁸ ku ew 'alim e, ne cahil e, ew dizane
78. Çi kesê wê qenc xwend û zanî
Ew qenc feqîh e, xaşma di vê zemanî
79. Mizgîn li we be, ey pîr cana!
Çi kesê wê bixwîne, dibe feqîh û zana

³⁴⁸ Heqqa ['E]: Ya rast, bi rastî

V.

1. Lewra cahilî zulmet e, ‘eceb tarî ye
Heta ku nizane, nefsa wî kê ye
2. Şer‘a Muḥemed, terîqeta Xweda ye
Îblîsê xebîs, xefik³⁴⁹ li ber vedaya
3. Kesê bêçav ku rê nenas be
Wê çewa ji telayê³⁵⁰ mel‘ûn³⁵¹ derbas be
4. Ta‘etê wî nabe illa pir ‘eyb û quşûr
Cehda³⁵² wî here heba³⁵³ û mensûr³⁵⁴
5. Kesê bizane erkan û adabê wacibata
Wê nefsa xwe û mu‘mîna xilaş ke ji muhlîkata³⁵⁵
6. Ey cahilê ku hûn ‘erebî nizanin
Ji we ra mizgînî ye, ger hûn bizanin
7. Xweda daye we Mecme‘ul Mesa‘îl [û] Kîfaye
Bi we ra kiriye luṭf û iḥsan û ‘înaye
8. Ewan bixwînin nebêjin em nizanin
Hûn ê adabê dînê xwe jî bizanin
9. Hûn dê bibin ‘alimê qelbmunewer³⁵⁶
Meqbûl bibin li nik Xweda û Pêxember

³⁴⁹ **Xefik [K]:** Defik

³⁵⁰ **Tela [‘E]:** Xefik, defik

³⁵¹ **Mel‘ûn [‘E]:** Kesê ku le‘net lê hatiye kirin, ango şeytan

³⁵² **Cehd [‘E]:** Xîret

³⁵³ **Heba [‘E]:** Beyhûde, vala

³⁵⁴ **Mensûr [‘E]:** Kesê ku pêdiviya wî bi alîkariyê heye.

³⁵⁵ **Muhlîkat [‘E]:** Ew tiştên ku meriv dibe helake, helakbûn

³⁵⁶ **Qelbmunewer [‘E]:** Dilpak, diltemîz, dilronî

10. Ger hûn herin, hażir bin di nîv³⁵⁷ civata
Hûn ê ‘ezîz bin li nik mu’min û mu’minata
11. Kesê ku ji dîn qeş şey’ek nizane
Wê bêjin: “Dûr herin, ew necîs in,³⁵⁸ wekî sa ne”³⁵⁹
12. Wellahî tu sa ji wî çêtir bizane
Qedrê wî li nik Xwedê kêmtir ji sa ne
13. Ew ê ku kêmtir ji xinzîr³⁶⁰ û sa ne
Mîrin ji heyata wî, jê ra çêtir bizane
14. Lewra di kelba³⁶¹ da he ye gelek menafî³⁶²
Ev wekî xinzîr bê nef³ e, nebe tu tabî‘
15. Ey bira! Bixwûne tu wan bi qencî bigre
Nebêje ez ê pê çikim, li min axiriya ‘umr e
16. Lewra ferman kiriye Hezretî Pêgember
Şefî‘ê ‘aşiya roja qiyam³⁶³ û meşşer
17. Ji wexta piçûkî,³⁶⁴ di zemanê mehdê
Heta qebrê kesba³⁶⁵ ‘ilmê bikin, bi lez û cehdê

³⁵⁷ **Nîv [K]:** Nav

³⁵⁸ **Necîs [‘E]:** Qirêc, heram

³⁵⁹ **Sa [‘E]:** Kelb, kûçik

³⁶⁰ **Xinzîr [‘E]:** Beraz, donxiz

³⁶¹ **Kelb [‘E]:** Kûçik, sa

³⁶² **Menafî [‘E]:** Faîde, qencî

³⁶³ **Qiyam [‘E]:** Qiyamet

³⁶⁴ **Piçûk[K]:** Çûk, biçûk

³⁶⁵ **Kesb [‘E]:** Bidestxistin, kar kirin

18. Da ku hûn nemrin bi cahil û nezanî

Paşê hûn bibînin hezar xecalet³⁶⁶ û poşmanî

19. Tu bizan ‘ilmê bê‘emel qebîh³⁶⁷ û kar e³⁶⁸

Xûyê³⁶⁹ wî rûsiyah û şermesar e

³⁶⁶ **Xecalet** [‘E]: Poşmanî

³⁶⁷ **Qebîh** [‘E]: Xirab, nerind, nebaş

³⁶⁸ **Kar** [K]: Xav, fêkiyên negihîştî

³⁶⁹ **Xûy** [‘E]: Xwedî

VI.

1. Ger yek funûnê hemû ‘ilma bizane
Dema ‘emel pê neke, heywanek nezan e
2. Bedcewher e,³⁷⁰ însan ji wî çê nabe
Wekî kerê ku barê wî tamam kîtab e
3. Her wekî yek dara biyê biçine
Her roj av bide, bi şerbeta şîrîn e
4. Hem ‘emel bike, zehmet pê ra bibine
‘Aqîbet³⁷¹ ji ber wî mehrûm be, tiştêk jî nebîne
5. ‘ilmê şerîf sîlaħa şerê şeytan e
La’îqê merd û mêrê nûcîwan e
6. Sîlaħ û ceng ji bo mêra ra rewa ye
Ne ku ji bo jina ze‘îf [û] bênewa ye³⁷²
7. Tu ku ze‘îf î, kêmtir ji jinan î
Çi la’îqî şer û cenga ‘edûwa nî?
8. Tu wekî jina nikarî cengê, hem cewabê
Tu nebî çêtir e, li ser te bikim xwelî [û] tûrabê³⁷³
9. Ger van we‘za bigrî tu qenc û kar e
Wer ne dîza³⁷⁴ te nakele, tendûr sar e

³⁷⁰ **Bedcewher** [‘E]: Madenê nebaş, malê xirab

³⁷¹ **‘Aqîbet** [‘E]: Pêşeroj, dahatû

³⁷² **Bênewa** [K]: Bêdeng

³⁷³ **Tûrab** [‘E]: Xwelî, ax

³⁷⁴ **Dîz** [K]: Qûşxaneyê ku bi axa sor hatiye çê kirin

10. Ey bira, erđê te şor û sar e
Ger çil sala barana leţif li wê bibare
11. Zen neke ku tişteke li wî hilînî³⁷⁵
Gerçi gul û sosina li wî biçînî
12. Ger li kevira bibare ava heft bihara
Hêşînbûna gulan jê bawer nekin tu cara

³⁷⁵ **Hilînî [K]:** Hildî, bigirî

VII.

1. Çend lefzêkî bêjim, tu lê hişyar be
Ger qebûl bikî Xweda ji bo te yar be
2. Xwedê ferman kiriye ji bo ewel û axirîna
Gotin nafi'e, ji bo cumle mu'minîna
3. Çi kesê bigre wî, meqbûlê Xweda be
Wer ne, xusran³⁷⁶ û zêrer ji bo me nabe
4. Dunya dikana 'uqbayê ye, bike ticaret
Wer ne, tê jî biçî bi hezar poşmanî [û] xesaret³⁷⁷
5. Xwendina 'ilmê ji bo 'emelê rewa ye
Wer ne, bê 'emel merezek³⁷⁸ bê dewa ye
6. Xwendina bê 'emel mensûr³⁷⁹ [û] heba ye
Ji bo tu mereza ew nabe derman û dewa ye
7. Tu kes bi behşa ğenî³⁸⁰ û maldara³⁸¹
Nabe ğenî [û] sermayedar tu cara
8. 'Ilm û 'emel û gotin qenc kar e
Wer ne, navê qenca ji bo te 'eyb û 'ar e
9. We'zê bê 'emel jê fe'îde [û] şewab çênabe
Bi hingiv gotin tu dev şîrîn nabe

³⁷⁶ **Xusran** [‘E]: Şikestina hêviyan, zirar, ziyar

³⁷⁷ **Xesaret** [‘E]: Poşmanî

³⁷⁸ **Merez** [‘E]: Nexweşî

³⁷⁹ **Mensûr** [‘E]: Bê feyde, bade, vala

³⁸⁰ **Ġenî** [‘E]: Dewlemend, sermayedar

³⁸¹ **Maldar** [K]: Dewlemend

10. ‘İlm û ‘emel cewher e, ğayet biha ye
Xweziya bi wî, Xwedê ji bo wî daye
11. Ger qedrê vê cewherê nizanî
Tê muflîs derkevî, ji vê dunya fanî
12. Dengê daholê³⁸² gerçi xweş û şîrîn e
Ne’ê meclîsê, ger te lîbas û reqs³⁸³ nîne
13. Ger ‘emel bikî navê te misilman e
Wer ne, navê şêra danîne li sa ne
14. Lewra navê şekir bê kirin, li sîra
Nabe şekir, naçe li pêş hekim û mîra
15. Lewra şêrê ‘alî, xwedan şeca’et³⁸⁴
Navê wî ji kelba ra nîne liyaqet
16. Gerçi navê te bizahir herwekî şêran e
Nezer li mîr’atê³⁸⁵ ke, şûret kelb xuyan e
17. Heta ku niyeta fi’la qebîh³⁸⁶ bi te ra be
Kûpê te tijî xemr e,³⁸⁷ qet şirke nabe
18. Ger te bivê xemra te bibe sirke bi carek
Here li pey şaliqêd qedem³⁸⁸ mubarek

³⁸² **Dahol** [‘E]: Def

³⁸³ **Reqs** [‘E]: Leyîstin

³⁸⁴ **Şeca’et** [‘E]: Wêrekî, mêranî, cesaret

³⁸⁵ **Mîrat** [‘E]: Neynik

³⁸⁶ **Qebîh** [‘E]: Xirab, nerind, nebaş, neqenc, kirêt, nexweşik, zişt, kereh

³⁸⁷ **Xemr** [‘E]: Eraq, şerab

³⁸⁸ **Qedem** [‘E]: Gav, ling, pê

19. Lewra ʔerîqa wan ji nasa cuda ye
Feyz û meded e, ji ʔeref Xweda ye
20. Ya Rebb! Bi cah [û] ʔurmeta wî ʔebîbî
Işlaḥa me bikî bi şefa‘eta wî ʔebîbî³⁸⁹
21. Me bikî salikê³⁹⁰ ʔerîqeta wî
Bikî ‘amil bi ferman û şerî‘eta wî
22. Setr³⁹¹ bike li me cumle ‘eyb û ‘ar î
Bi şefa‘eta wî xilaş bibin ji narî³⁹²
23. Li ser wî hem al û eşhabê mubarek
Hezar şelat û selam, her lehze bi carek

³⁸⁹ **ʔebîb** [‘E]: Bijîşk, nûjdar, dixtor

³⁹⁰ **Salik** [‘E]: Rêwî

³⁹¹ **Setr** [‘E]: Veşartin

³⁹² **Nar** [‘E]: Agir

VIII.

1. Irşad`ul `Ibad şer`a `erîqa Miştefa ye
Ji bo ehlê `a`etê, her wek fener û çira ye
2. Emma ji bo cahilêd ku bi nav şêx û mela ne
Êş û elem e, `eceb pê muptela ne³⁹³
3. Bi wî cehlê `eyba wan bû eşkera ye
Ji bo hîle û kîzba³⁹⁴ wan qedr û hürmet nemaye
4. Her çi digotin bê`ilm û îftîra bû
Digotin zêr e, şifreki³⁹⁵ qelb³⁹⁶ [û] bê biha bû
5. Dema ku şifre [û] deglê³⁹⁷ ji bo wan bû aşîkar e
Kê m bû qedr ji bo wan nema îdare
6. Lew, ji bo Irşad`ul `Ibadê bûne neyar, dikin `edawet³⁹⁸
Girtî ye li wan rêya hîle û `alale³⁹⁹
7. Ji bo wan wareng⁴⁰⁰ elem xuya e
Zen dikin li wan ra bûye sereca kera ye⁴⁰¹
8. Kesê qeşda wan `alale⁴⁰² û xarî⁴⁰² be
Wan divê roj nebe, dunya zulmet û `arî be

³⁹³ **Muptela** [‘E]: Aşiq, peyrew, girtî

³⁹⁴ **Kîzb** [‘E]: Derew, vir

³⁹⁵ **Şifr** [K]: Paxir

³⁹⁶ **Qelb** [K]: Bêqîmet, riziyayî, sexte

³⁹⁷ **Değl** [K]: Nebaş, xirab

³⁹⁸ **‘Edawet** [‘E]: Dijmintî

³⁹⁹ **‘Dalalet** [‘E]: Rêya şaş

⁴⁰⁰ **Wareng** [K]: Wiha, bi vî awayî

⁴⁰¹ **Serec** [K]: Nexweşiya cuzamê, cuzama keran. Bnr. Omidê Mistefayê Celalî, “Hin Peyv ji Pirtûkên Xelîfe Yûsif”, *Kurmançî*, Hejmar 58, Bihar-2016, r.6.

⁴⁰² **Xarî** [F]: Rêya şaşî û xirabiyê, şaşî

9. Hêram bixwin mu'mîna ji rê derînin
Heta ku murad⁴⁰³ û meqşeda bi cih bînin
10. Wan divê ji dunya'ê kes şey'ek⁴⁰⁴ nezane
Malê firaq bimînin bi hêviya pişîk û sa ne
11. Wan qeşt e, xweşiya dunya'ê seraser
Çi gem in ku helak bin umeta pêgember
12. Ya Reb bike me'lûl û zelîl wan bi carek
Hefz⁴⁰⁵ bikî ji şerrê wan vê umeta 'ezîz [û] mubarek
13. Lewra Xwedê wacib kiriye li ser xwedan îman [û] dîna
Te'lîma şer'ê bikin ji bo cumle mu'minîna

⁴⁰³ Murad ['E]: Miraz, armanc

⁴⁰⁴ Şey'ek ['E]: Tiştêk

⁴⁰⁵ Hefz ['E]: Parastin

IX.

1. Gerçi piçûk in nav Irşad û Kifayet`ul `Ewam e
Ji teref Xwedê ihsan û in`amek⁴⁰⁶ tamam e
2. Gelek kes hene, wan noqşan û kê m dibînin
Her wekî çavê şaş ku rasta xar dibînin
3. Dîndar dizanin `eceb mufîd⁴⁰⁷ û şîrîn e
Gerçi di çavê naqenca kelem û stirî ne⁴⁰⁸
4. Rom û Fireng û `Ecem cumle we dîne
Dîn û mezheb bi lîsanê xwe nivîsîne
5. Dînvîsin bi lîsanê xwe her funûn⁴⁰⁹ û karî
Her yek bi zîmanê xwe dîkin `ucb û îftîxarî
6. Ji xeyrê kurmanc bê huner [û] necabet⁴¹⁰
Navên bibîn li dunya û `axretê se`adet
7. Eger bi zîmanê [xwe] mes`elek bibînin
I`razê jê dîkin, rûyê xwe jê dizivîrînin
8. Nefret jê dîkin, tu car lê nakin nezer
Gerçi bibe şer` û hedîşa Pêgember
9. Ev kar e, ji bo kesê kê m `eql û noqşan
Dûr jê herin gerçi bibe Hekîmê Loqman

⁴⁰⁶ **In`am** [‘E]: Nîmet, lutf, dayîna Xwedê, ihsan

⁴⁰⁷ **Mufîd** [‘E]: Bikêr, bifeyde, biwate, vegotin

⁴⁰⁸ **Stirî** [K]: Kelem, dirî, histrî

⁴⁰⁹ **Funûn** [‘E]: Pirjimara peyva fenê, huner

⁴¹⁰ **Necabet** [‘E]: Bê huner, bê ilm

10. Cumle milel⁴¹¹ li zimanê xwe ‘aşiq û razî ne
 Ji geyrê kurmanc dewxir⁴¹² [û] mecnun û dîn e
11. Ji bê edeba kemalê neke hêvî û guman
 Gerçi bibin şagirdê Eflatûn⁴¹³ [û] Hekîmê Loqman
12. Şifa nabin ji mereza qelbê evan le’îma⁴¹⁴
 Eger şed derman bixwin ji deste van hekîma
13. Hînga şek⁴¹⁵ û mereza qelbê wan şifa be
 Meger dewa’ û derman ji nezera Hezretî Miştefa be

⁴¹¹ **Milel** [‘E]: Pirjimara peyva mîletê ye

⁴¹² **Dewxir** [K]: Kesê ku dew vedixwe, di vir de wateya bêfembûn, gêjbûnê de hatiye bikaranîn. Xelîfe nezani û jidûrketina zimanê Kurmancî di sê astan de nişan dide; ewil dewxir, paşê mecnun 3u di asta herî xeter jî dînbûn e ku êdî aqil bi tevahî laş terikandiye. (Dew, vexwarina ku bi mast û avê ve çêdibe)

⁴¹³ **Eflatûn**: Platon

⁴¹⁴ **Le’îma** [‘E]: Kesên şermezarkirî

⁴¹⁵ **Şek** [‘E]: Şubhe, guman

X.

1. Ibtîda' kalamê me navê Xweda be
Şelat û selam li hebîbê mucteba⁴¹⁶ be
2. Paşê li al û eşhabê wekî nicûma⁴¹⁷
Naşirê⁴¹⁸ finûnê cumle 'ulûma
3. Babê⁴¹⁹ nikaḥê çî babak melîḥ e
Ji mezhebê Muḥemed, Yûsûf [û] Ebî Henîfe
4. Li ser erwaḥêd wanê mubarek
Reḥmeta Xweda be, hezar car ne carek
5. Ev mezheb, serdarê cumle mezahîb⁴²⁰
'Amil in bi wî, ehle meşarîk⁴²¹ û megarîb⁴²²
6. 'Eceb fa'îde ye, gelek nefis e
Ger 'aqil e, li durr⁴²³ û cewhera binivîse
7. Binivîse bi 'eqlam⁴²⁴ û enamîlê⁴²⁵ newadîr⁴²⁶
Van mesa'îlê wekî durr û cewahir

⁴¹⁶ **Mucteba** [‘E]: Navekî Hz. Mihemed e (s.x.l.) ku, tê wateya kesê jibarte, mustesna

⁴¹⁷ **Nicûm** [‘E]: Pirjimara peyva necmê ye, ku tê wateya stêrk. Lê bi ya me xuya ye ku Xelîfe di vir de îşaretê hedîseke cenabê Pêxember dike ku ew hedîs wiha ye: “*Sehabeyên min wekî stêrkên asoyan in; hûn bidin pey kîjanî hûn ê rizgar bibin*” <http://www.rehber.ihya.org/>, Mêjûyê Ragihandinê: 07.06.2017.

⁴¹⁸ **Naşir** [‘E]: Belavkar

⁴¹⁹ **Bab** [‘E]: Beş

⁴²⁰ **Mezahîb** [‘E]: Pirjimara peyva mezhebê ye

⁴²¹ **Meşarîk** [‘E]: Rojhilatî

⁴²² **Meğarîb** [‘E]: Rojavayî

⁴²³ **Durr** [‘E]: Lûlû

⁴²⁴ **Eqlam** [‘E]: Pirjimara peyva qelemê, pênûs

⁴²⁵ **Enamîl** [‘E]: Pirjimara peyva unmuleyê, tîlî

⁴²⁶ **Newadîr** [F]: Pirjimara peyva nadirê, kêma

8. Her kes muhtacê wî ne, ji ekabîr⁴²⁷ û piçûka
Wekî wî cewher nîn in, di xeza'îne⁴²⁸ milûka⁴²⁹
9. Ji ewil kes nediye heta evî zemanî
Bi vê tertîbî xaşma bi vî zimanî
10. Kes nikare 'emel bi mezhebê xwe carek
Teqlîd bike bi vî mezhebê mubarek
11. Ew ê derkeve ji werţeya⁴³⁰ bela'ê
Ji Xwedê ra hemd [û] şenê', ji me ra bike du'a'ê
12. Belkî bi wî du'a'ê mustecab⁴³¹ û mubarek
Cera'imê⁴³² me Xweda 'efû bike bi carek
13. Rehm bike ew Xweda li me gunehkara
Setr⁴³³ bike 'uyûbê⁴³⁴ me rûsiyah⁴³⁵ û jara
14. Nebêje qa'îlê⁴³⁶ wî bêda'et û feqîr e
Hingiv ji mêşekî ze'îf û pir heqîr⁴³⁷ e
15. Gerçî her kes cewaza⁴³⁸ teqlîdê dizane
Lakîn bi vê tefşîlê⁴³⁹ kê m kes dizane

⁴²⁷ **Ekabîr** ['E]: Xizm, eqreba

⁴²⁸ **Xezain** ['E]: Xezîne

⁴²⁹ **Milûk**['E]: Mal û milk, heyînî

⁴³⁰ **Werta** ['E]: Çel, tengasî

⁴³¹ **Du'ayê Mustecab** ['E]: Ew duayê ku kesekî/ê misilman bêyî ku haya yekî/ê din pê hebe, were kirin. Di ola Îslamê de hin wextên taybet hene (şeva îne, qendîla rexaîbê, şeva beratê û hwd.) ku di wan deman de li gor baweriyê ew dua tèn pejirandin.

⁴³² **Cera'im** ['E]: Curm, sûc, tawan

⁴³³ **Setr** ['E]: Veşartin, pêçandin

⁴³⁴ **'Uyûb** ['E]: Eyb, kêmasî.

⁴³⁵ **Rûsiyah** [F]: Rûreş

⁴³⁶ **Qaîl** ['E]: Kesê gotî, axiver

⁴³⁷ **Heqîr** ['E]: Kêm, biçûk, bêrûmet

⁴³⁸ **Cewaz** ['E]: Erêkirin, destûrdayîn

16. Lîbasek faxir e⁴⁴⁰, ‘eceb gerîb e
Xweziya bi wî, jê ra bûye neşîb e
17. Zên neke bira tu ‘am⁴⁴¹ [û] xasa⁴⁴²
La’îq e ji bo nefa’îsê⁴⁴³ lîbasa
18. Ew lîbasek nadir e, ‘eceb biha ye
La’îqê kesê salikê⁴⁴⁴ rêya Xweda ye
19. Ger bêjî: “Wî ji ku aniye, evî şîrîn lîqa’ê⁴⁴⁵”
Em ê bibejin: “ Ji Mewqûfatê⁴⁴⁶ şerha Multeqa’ê⁴⁴⁷”
20. Her kes ji bo medh û sena’ê nasa
Li xwe dikin elwanê⁴⁴⁸ newadirê⁴⁴⁹ libasa
21. Ev lîbas huzûrê Hezretî Xweda ye
Yanî sulûka⁴⁵⁰ mesleka Hezretî Muştefa ye
22. Ey kesê bê sermaye ku hûn îmam in
Di ‘ilmê şer‘î da naqîş⁴⁵¹ û natemam in
23. Irşad`ul ‘Ibadê bixwînin hûn emanet
Belkî ji we ra ca`îz dibe, serwer⁴⁵² û îmamet⁴⁵³

⁴³⁹ **Tefşîl** [‘E]: Gotin, şîrove, rave

⁴⁴⁰ **Faxir** [‘E]: Qure, xwerazî

⁴⁴¹ **‘Am** [‘E]: Gel, tebaa

⁴⁴² **Xas** [‘E]: Arîstokrat, dewlemend

⁴⁴³ **Nefaîs** [‘E]: Nefs, mirov

⁴⁴⁴ **Salik** [‘E]: Rêwî

⁴⁴⁵ **Lîqa** [‘E]: Hevrîşimê xam ê ku dikeve nava qutiya hibrê. Suhbetxweş

⁴⁴⁶ *Mewqûfat*, şerha Multeqayê.

⁴⁴⁷ *Multeqa*, pirtûka mezhebê Henîfîtiyê ye.

⁴⁴⁸ **Elwan** [‘E]: Pirjimara peyva lewnê, reng, cure

⁴⁴⁹ **Newadir** [‘E]: Pirjimara peyva nadirê, kê, kêmpende

⁴⁵⁰ **Sulûk** [‘E]: Rê

⁴⁵¹ **Naqîş** [‘E]: Kê, natemam

24. Ya heq ev e, hûn yeqîn⁴⁵⁴ bizanin
Ger hûn gotina ji min mizah⁴⁵⁵ nezanin

⁴⁵² **Serwer [F]:** Serok, pêşeng, rêber

⁴⁵³ **Îmamet [‘E]:** Serwerî, serokatî, rêveberî

⁴⁵⁴ **Yeqîn [‘E]:** Teqez, bêşik, bêşubhe

⁴⁵⁵ **Mizah [‘E]:** Laqirdî, pêkenok

XI.

1. Gerçi merîz nexwaş e, me‘lûl û dîn e
Hekîm nexweştir e, agah ji halê xwe nîn e
2. Hekîmê cahil ku derd û derman [ni]zane⁴⁵⁶
Ew ne hekîm e, tu wî ji xwe ra qatil bizane
3. Gerçi medhê xwe dike bi cahil û nezanî:
“Em in du‘ameqbûl⁴⁵⁷ [û] şaliq di vê zemanî”
4. Teleya⁴⁵⁸ hîla bi şev û roj danîne
Xirabtir in ji diza gözbağlayıcı⁴⁵⁹ ne
5. Dibêjin: “Mala me ocağ e⁴⁶⁰, xanedan e”
Jê bawer nekin, belkî hêlûna⁴⁶¹ cin û şeytan e
6. Hêşa! Ciyê bê ‘ilm bibe ocağ e
Belkî ji bo şeytanê îblîs ra bostan û bağ e
7. Bizan, ‘ebdê şaliq yeqîn hekîm e
Du‘a’ê wî meqbûl e, li nik Xwedê qeş şubhe nîn e
8. Wan himet û nufûsê şifa’ê cumle derdan e
Çêtir in ji dermanê Hekîmê Loqman e
9. Ey kesê ku mabeyna te û Xweda xirab e

⁴⁵⁶ Di vir de qertafa neyîniyê ‘ne’ nehatiye nivîsandin. Ji ber ku wateya malikê şêlû dibû me qertaf danî û di nav kevanekê de nişan kir.

⁴⁵⁷ **Du‘ameqbûl [‘E]:** Xalis, ê ku duayê wî tê pejirandin

⁴⁵⁸ **Tele [K]:** Defik

⁴⁵⁹ **Gözbağlayıcı [T]:** Xapînok, sêrkar

⁴⁶⁰ **Ocağ [T]:** Mal, xan

⁴⁶¹ **Hêlûn [K]:** Hêlîn

Yeçîn bizane, tu kes bi du‘a[’ê] te şifa nabe

10. Bi hizûra şexşê şaliq û mubarek
Êş û elem hemû def‘ dibin bi carek
11. Wellahî ev gotin bêşek wusa ne
Bawer dike her kesê ku misilman e
12. Çi kesê ku nufûsê⁴⁶² wan xebîş in⁴⁶³
Bê ta‘e[t]⁴⁶⁴ ew refîqê⁴⁶⁵ îblîs in
13. Eger çî her yek ji wan hezar Esmâ‘ê Xweda pê ra be
Qeş şifa û bereket ji wan çênabe
14. Belkî bibed hizûra ru‘iyeta wan
Zêde dibe êş û elem û eziyeta wan
15. Lewra bi mubarek tiva⁴⁶⁶ Hezretî Pêğember
Şifa bû çeşmê⁴⁶⁷ şehabî gayet munewer
16. Bi tifa⁴⁶⁸ zalimê Museylemet‘ul Kezab⁴⁶⁹
Çav kor bû, di bîrê de nema qeşrek⁴⁷⁰ ab

⁴⁶² **Nufûs [‘E]:** Nifş, nesil, ên ku ji nesebekî tên

⁴⁶³ **Xebîş [‘E]:** Bê‘esil, bêneseb, xirab

⁴⁶⁴ Di vir de jî tîpa ‘t’yê nehatibû nivîsandin. Ev tîp me lê zêdekir û di nav kevanekê de nişan da.

⁴⁶⁵ **Refîq [‘E]:** Heval, hogir, malxê, bermalî, hevser

⁴⁶⁶ **Tiv [K]:** Tûk (a mirovên qenc), (**Nîşe:** Wateya wê erênî ye. Xelîfe ji bona Cenabê Pêxember (s.x.l.) peyva ‘tiv’ tercîh kiriye lê ji bona Museylemet‘ul Kezab ‘tif’ bi kar aniye ku ew jî forma wê ya neyîniye)

⁴⁶⁷ **Çeşm [F]:** Çav

⁴⁶⁸ **Tif [K]:** Tûk (a mirovên xirab)

⁴⁶⁹ *Museylemet‘ul Kezab* (Mesleme bin Habîl (?-633)): Pêxemberê derewkar ê navdar. Bi mexlesa kezab –ango yê ku dikare bi hêsanî derewa bike- hatiye nas kirin. Xwe wek pêxemberekî daye nas kirin û seba binê vê îdiaya xwe dagire jî hewl daye ku hin mucizeyan nişan bide. Her çiqas bi ser neketibe jî li hawirdora xwe gelek mirov kom kiriye û gelek kes pê xapiyane. Piştî wefata Hz. Mihemed di dewra Xilafeta Ebubekir de û di şerê Yemamê de tê kuştin.

⁴⁷⁰ **Qeşre [‘E]:** Dilop

17. Ger te bivê, du‘aê te jî bo mereza şifa be
 Ta‘et bike, da‘îma raci‘ê⁴⁷¹ dergehê Xweda be
18. Bêje: “Ez gunehkar im, Tu qenc dizanî
 Qebûl bike bi rehîma xwe du‘aê min nezanî”
19. Ew xebîsê ku navê xwe danîne dîwane
 Erwağêd wan şeytan in, eger çî însan xuya ne
20. Bi dest û devê xwe girtine kîrê xwe
 Da‘îm şond dixwin bi serê pîrê xwe
21. Zên neke ku ew pîr Ğewşê Geylan e
 Lewra Ğewş pîrê şeyx û ewliya ne
22. Haşa! Ew ne pîr û şêx[ê] parsgiran e⁴⁷²
 Belkî pîrê her yek ji wan şêşid şeytan e
23. Lewra ew î ne heram xwariye, ne pars kiriye
 Ku em bêjin, van ev şen‘et⁴⁷³ ji wî exiz kiriye⁴⁷⁴
24. Zehmet bibare li wan digel pîrê wan
 Şeytan serwerê hemû tedbîrê wan
25. Wexta ku yek rehîm li yekî merheba ke
 Bêşek ew ê destê xwe dirêjî namehrema ke

⁴⁷¹ **Raci** [‘E]: Ricakar, kesê ku dixwaze, daxwazkar

⁴⁷² **Parsgiran** [K]: Pars, tişta ku ji parskirinê tê berhevkirin; parsgiran jî navdêreke ku ji bona kesên bi parskirinê dewlemend bûne û barê wan tev ji berevkinê pêk tê, tê bikaranîn.

⁴⁷³ **Şen‘et** [‘E]: Huner, afirînerî, hostatî

⁴⁷⁴ **Exizkirin** [‘E]: Girtin, hildan

26. Ekşerê van kezab [û] xebîsê bêdîn
Xirabtir in ji şed hezar cin û şeyatîn
27. Ya Rebî bike me'lûl û zelîl wan bi carek
Hifz bike ji şerê wan vê 'umeta 'ezîz û mubarek

ENCAM

Em di vê xebata xwe ya bi navê *Xelîfe Yûsif û Teqrîza wî; Metn û Lêkolîn* de li ser jiyana helbestvan û hemû berhemên wî; kesayetiya wî ya edebî; naveroka Teqrîzê û li ser lêkolîna wê sekinîn û di dawiyê de em gihîştin van encaman:

